

## “Xwezeya Dêrsimê ji bo mêşvaniyê gelekî guncaw e”

**BAJARÊ** Dêrsimê bi xwezaya xwe ya cure giha, kulîlk, gelî, çem û çiyayên xwe ve tê zanîn. Helbet di nav xwezayeke wisa de pêkanîna hin karan zêdetir pêkan e û yek ji van jî mêşvanî ye. Li Dêrsimê bi salan e mêşvanî tê kirin û hingivê parzûnkirî, pêtek û hingivê qovana reş çêdibe. Murat Kaçarê ku him mêşvaniyê him jî firotina hingiv dike ji Basê re axivî. **RÛPEL 09**






## Kirmanckî de Yewna Xebata Akademîke

**BINÊ** banê Enstîtuyê Ziwananê Ganîyan yê Tirkîya yê Unîversîte-ya Artukluyî ya Mêrdînî de yewna xebata muhîme ya akademîke ameye qedênayene. Wendekarê Beşê ziwan û Kulturê Kurdan Veysel Yildizhanî xebata xo ya masterî Bi Tarîxê Nusîyayena Xo ya Tewr Kehene Çekuyê Kirmanckî (Zazakî) (1798-1903) qedêna-ye û çend rojî verî teslîmê enstîtuyî kerde. **RÛPEL 10**





## Çiyayê Nemrûdê û Gola Krater

**DI** sedsala 15. de Ermeniyekî bi navê Vardan berheme Haissmavoruk de qala mijara teqîna çiyayê di navbera Chat (Xelat) û Bagesch( Bêdlîs) wiha dike, Ew çiyayê di navbera Xelat û Bêdlîsê de di sala 1441an de bi teqîneke mezin dengekî pir bilind derdixîne ku herkesê der û dora wê rastî tirseke mezin tên. **RÛPEL 14**


# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ
Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 43
20 - 26 MIJDAR 2017
www.basnews.com





**SERDANA BAVIL A ENQEREYÊ:** R2

# BASKÊ YNK LI SER ÎXANETA XWE BERDEWAM E

**> CARA YEKEM ÊRIŞEKE BERFIREH LI WÊ DEVERÊ PÊK HAT**

Geşedan û rûdanên dawîn ên li Herêma Kurdistanê, nîşan didin ku ew alî û baskê di nav YNK de li ser kar û barên xwe yên îxaneta li hemberî, milet, ax û hizbên Kurdî berdewam e. Heftiya borî Çiyayê Asos ku di nav sînorên Silêmaniyê de cih digire, hatibû bombebarankirin. Tê ragihandin ku ev êrişên li ser hizba Kurdî bi tifaqa dewletên herêmî û bi hevkariya baskekî YNKê pêk tên.

**> “DIVÊ HÊZÊN KURDÎ BI BALDARÎ TEVBIGERIN”**

Beriya van êrişan li gor agahiyên berdest û çavkaniyekî pêbawer, serkêşê wî baskê îxanetkar Bavil Talebanî hatiye Tirkiyê û li gel berpirsên Tirkiyê rêzehevdîtin pêk anîne. Piştî vê hatina Bavil bo Tirkiyê û herwiha nêzîkbûna dewletên herêmê li dijî hizbên Kurdî, tê gotin ku xayînî û îxaneta li PDKê hatiye kirin û li PKKê jî bê kirin. Mihemed Emîn Pêncewînî jî dibêje dive hêzên Kurdî bi hişyarî tevbigerin.

Rojnameger Çetin Çeko:

## Fatûraya dagirkirina Kerkûkê dê ji DYAyê re giran be




R03

Em bi rojnameger Çetîn Çeko re di derbarê geşedanên li Herêma Kurdistanê, polîtîkayên DYAyê yên Îran û Herêma Kurdistanê, siyaseta Tirkiye ya li hember Herêma Kurdistanê û tesîra dagirkirina Kerkûkê ya li ser herêmê axivîn. Çeko dibêje, dagirkirina Kerkûkê di 16ê Cotmehê de tesîrê ne tenê li ser Herêma Kurdistanê dike û wiha pê de diçe: “Dagirkirina Kerkûkê ji aliyê Heşdî Şabî ve di dahatûyê de ne tenê li Herêma Kurdistanê lê wê fatûrayeke giran ji DYA û civaka navnetewî re jî derxîne.”



**EKREM ÖNEN** >02

Erdoğan û Ruhanî ji bo çi bi hev re serdana Rûsya dikin?



**HOŞENG OSÊ** >03

Ragihandina li dijî rastiyê



**FIRAT CEWERÎ** >06

Jin


ROJEV R04



## Ji Nemir Mele Mistefa ta Mesûd Barzanî; Polîtîkaya ‘Bêdeng’ a DYA

Polîtîkayên DYAyê yên bijartina Bexdayê û bêdengiya wê li hember dagirkirina Kerkûkê polîtîkayên wê yên salên 70î anî bîra mirovan. Nemir Mele Mistefa Barzanî di nameya xwe ya ku di sala 1973 - 1977an de ji Wezîrê derve yê DYAyê Henry Kissinger re şandibû de wiha gotibû: “Berpirsyariya exlaqî û siyasî ya DYAyê li hember gelê Kurd heye.”

JIYAN R05



## “Ez ji gorê rabûm”

Îdrîs Bişar ji gundê Koço ye, ji wî gundê ku li devera Şingalê komkujiya herî mezin lê qewimî. Bişar tenê ji qetlîamê xilas dibe û di wê komkujiyê de kur, bira, xwîşk, mam, xal, bira, pismam û piraniya xizmên xwe ji dest dide. Keçika wî ya 9 salî piştî 3 salan, beriya çend rojan li Dêrazorê ji aliyê hêzên Kurdî ve ji destê DAIŞê hat rizgarkirin. Bişar çîroka xwe ji Basê re vegot.

ROJAVA R06




## Li Cizîrê zagona baca dahatê hat sepandin

Di destpêka meha Çileya Paşîn de, biryara Encûmena Zagonsaz a Kantona Cizîrê ya taybet bi sepandina baca dahatê li ser astên kes û dezgehan, kete warê cîbicîkirinê. Berî derketina vê zagonê jî bac dihatin komkirin, çi di riya rêbendan re û çi bi riya dezgehên Rêveberiya Xweser re.



EKREM ÖNEN

## Erdoğan û Ruhanî ji bo çi bi hev re serdana Rûsya dikin?

Weke eşkereye hefta borî pressekretarê Putîn, Peskov ragihand ku wê roja 22.11.2017 serokkomarê Îran û Tirkiyê Ruhanî û Erdoğan wê serdana Rûsya bikin û li bajarê Soçî wê bi serokkomarê Rûsya V. Putin re hevdîtin pêk bînin. Gelo xêrê weha ji nişka ve Ruhanî û Erdoğan serdana Rûsya dikin? Ji ber Erdoğan beriya çend rojan serdana Rûsya kir û bi Putîn re hevdîtin pêk anî çi pirs hebûn ji xwe peyivîn û di çi de li hev kirin û nekirin bi tevahî behs kirin, ez ne bawerim di heftiyekê de guhertinek di wan tiştên li hev kirin û nekirin de çêbûbe. Weke eşkereye Erdoğan di serdana xwe ya beriya heftiyekê de ji Rûsya deste vala vegeriya yek ji işaretên esasî ku deste vala vegeriya ew bû ku beriya Erdoğan serdana Rûsya bike bi çend rojan pirsa PYD ku nekeve civînên ji bo çareseriya Sûriyê, pirsa Efrînê û başûrê Kurdistanê ji devê wî ne diket. Her gef li kurdan dixwar çi kurdên rojava çi jî kurdên başûr. dervî vê ya Putîn û Tramp li civîna APEC li Vîetnamê hevdîtin kirin û beyaneke muşterek derbarê Sûriyê de belav kirin û gotin çareseriya pirsa Sûrî ne leşkerî siyasî ye. Naveroka beyanê li dijî Îran û Tirkiye bû, ji ber beyana Putîn û Tramp ji bo çareseriya Sûrî civîna Cenêv weke esasî girtin ev tê wê wateyê ku Tirkî û Îran dervî protsesa Sûriyê hiştin. Piştî vê beyanê. Tramp ji rojnamevana re got; “Ewê li dijî hevkariya DYA û Rûsya ne ehmeq in.” Tramp li vir qesda wî ew ê li DYA ku dijberiya wî dikin ji wan re got. Ji beyanê tişta tê fam kirin, operasyona ANGLO-SAXON li başûr kirin, terefên dijî Tramp bûn. Ji ber ji beyana Putîn û Tramp eşkere dibe ku dixwazin tesîra Tirkiye û Îranê li herêmê zeîf bikin. Operasyona ANGLO-SAXON li Kurdistana Başûr Îran xurt kir. Beriya Erdoğan serdana Rûsya bike li balafirxana Stenbolê beyanek li dijî vê beyana Putîn û Tramp da û got; ”Madem çareserî ne leşkerî ye bila Rûsya û DYA leşkerê xwe ji wir bikşînin” xerîbî ew e ku piştî 5 seata ku giha Rûsya û bi Putîn re hevdîtin kir û paşê derketin pêşberî rojnamevana. Erdoğan hiç behsa PYD, civîna ku li Rûsya dibe ku PYD û ENKS jî hatiye dawet kirin, behsa Efrînê her weha behsa Kurdistana Başûr û S.400 hîç nehatin kirin. Bilaks dijî beyana xwe ya berî 5 seata li balafirxana Anqerê dabû ku li dijî beyana Putîn û Tramp a Vîetnamê got; ”Em piştgirî didin vê beyanê.” Tişta ku Rusya ji Erdoğan re ”jest” kir rê ji firingiyê wan re vekirin. Dervî vê diyare Rûsya bi wan da fam kirin ku PYD û ENKS wê beşdarî civîna li Rûsya û a Cenêv ji bo Sûriyê bibin, Efrîn nabe hûn mudaxele bikin, di paşeroja Sûriyê de kurd divê xwedî statuyekê bin, peyman û hevkariya me bi Başûrê Kurdistanê re wê dewam bike. Her weha behsa pirsa roketên sîstema parastinê S-400 jî ne bû. Diyare yek jê Tirkiye welatên rojava û DYA şantaj dike bi beyanê ku wê S-400 bikirin a dudoyan bi awayê tirk dixwazin rûs naxwazin bifiroşin tirka. Ji ber tirk ne roketa dixwaze teknolojiya roketan jî dixwaze ku piştî du salan li Tirkiyê van roketan çêkin Rûsya ji wan re got ew roketa difiroşin ne teknolojiyê. Diyare pirsa S.400 jî ket avê. Weha diyare ev pirsên li jor min behs kirin ku Tirkiye ji Rusya deste vala vegeriya û metirsiya wan a mezin ew e ku kurd li rojava jî ber bi desthilatdariyê diçin. Erdoğan piştî ji Rûsya vegeriya pir zû hawara xwe gihand Ruhanî ku kurd ji kontrola me derdikevin û ber bi desthilatdariyê ve diçin. Ji ber wê jî dixwazin bi hev re biçin Rûsya zorê bidin Rûsya ku di van pirsên jor de helwesta xwe bi guhere û dev ji hevkariya bi DYA re berde. Lê tişta xerib ew e ku pressekretarê Putîn Peskov ji rojnamevana re got; ”Civîna Putîn bi Ruhanî û Erdoğan re tu eleqa wê bi pirsa civîna çareseriya Sûrî ku wê li Rûsya bibe nîne.” Rûsya ji wan re dide rêdan ku dê di helwesta xwe de wê tu guhertina neke. Ji 4 sala vir de her dibêm di pirsa herêmê de û bi taybet di pirsa kurd de konsesûsek an peymaneke bi dizî di navbera Rûsya û DYAê de heye. Her ku pirsa herêmê ber bi fınalê de nêzîk dibe ev hevkariya DYA û Rûsya hin bêhtir eşkere dibe. Niha pirsek ku dikare vê hevkariya Rûsya û DYA frên bike ew jî nakokiyên nav dezgehên DYA ye (Nav pentagon, CIA û Qesra Spî ye) Tramp evê ya li Vîetnamê piştî beyana bi Putîn re eşkere got ku; ”Ewê li dijî hevkariya Rûsya û DYA ne di pirsên globalde ehmeq in!” Siyaseta Rûsya di derbarê kurdên rojava de siyaseta wan a 1970î a li Iraqê tîne bira mirov wê demê jî Rûsya navbênçî bû di navbera tevgera başûrê Kurdistanê û hikumeta Bexdayê de ji avakirina otonomî ji kurdan re li Iraqê. Wê demê jî Îran û Tirkiyê mudaxele dikir, ji Iraqê re digotin otonomî nedin kurdan ev di bîranînê yek ji nabênçiya Y. Prîmakov de eşkere dibe, niha jî Îran û Tirkî dizanin di peşeroja Sûrî de rûs biryar didin ji ber wê vê daxwaza xwe ya 1970î ji Iraqê kirin niha dixwazin ji Rûsya bikin. Lê bê fêdeye niha di pirsa Kurdistanê de ”Tîr ji kevanê derketiye” an ”cin ji şûşê derket” Tirkiye û Îran hew dikarin rê li ber kurdan bigrin. Ji ber pirsa kurd ji dest kurdan û dest tirk û Îranê derketiye. Statû ji bo kurdan li herêmê di berjewendiyên Rûsya û DYAê de ye.

### Serdana Bavil a Enqereyê:

# Baskê YNK li ser îxaneta xwe berdewam e

■ MURAT ÖZDEMİR

Geşedan û rûdanên dawîn ên li Kurdistanê, nîşan didin ku ew alî û baskê di nav YNK de li ser kar û barên xwe yên îxaneta li hemberî, milet, ax û hizbên Kurdî berdewam e. Weke tê zanîn piştî ku DAIŞê êrişî Sûriyê û Îraqê kir û pêla talan, kuştin û wêrankariyê belav bû, Pêşmergeyên Kurdistanê di serî de Kerkûk, ew deverên Kurdistanî ku weke ‘nakok’ tên binavkirin, ne hişt ku DAIŞ bikeve wan deran û ew dever hemû xist bin kontrola xwe. Bi vê yekê him can û malê welatiyên wan deran hat parastin him jî axa Kurdistanê a dagirkirî vegeriya destê xwediyên xwe. Di wê heyamê de li wan deveran him geşepêdanek û him jî aramiyek peyda bûbû.

Lêbelê bi diyarbûna dîroka referandûma serxwebûnê re rewş û sekna aliyên navdewletî û herêmî ya li hemberî Herêma Kurdistanê guherî. Ligel hemû hewldan, gef û zextê ji bo betalkirin an jî paşxistina referandûma serxwebûnê, Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ku niha bi awayekî fermî dest ji kar kişandiye, paş ve gav neavêt û referandûm di roja xwe ya diyarkirî de di nava kêf û xweşiyê de weke cejneke netewî derbas bû û xelkê Kurdistanê bi zelalî helwesta xwe ji herkesî re eşkere kir.

Helbet gef, zext û fişarên aliyên herêmî û navdewletî dihatin fêm kirin. Ji ber ku dewletên ‘cîran’ên Kurdistanê ku niha beşeke mezin a axa Kurdistanê di destê wan de ye, him ji heman tiştî ku li nav ewan rû bide ditirsiyan û him jî ji sîstema Herêma Kurdistanê ku tekane mînaka birêvebirina demokrasî û pêkvejiyana hemû netew û olan a bi hev re ye, ditirsiyan. Herêma Kurdistanê hê ku ne xwedî statuya dewletê jî bû lêbelê ji dewletên li herêmê ku bi sedan salan e xwedî vê statuyê ne, di warê bicîkirina demokrasî, mafê mirovan, pêkvejiyan, aramî û geşepêdanê de ji van dewletan pêş detir bû.

**Ew baskê YNK di nav heman hewldanan de ye**

Gefên dewletên herêmî dihat fêmkirin ji ber sedemên li jor, lêbelê qet nedihat hizra tu kesî ku dîroka Kurdistanê wê li xwe vegere û dîsa Kurd wê ji aliyê ‘bira’yên xwe ve rastî xiyanet û îxaneteke mezin ku qet û qet nayê jibîrkirin bên. Bajarê qedîm ê Kurdistanê Kerkûk ku çavê hemû cîhanê lê ye û her kesek li gor xwe ji bo bidestxistina vî bajarî planan çêdike, di encama îxanet û rûreşiyeke mezin de ji aliyê rêxistineke paramîlîter a girêdayî Îranê ve hat dagirkirin. Kurd ji her demê bihêztir in û dijmin dizanî ku bi riya şer, tank û topan nikare yek metreya axa Kurdistanê dagir bike, ji ber wê yekê pêdiviya wan bi baskekî îxanetkar hebû û ew bask jî amade bû ji xwe bo vê yekê. Di encama îxaneta mezin de deverên Kurdistanî ji destê Kurdan derketin, xelkê Kurd hat kuştin, qetilkirin, malên wan hatin wêrankirin, bajar hatin kavilkirin. Îcar li gor geşedan û agahiyên berdest ev baskê ku bûbû sedema vê karesata mezin ku bi serê Kurd û Kurdistanê were, niha jî li ser vî karê xwe berdewam e.

**Hevkariya her sê dewletan û baskê YNKê**

Van heyamên dawîn di navbera Îran, Tirkiye û Îraqê de li dijî Kurdistanê tifaqek heye û alîkariya wî baskê YNKê jî li vê tifaqê zêde bûye. Piştî radestkirina Kerkûkê îcar kampên PKKê yên li ser sînor bi alîkarî û hevkariya wî baskî û dewletên din tên bombebarankirin. Heftiya borî li her çar parçeyên Kurdistanê erdhêjekê rû da ku herî zêde tesrî li ser Rojhilatê Kurdistanê û Başûrê Kurdistanê kir. Li gel erdhejê hemwext kampên PKKê yên li ser sînorê Başûr û Rojhilatê Kurdistanê rastî bombaraneke tund hatin. Ew devera ku hatibû bombebarankirin weke Çiyayê Asos tên zanîn girêdayî navçeya Mawetî ya Silêmaniyê ne û gerîlayên PKK li wan deveran bicih bûne. Bo cara yekem êrişa li ser van deveran 3ê vê mehê pêk hatibû û heftiya derbasbûyî jî dîsa heman êriş li dijî hêzeke Kurdî bi hevkariya baskekî YNKê û bi tifaqa dewletên herêmê pêk hat. PJAK ku girêdayî PKK ye piştî van êrişan eşkere kir ku balafirên bêmirov ên Îranê beriya êrişê koodînatên herêmê radestî Tirkiyê kirine.

**Bavil hat Tirkiyê û êriş li ser PKK zêde bûn**

Beriya van êrişan li gor agahiyên berdest û çavkaniyekî pêbawer, serkêşê wî baskê îxanetkar Bavil Talebanî hatiye Tirkiyê û li gel MIT û berpirsên Tirkiyê rêzehevdîtin pêk anîne. Piştî vê hatina Bavil bo Tirkiyê û herwiha nêzîkbûna dewletên herêmê li dijî hizbên Kurdî, tê gotin ku xayîniya li PDK (Partî) hatiye kirin wê li PKKê jî bê kirin. Gerîlayên PKK li devera Kerkûkê û çiyayên Silêmaniyê jî bicî bûne û çalak in, lêbelê li gor geşedanên dawîn û êrişa dawîn a di nav sînorên Silêmaniyê de egera wê yekê zêde ye ku qurbaniyê niha yê vî baskê YNKê, PKK be. Tê gotin ku ew baskê YNKê ji bo xurtkirina têkiliyên xwe li gel Tirkiyeyê jî di nava hewldanan de ye û di vê çarçovê de Bavil Talebanî hatiye Tirkiyê û di encamê de jî êrişên li ser hêzên PKK zêde bûne.

**“PKK me tawanbar dike”**

Beriya niha berpirsekî ji nava YNK jî piştrast kiribû ku ew dixwazin û hewl didin kêşeyên di navbera xwe û Tirkiyê de çareser bikin û têkiliyên xurt pêk bînin. Her wiha heman berpirsê YNKê eşkere kiribû ku ew dixwazin têkiliyên xwe bi Tirkiyê re xweş bikin û diyar kiribû ku PKK jî wan bi hevkariya li gel Tirkiyê tawanbar dike. Tirkiyê nûnerê YNKê yê li Tirkiyê piştî girtina 2 endamên MITê li devera Silêmaniyê ji aliyê PKK ve, dersînor kiribû û têkiliyên herdu aliyan têk çûbûn. Lêbelê van heyamên dawîn Tirkiye bi şert û mercên derkirina PKK ji deverên di bin kontrola YNK de bi wî baskê xiyanetkar re di nav têkiliyan de ye. Ev hemû geşedan nîşan didin ku rojên pêşiya me wê geşedanên nûtir rû bidin û aliyekî din ê Kurdî bi xiyaneta vî baskê YNKê re rû bi rû ye.

**“Em amade ne têkiliyên xwe bi PDK re xurt bikin”**

Li ser van geşedan û guhertinên nû, hêjayî gotinê ye ku Endamê Komîta Rêveber a PKK Duran Kalkan di daxuyaniya xwe ya nêzî PKK de eşkere kiribû ku ew dixwazin û amade ne ku pêwendî û kar û barên xwe yên li gel PDK xurt bikin û pêş de bibin. Kalkan diyar kiribû ku ew dixwazin bi roleke erênî rabin û wiha gotibû: “Em weke PKK dixwazin protokola 1982an ku me bi PDK re ji bo komkirin û pêkanîna Kongreya Netewî pekanîbû, bicî bikin û vajo bikin.Em girêdayî wê protokol û rêkeftinê ne û ji bo ku ev bikeve meriyetê em amade ne. Herwiha em ji bo xurtkirina pêwendiyên li gel PDK jî amade ne.” Ev peyam û daxwaza PKK jî weke ku serdemeke nû di navbera aliyên Kurdî de dest pê dike hat xwendin. Li gor agahiyên berdest PKK jî ji hewldanên wî baskê YNKê hayîdar e û li ser van rûdanan dixwaze pêwendiyên xwe yên li PDK xurt bike.

Siyasetmedarê Kurd Mihemed Emîn Pêncewînî ku heyamekê di hevdîtinên di navbera PKK û Tirkiyê de rol girtibû û navbeynkariya herdu aliyan kiribû li ser geşedanên dawîn ji Heftenameya Basê re axivî.



“Îraq, Tirkiye, Îran ev zêdetirî salekê ye di warên leşkerî, siyasî, aborî û îstîxbarî de civîn û kombûnên xwe yên li dijî proseya siyasî ya Kurdistanê li her çar parçeyên Kurdistanê zêde kirine. Armanca wan ew e ku li dijî proseya Kurdistaneke azad û serbixwe kar bikin. Ewa ku li Başûrê Kurdistanê diqewime beşeke di encama vê tifaqa Îran, Îraq, Tirkiye û herwiha Sûriye jî li heman tifaqê zêde bûye, pêk tê.

Beriya van êrişan li gor agahiyên berdest û çavkaniyekî pêbawer, serkêşê wî baskê îxanetkar Bavil Talebanî hatiye Tirkiyê û li gel MIT û berpirsên Tirkiyê rêzehevdîtin pêk anîne. Piştî vê hatina Bavil bo Tirkiyê û herwiha nêzîkbûna dewletên herêmê li dijî hizbên Kurdî, tê gotin ku xayîniya li PDK (Partî) hatiye kirin wê li PKKê jî bê kirin.

## “Li dijî Kurdistanê tifaqek heye”

Mihemed Emîn Pêncewînî diyar dike ku li dijî Kurdistanê tifaqek di navbera dewletên herêmî de heye û wiha pê de diçe: “Îraq, Tirkiye, Îran ev zêdetirî salekê ye di warên leşkerî, siyasî, aborî û îstîxbarî de civîn û kombûnên xwe yên li dijî proseya siyasî ya Kurdistanê li her çar parçeyên Kurdistanê zêde kirine. Armanca wan ew e ku li dijî proseya Kurdistaneke azad û serbixwe kar bikin. Ewa ku li Başûrê Kurdistanê diqewime beşeke di encama vê tifaqa Îran, Îraq, Tirkiye û herwiha Sûriye jî li heman tifaqê zêde bûye, pêk tê. Bombebarana balafirên Tikriyê li ser xaka Başûrê Kurdistanê karê bi salan e. Piştî têkçûna proseya aştiyê êrişên esmanî yên Tirkiyê li ser navçeyên Kurdistana Başûr zêde bûne. Niha jî heman kiryar berdewam e li navçeyên Silêmanî û Hewlêrê. Niha tifaq di navbera Îran û Tirkiyê de. Îran koordînatan dide Tirkiyê û di encam de jî ev kiryar rû didin.”

**“Dixwazin partiyên Kurdî berdin hev”**

Siyasetmedar Pêncewînî di berdewamiya axatinên xwe de diyar dike, dewletên herêmî û Tirkiye dixwazin di navbera partiyên Kurdî de aloziyan ava bike û bike dijminê hev û wiha dibêje: “Lê ev niha pêk nehatiye. Berî niha jî gelek caran ew devera Silêmaniyê hat bombebarankirin.” Pêncewînî di derbarê gotinên hatina Bavil bo Tirkiyê û têkiliyên wî baskê YNK li gel dewletên herêmî de dibêje, Di derbarê hatina Bavil Talebanî bo Tirkiyê ez ne xwedî agahî me. Lê hewldanên dagirkerên Kurdistanê li dijî Kurdistanê zêde bûne.

**“Divê hêzên Kurdî li dijî planên dagirkeran hevdu bigirin”**

Mihemed Emîn Pêcewînî herwiha di derbarê daxuyanî û gotinên berpirsên PKK yên li ser xurtkirina têkiliyên PKK û PDK radigihîne ku ev gotin û helwest baş in û wiha axaftina xwe bidawî dike: “Baş e ku hêzên Kurdistanê hev du bigirin. Gotinên ji bo nêzîkbûna PKK û PDK gelek erênî ne. Ne tenê herdu alî divê hemû aliyên Kurdî hev bigirin. Divê hemû hizb û partiyên Kurd hevûdu bigirin. Divê peymanekê çêbikin li dijî wê peymana Îran, Îraq, Tirkiye û Sûriyê ku li dijî Kurdan hev du girtine. Divê hêzên Kurd yên Bakûr, Başûr, Rojava û Rojhilat hevûdu bigirin. Divê nakokiyên di navbera xwe de rakin. Divê kongreyeke netewî û Kurdî pêk were û li hemberî planên dagirkerên Kurdistanê rawestin.



Beriya niha berpirsekî ji nava YNK jî piştrast kiribû ku ew dixwazin û hewl didin kêşeyên di navbera xwe û Tirkiyê de çareser bikin û têkiliyên xurt pêk bînin. Her wiha heman berpirsê YNKê eşkere kiribû ku ew dixwazin têkiliyên xwe bi Tirkiyê re xweş bikin û diyar kiribû ku PKK jî wan bi hevkariya li gel Tirkiyê tawanbar dike.

Rojnameger Çetin Çeko:

# Fatûraya dagirkirina Kerkûkê dê ji DYAyê re giran be

CESIM ÎLHAN

Em bi rojnameger Çetîn Çeko re di derbarê geşedanên li Herêma Kurdistanê, polîtîkayên DYAyê yên Îranê û Herêma Kurdistanê, siyaseta Tirkiye ya li hember Herêma Kurdistanê û tesîra dagirkirina Kerkûkê ya li ser herêmê axivîn. Çeko dibêje, dagirkirina Kerkûkê di 16ê Cotmehê de tesîrê ne tenê li ser Herêma Kurdistanê dike û wiha pê de diçe: "Dagirkirina Kerkûkê ji aliyê Heşdî Şabî ve wê di dahatûyê de ne tenê li Herêma Kurdistanê lê wê fatûrayeke giran ji DYA û civaka navnetewî re jî derxîne."

**Di rastiya xwe de dagirkirina Kerkûkê ji aliyê Bexdayê ve di 16ê Cotmehê de ji ber pêkanîna referandûmê bû gelo?**

Beriya referandûma di 25ê Îlonê de xwendina Kurdan a proseyê xelet bû. Em dikarin van xeletiyan wiha bikin rêzê: Piştgiriya navnetewî ya li hember şerê DAIŞê ji bo Kurdan weke piştgiriya ji bo serxwebûna Kurdistanê nirxandin. Wisa texmîn dikirin ku wê civaka nevnetewî di derbarê referandûmê de bibe dualî. Ev yek pêk nehat û aliyê navnetewî yê referandûmê ket valahiyê. Ew baweriya ku wê bikaribin Komel – Goran û YNKê bi taybetî jî YNKê bi kesên weke Qosret Resûl, Nejmeddîn Kerîmî, Mela Bextiyar kontrol bikin. Lê ev yek jî pêk ne hat. Îxaneta navxweyî qet nehatibû hesapkirin dema hat zanîn jî ji bo pêşî lê bê girtin ji gavêtinê re dereng man. Fikra li hember derneketina Tirkiyeyê, an jî ji ber têkiliyên aborî wê li hember Kurdistanê nikaribe ambargoyan an jî guvaşan bike. Îhtîmala êrîşkirina Artêşa Îraqê li ser Kurdistanê nehatibû hesapkirin. Eger êrîşê jî difikirîn ku wê koalîsyona navnetewî nehêle şer û pevçûn derkevin. Birêvebirina mijarên siyasî, aborî û leşkerî bi demokratîk û reform, şeffafî û yekalî nekirina Pêşmergeyan, yanî nebûna artêşeke netewî. Ji ber van sedeman jî li hember rûdanên hundir an jî derve di mijara leşkerî û polîtîk de hebûna xeteke ji şikandinê re guncav jî mirov dikare wek sedeman hilbijêre.

**Lê xiyanet?**

Ji xwe kêşeya herî mezin jî ew bû ku tu carî li benda xiyanetê nebûn. Beriya referandûmê dengê xiyanetê rû dabû. Di dema nûnerê taybet ê Qasil Suleymanî ligel Lahûr Talebanî, Bavil Talebanî û Aras Şêx Cengî di parzêgeha Kerkûkê de Parêzger Nejmeddîn Kerîmî tehdît kirin bêhna xiyanetê belav bûbû. Ew koma ku êrîşî parêzgeriya Kerkûkê kirin ji Nejmeddîn Kerîmî xwestin ku meclîsa Kerkûkê bicivîne û ragihîne ku tevlî referandûma serxwebûnê nabin. Heta bi fizîkî êrîşî wî jî kirin. Kerîmî di civîna çapemeniyê de ev bûyer bi awayekî zelal vegotin jixwe. Ji îro şûn de tiştа bê kirin jî ew e, divê xiyanet di wicdana gel de bê mehkûmkirin. Eger gelê Kurdistanê xiyanetkaran di wicdana xwe de mehkûm bike ev yek tê wateya ku fikra serxwebûnê tê parastin. Di vê mijarê da berpirsiyariya herî mezin dikeve ser milê gelê herêma Soran û alîgirên Qosret Resûl ên di nav YNKê de. Ji ber ku koma bi dagirkeran re têkildar e li vê herêmê û di nava YNKê de ye.

**Belê, gelo çima civaka navnetewî di derbarê referandûma serxwebûnê de nebû duali?**

Eger mirov tenê di şibaka Kurdistanê de lê binêre zehmet e mirov şikestina xeyalan fêm bike. Rojavayê cîhanê têkbirina DAIŞê ji serxwebûna Kurdistanê bileztir dibîne. Ji bo Rojava îro ewlehiya sikakên Brukselê, Parîs, Londra û Berlînê ji serxwebûna Kurdistanê girîngtir e. Li aliyê din jî ji ber şerê navxweyî yê Sûriyeyê gelek penaber çûne Ewropayê. Ev yek jî bû sedem ku îktîdara Sosyal Demokratan û mihafazakaran hilweşe. Wek mînak partiya Serokkomara Almanya Merkel a Kirîstiyan Demokratan di hilbijartinan de 9 poînt winda kir. Aliyê rastê di serî de li Hollanda, Fransa û Nemsayê û li seranserê Ewropa ket parlementoyê. Rasta tundrew li Ewropa li dijî YE siyaset dimeşîne û ji bo dahatûya YEyê bûye metirsî. Bêguman ji Şansolyeya Almanya Angela Merkel û ji bo Serokkomarê Fransa Macron dahatûya Yekîtiya Ewropa ji serxwebûna Kurdistanê girîngtir e. Herwiha li aliyê din jî metirsiya egera şerekî di navbera Bexda û Hewlêrê de derkeve û kesên ku dîsa penaberî Ewropa bibin welatên YE nikare vê qrîzê derbas bike. Sedema Hikûmetên Rojava li hemberderketina referandûmê gelekî cuda hebin jî yên girîng ev bûn.

**Divê mirov têkiliyên Tirkiyeyê bi Îranê re yên li hember Kurdan çawa binirxîne?**

Proseya serxwebûna Kurdistanê li gor Kurdan bidome dibe ku têkiliyên Tirkiye û Îranê antî Kurdistanê bin. Dê di têkiliyên Tirkiyeyê de weke berê di dahatûyê de jî veqetînên nû çê bibin. Xetên sor ên Tirkiyeyê heta sala 2008an hebûn lê piştî 2008an xetên wê veguherîn rengê şîn ên neftê. Ew kesên do li hember federasyona Kurdan bûn îro federasyona Kurdan diparêzin. Êdî tevgera Kurdistanê tevgereke serxwebûnxwaz e. Daxwaza serxwebûnê ji bo herêm, civaka navnetewî hetta ji bo Kurdan jî gaveke nû ye. Piştî vê daxwazê wê Tirkiye, Îran û Îraq li gor daxwaza serxwebûnê ya tevgera Kurd pozîsyon bistînin û têkiliyên xwe deynin.

**Baş e, tu polîtîkayên DYA yên di derbarê Kurdistanê de çawa dinirxînî?**

DYA, Kurdistaneke bihêz di nava yekîtiya Îraqê de dixwaze û Kurdistanê weke şirîkê aligirê Rojava û nayê guhertin dibîne. Bexdayê jî mitefikeke ku metirsiya bikeve bin qontrola Îranê dibîne. Ji bo Bexdayê neke bin destê Îranê manevrayan dike. Sedema piştgiriya Ibadî û li hember derneketina dagirkirina Kerkûkê jî ji ber vê yekê bû bi min. Siyaseta DYAyê di ser Bexdayê de ku mûeyîdeyan li ser Tehranê bike jî ber van sedeman jî niha bisernakeve.



"Piştî vê daxwazê wê Tirkiye, Îran û Îraq li gor daxwaza serxwebûnê ya tevgera Kurd pozîsyonê bistînin û têkiliyên xwe deynin."

**Îran li Rojhilta Navîn her diçe cihê xwe xurt dike...**

Di dema Obama de li gor rêkeftinê ambargoyên li ser Îranê hatin rakirin. Trump jî dixwaze ku vê rêkeftinê diêj neke û careke din ambargoyan deyne ser Îranê. Tesîra Îsraîl û Erebistana Siûdî jî di vê siyaseta Komarperestan de heye ku li hember pêşketina Îranê li Rojhilata Navîn derdikevin. Lê belê dagirkirina Kerkûkê ji aliyê Heşdî Şabî û Artêşa Îraqê ve siyaseta DYAyê ya Îranê birîndar kir.

**Çawa?**

Plandayîn û dagirkerê sereke yê Kerkûkê Îran e. Ji ber vê yekê jî lawazbûna siyaseta DYAyê li hember Îranê ji aliyê gelek kesan ve hat şîrove kirin. DYAyê dikaribû siyaseteke ku him Bexdayê him jî Hewlêrê biparêze birêve bibe lê nekir. Dagirkirina Kerkûkê ji aliyê Heşdî Şabî ve wê di dahatûyê de ne tenê li Herêma Kurdistanê lê wê fatûrayeke giran ji DYA û civaka navnetewî re jî derxîne. Li aliyê din siyaseta Îranê ya Şîe û ya Tirkiyeyê 'Osmanîtiya Nû' ji aliyê Kurdan, Îsraîl û erdnîgariya Ereban ve nayê qebûl kirin û herdu siyaset jî li hember hev di rêkberiyê de ne. Tirkiye ji siyaseta Îranê ya Şîe, Îran jî ji ya Tirkiyeyê ya Osmanîtiya Nû re nabe.

**Îran, bi dagirkirina Kerkûkê çi hêvî dike?**

Îran dixwaze Kerkûk û Silêmanî bi koma xiyanetkar û Bexdayê qontrol bike û yekrêziya axa Kurdistanê parçe bike. Dizane ku bêyî Kerkûk û Silêmanî serxwebûna Kurdistanê ne pêkan e. Sedemeke din jî ewe ku him tesîra wê xurt e û him jî cîran e lê ji neft û dewlemendiya wê têra xwe parê nastîne. Bi rêya Bexdayê wê nefta Kerkûkê bidize û derbasî Îranê bike. Niyeta wê ev in.

**Gelo dagirkirina Kerkûkê destkeftiyên Kurdistanê bi paş de xistin?**

Êrîş û daxwaza ji holêrakirina destkeftiyên heyî ji aliyê Bexdayê ve dibe ku proseya serxwebûnê bileztir jî bike. Tenê bila îradeya siyasî li pişta biryara siyasî û berpirsiyariya ku gel daye wan bisekine. Siyaseteke berovajî yanê siyaseta yekrêziya Îraqê dibe ku destkeftiyan ji holê rake jî.

**Kêşeyên di navbera Hewlêr û Bexdayê de dê çareser bibin?**

Ez wisa difikirim ku wê kêşe çareser nebin û kurtir jî bibin. Hetta dibe ku têkiliyên di navbera Bexda û Hewlêrê de bidawî jî bibin. Eger di hilbijartinên Gulana 2018an de Herêma Kurdistanê biryara boykotê bistîne wê proseya cihêbûnê bilez bibe. Piştî îro wisa xwiya dike ku wê têkiliyên di navbera Bexda û Hewlêrê de ne bi rasterast bi navbeynkariya hêzên navnetewî bidomin. Ev yek jî ne li hember Kurdan lê di berjewendiyên Kurdan de ye.

**Îhtîmala rûdaneke weke Kerkûkê li Rojava jî rû bide heye?**

Eger hûn di mijara xiyaneta navxweyî de dipirsin, li Rojavayê Kurdistanê xiyaneta navxweyî çê nabe.

**Çima?**

Li Rojava tevgera ku li qadê ye PYD û YPG homojen û îdeolojîk in. ENKS jî her çiqas ne li qadê be jî bi daxwaza statû ji Kurdistanê re tevdigere û tevgereke pêşverû ye. Ji dêvla destkeftiyên Kurdistanê têk biçin ve ji bo pêşketîtir bibin presê li ser PYDê dike. Ji ber vê yekê jî xiyaneta navxweyî nabe. Ev yek jî ne li dijî PYD û YPGê ye, berovajî wê li gor berjewendiyên wan e. Ji bo Kurdistana Rojava statû bidest bixe him DYA him jî Rûsya presê li ser Sûriyeyê û mixalefeta bi piştgiriya Tirkiyeyê dikin. Herhalde wê di van salên dawî de tekane mijar Sûriye be ku Rûsya û DYA di mijara çareseriya siyasî de li hev kirine û navenda vê lihevkirinê jî statûya Rojavayê Kurdistanê ye.

**Ji bo îddîayên ku PKK li Şingalê bi Heşdî Şabî re lihevkiriye çi difikirin?**

Li gor agahiyên ji Herêma Kurdistanê tên ev rast e. Rêvekirina PKKê ji Heşdî Şabî re, avakirina îdareyekî pêkve re helwesteke netewî ye. Ji ber ku Heşdî Şabî li hember destkeftî û serxwebûna Kurdistanê şer dike. Weke ku Mamoste Beşîkçî jî gotiye: "Divê Kurd, nehêlin ku dijminê wan kêf bikin û nebin şûrê destê dijminên xwe."

**Herêma Kurdistanê di serdema nû de wê ji rêkberiya DYA û Rûsyayê çawa sûdê werbigire?**

Bêguman wê di vê rêkberiya herdu welatan de kî piştgiriya serxwebûna Kurdistanê bike têkilî ligel wê dê bên danîn. Niha DYA di telaşa ku Bexdayê di destên xwe de bihêle de ye. Ji bo bikaribe vê yekê bike gelekî xeletiyan dike. Tirseke Rûsyayê ji bo Bexdayê wisa nîne. Piştî 2005an ji bo hat û çûna nefta Kurdistanê pêşî cih dan kompanyayên Amerîkî. Paşî van firmayan çalakiyên xwe li Kurdistanê kêm kirin. Ji ber vê yekê jî beriya referandûmê Herêma Kurdistanê bi Rosneftê re ji bo du salan 3 Milyar dolar û rêkeftineke 20 salî îmzekir.

Pereyên vê rêkeftinê yê destpêkê çend roj berê hatin stendin jî. Rêkeftin di derbarê derxistin, birina Ewropa û modernîzasyonkirina bîrên neftê dihebîne. Herçiqas rêkeftineke derengmayî be jî rêkeftineke ji bo Herêma Kurdistanê dahatên baş ên siyasî û ekonomîk wê bîne ye. Eger ev rêkeftin salek berê bihata kirin, Herêma Kurdistanê niha xwedî xeta pertolê bo ku di ser Tirkiyeyê de ber bi deryaya reş ve diçû. Ez wisa texmîn dikim ku piştî pêkanîna referandûmê wê Tirkiye xeta neftê an jî xaza sirûştî ku di axa wê de derbas bibe qebûl neke an jî rawestîne. Bêguman rêkeftina bi Rûsyayê re ne tenê DYAyê acis dike, Bexda û Tehranê jî acis dike. Tirkiye jî weke hemû dîrokê bi mentiqa 'Bazirganê Qeyserî'yî' li bendê disekine.



"Ji bo Rojava îro ewlehiya kuçeyên Brûkselê, Parîs, Londra û Berlînê ji serxwebûna Kurdistanê girîngtir e"

## Ew xala ku Kurd teqez li wir bisekinin ku der e?

Kurd mecbûr in di îrade û daxwaza serxwebûnê de bi inyad bin. Eger îrade û daxwaza serxwebûnê bidome wê demê dibe ku ji vê bumerangê bifilitin. Radestkirina deriyên sînorî, rêkeftin û firotina neftê, herêmên ji Kurdistanê hatine veqetandin, kêmkirina hejmar û berpirsyarina Pêşmergeyan divê Kurd ji van xalan qet tawîz nedin. Dema Îraqê got 'Deriyên sînorî radestî me bikin, bikaranîna bîrên neftê û firotina wê bidin me' divê Kurd ji xwe vê yekê nekin mijara nîqaşê jî. Piştî vê demê mijara nîqaşê tenê divê ew be ku gelo wê qedera me çawa diyar bibe. Gelê Kurdistanê ji sedî 93 biryara serxwebûnê da û îradeya xwe nîşan da. Berpirsyarî da Hikûmeta Herêma Kurdistanê da ku proseya serxwebûnê pêk bîne. Hikûmet bi bicihanîna vê yekê erkdar e. Bi kurtasî Kurd her çiqas tawîz bidin wê winda bikin.

## "Dest ji kar berdana Barzanî nayê wateya ku dev ji serxwebûnê berda ye"

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ne xwest ku erka wî ya serokatiyê dewam bike, gelo wê tesîra wî ya proseya siyasî bidome?

Ez wisa difikirim ku wê tesîra Barzanî li Kurdistanê û herêmê bidome. Barzanî dawî li dema serokatiya wî hat ji xwe dest ji kar berneda. Dest ji kar berdana wî ya serokatiyê nayê wê wateyê ku dev ji serxwebûn û serokatiya PDKê berdide. Mîsyona Barzanî wê di doza serxwebûna Kurdistanê û piştî wê jî bidome. Eger em pirsê wiha formulize bikin; "Piştî Mesûd Barzanî weke ku di YNKê de piştî Celal Talebanî pirsgirêkên navxweyî derketin gelo dê PDKê de jî derkevin?" Bersiva 'Na' ji bo vê pirsê gelekî zehmet e. Dema em qala reformên saziyan dikin divê pêşî ew partiyên ku sazî di bin desthilatdariya wan de ne di nav xwe de reforman pêk bînin. Eger Mesûd Barzanî di nava PDKê de vê yekê bike wê ne tenê bibe pêşengê xeta serxwebûnxwaz wê bibe serokê reformîst jî.

---

HOŞENG OSÊ



## Ragihandina li dijî rastiyê

1-

Berî çend rojan parlemenotoya Iraqê ku di bin destê hêzên siyasî yên olperest, mezhebperest û tayfeperestên girêdayî Îranê de ye, yaseya rêwşên sivîl û civakî ya bi hejmara 188 ku di sala 1959an de derketibû, guhert. Guhertina vê yaseyê, gelek tiştên pîs derbarê rewş û mafên jinan û zarokan bi xwe re anî û tekez kir. Yek ji van tiştên qirêj û pîs di guhertina vê yaseyê de ew e ku temenê zewacê yê jinan ji 18an vegerandin 9 salan. Guhertina vê yaseyê dide diyar kirin bê Iraq bi saya serê melayên şaşik reş û mêjî reş yên Îranê, gihîştiye çi qûnaxeke berbat û ketî!

Derbarê qirêjiya guhertina vê yaseyê de, gelek kesayetî, rêxistin, sazî û partî... rexne û şermezar kirinên tund nîşandan. Û ji ber ku partiya PKKê "partiya herî piştgiriya azadî û mafê jinê dike", tu rêxistin, sazî, kom û komîkên jinan yên girêdayî PKKê, li hundir û derveyî Kurdistanê, li Amerîka, Afrika, Asiya û li parzemîna qir û qeşa û li ser heyvê... neman û daxwiyaniyên şermezar kirinê dernexistin û vê guhertina yaseyê bi "tawana li dijî mirovahiyê" bi nav kirin! Ev jî gelek baş e ku rêxistineke kurd ewqas şoreşger e û di gel jinê ye û mafê wê diparêze. Helbet, yên ku PKKê nas dikin baş dizanin bê ev partî dema rexne li diyardeyekê dike, yan dema bûyerekê şermezar dike, di eynî daxwiyaniyê de, PKK pesnê xwe û îdeolojiya xwe dide ku ramanên "serok Apo" rêbaz û bîrdoziya PKKê alternatîf e û dê cîhan û mirovahiyê ji vê gemar û qirêja hişmendiya mêran-nêran azad û rizgar bike! Ev metod ji urf û adetên PKKê ye ku dema diyarde, rêxistin, bûyer...hwd şermezar dike, PKK tu carî ji bîr nake ku pesnê xwe bide û xwe alternatîf bibîne. Lê, ne ji hundirê rêxistinê ne ji derveyî wê, kesek tuneye bêje: Eger PKK ewqas digel azadî û mafê jinê ye û li dijî zewicandina wê ye di temenê 9-10 salî de, baş e ji ber çi ewqas sal derbas bûn û PKKê keçê 14, 15, 16, 17 salî dişandin şer? Ma ev jî ne tawaneyeke li dijî mirovahiyê ye? Vê ji berdin, çima PKKê peywendiyên xwe bi rêxistinên "Heşda Şabî" re nabire, eger ewqas dilsojê doza jinê ye?

2-

Berî çend rojan, berdevkê "Hezên Sûriye Demokratîk (QSD)" general Telal Silo ku ji tirkmenên Sûriye, ji YPG-QSDê veqetiya û reviya Tirkiye. Hema Telal Silo hina negihîştibû Tirkiye, êrîşî PYDê û QSDê kir. Ez di ragihandina PYDê de geriyam, ango herdû ajansên nûçeyan ANF û ANHA ku jêderên TV, radyo û malperên PKK-PYDê ne, min tu nûçe li ser rev û veqetandina Telal Silo nedîtin. Ne tenê wisa jî, hêzên "QSD" tu daxwiyanî li ser rev û veqetandina berdevkê xwe nedaye! Tu dibêje qey Telal Silo berdevkê diya Donald Trump bû! Yan ji berdevkê diya Vladimir Putin bû! Ne yê QSD bû! Û ne hêjaye ragihandin û medya PKK-PYDê xwe bi wî mijûl bikin. Rev û veqetandina Telal Silo û êrîşên wî yên li ser kurdan û PYD-QSDê ne girîng in û ne hêjayî bersiv û daxwiyaniyekê ne! Lê saziyên ragihandin û medya PKK-PYD, xwe gelekî bi êrîşên li ser PDKê û Mesûd Barzanî mijûl dikin! Reva Telal Silo ku bi kordîne kirina MÎTê ye ne girîng e, lê êrîş û reşkirina PDK û Barzanî girîng e!

3-

Carna û ji bo mirov hinekî objektîf be, ji neçarî berê xwe dide medya PYDê da mirov nas bike, bê ev camêr û biraderên han çi dibêjin? Çi nabêjin? Di çarçoveya hewldana nas kirina nêrîn û helwestên hemû aliyan. Lê bi rastî, gelek caran ez poşman dibim, nemaze dema mirov li nûçe, bername û programên Ronahî Tvya PYDê temaşe dike. Hema bi Xwedê û bi serê Trumpê delalî ku ez nadim bi çewalek pîvaz, mirov ji xwe re li "Bavê Teyar" guhdar û temaşe bike, çêtir e mirov dema xwe bi temaşe kirina Ronahî Tv wenda bike. Ne tenê ji ber kînperestî û faşîzma îdolojîk û partîtî ku ev ragihandin belav dike, lê ji ber ku ewqas reklam û propagandeyeke nizm û arzan ji PKK, PYD, YPG, QSDê... hwd tê de tê kirin, di gel reş kirina hemû kesên rexne li PKK-PYDê dikin. Yawo, carna dema ez li wan guhdar dikim, ez şok dibim û dibêjim: Ev çi ye, ji bo Xwedê!? Ez jî rojek ji rojan Apocî bûm û min di ragihandin û medya PKK-PYDê de xebitîm, lê me ewqas propangedeyeke tewş û tiro viro ne difirot xelkê? Yawo qey ragihandinvanên PYDê çima xelkê ewqas "ker" dihesibînin?

Bi rastî, mirov dikare rastiyekê tenê di ragihandin û medya PKK-PYDê bibîne; ku ev der ne cihê rastiyê ye! Hemû berpirsên siyasî, leşkerî û ewlekarî yên Amerika dibêjin: "Têkiliyên me bi YPG-QSDê re demkurt in û taktîkî ne û tenê di çarçoveya şerê li dijî DAÎŞê de ne", lê tembûra berpirsên PYDê û Ronahî Tv, ANF û ANHA...hwd, tiştekî din dibêje û xwe û kurdan pê dixapîne.

## Ji Nemir Mele Mistefa ta Mesûd Barzanî;

# Polîtîkaya 'Bêdeng' a DYA

CELÎL CEWHER

Piştî pêkanîna referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê ya 25ê Îlonê, dagirkirina Kerkûkê û herêmên derveyî îdareya Herêma Kurdistanê ji aliyê Heşdî Şabî ya bi piştgiriya Îranê tevdigere û Artêşa Îraqê, DYA pêşî bêdeng mabû û paşê jî daxûyaniya 'Em ê bê alî bin' dabû. Ev helweste DYAyê ku Heşdî Şabî û Artêşa Îraqê bi çekên Hevpeymaniya Navdewletî ya li dijî DAIŞê ji bo şerê DAIŞê dabû Îraqê êrîşa li ser Kurdistanê bû sedem ku Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî rexne li Amerîka bigire. Gotina Serok Mesûd Barzanî 'Kerkûk bi agahdariya DYA û Brîtanyayê hat dagirkirin' nameyên Mele Mistefa Barzanî ku ji Serokên DYAyê re dişand anî bîra mirov.

Bi taybetî jî di dema şerê li hember DAIŞê de DYA tim digot 'Kurd, mitefîkên me yên herî baş in' lê di dema dagirkirina Kerkûkê ji aliyê Heşdî Şabî de, bêdengiya DYAyê bû sedema nîqaşan û ev bêdengî weke 'DYA, kurd bitenê hiştin' hat nirxandin. Mesûd Barzanî bêdengiya DYAyê li hember dagirkirina Kerkûkê wiha pirsî bû, "DYA çima ji vê dagirkirinê re bêdeng e? Herwiha Mesûd Barzanî ragihandin bû ku ew tişta di 16ê Cotmehê de li Kerkûkê rûda encama xiyanetê bû. Ev xiyanet xencera li pişt gelê me û Pêşmerge ketiye. Bi vê xiyanetê îradeya 3 milyon kesî ku di referandûmê de gotibûn 'Belê' derbasî asteke zehmet kir û rewş jî zehmettir bû. Eger ev xiyanet nebûna wê rewş cuda bûna. Ji bo parastina Kerkûkê û deverên din me ji mêj ve amadekariyên xwe kiribûn ji ber ku plana êrîşê li ser masê bû. Lê belê vê xiyanetê him moralê Pêşmerge him jî yê gel daxist û ew bergiriya ku hat kirin jî ne li gor daxwaza me bû."

**Dîroka bêdengiya Amerîka...**

Polîtîkayên DAYyê yên bijartina Bexdayê û bêdengiya wê li hember dagirkirina Kerkûkê polîtîkayên wê yên salên 70î anî bîra mirovan. Serokê Nemir Mele Mistefa Barzanî di nameya xwe ya ku di sala 1973 – 1977an de ji Wezîrê derve yê DYAyê Henry Kissinger re şandibû de wiha gotibû: "Berpirsyariya exlaqî û siyasî ya DYAyê li hember gelê Kurd heye." Di sala 1968an de piştî Partiya BAASê li Îraqê hat ser îktîdarê di navbera Îraq û SSCBê de nêzikahiyek çêbû û di sala 1972an de di navbera SSCB û Îradê 'Rêkeftina Karkirin û Dostaniyê' hat îmzekirin. Piştî vê rêkeftinê di navbera kurdan û DYAyê de nêzikahî dest pê kiribû.

Di dema rêkeftin hatibû îmzekirin de DYA ji bo kurd tevlî Bloka Rojhilat nebin û bi destên wan Îraqê têxin tengasiyê bi kurdan re têkiliyên xwe baş kiribûn. Dîsa di heman demê de mitefîkê DYAyê, Îran jî ji ber projeya Şatt-ul Ereb, Îsraîl jî ji bo dewletên Ereb zeîf bike ji Amerîkayê dixwest ku piştgiriya kurdan bike. Di sala 1973an de piştî hevdîtina di navbera Serokê DYAyê Richard Nixon û Şah de biryara alîkariya 16 milyon dolarî ji bo kurdan hat dayîn. Bi vî awayî DYA xwest Îraqa ku nêzîkî Sowyetê bûye bi destên kurdan hinekî bîne rêzê, daxwaza Mele Mistefa Barzanî qebûl kiribû.

Lê belê têkiliya DYAyê bi kurdan re li ser hêmanên pragmatîk bûn li gor guherandina van hêmanan jî îhtîmal bû ku 'Kurd ji ber çavan bên dûrxistin'. Kurd ji bo DYAyê li Îraqê têkbirina bihêzbûna Sowyetê bûn û eger Îraq dîsa bikeve Bloga Rojava kurd dîsa ji çavan diketin. Di sala 1974an de Mele Mistefa bi piştgiriya Îran, Îsraîl û Amerîkayê taleba xweseriyê red kir û li hember Îraqê serhildaneke mezin da dest pê kirin. Lê belê dîsa di nav objeyên herêmê de rêkeftin çêbû û nesneyên herêmê kurdan jî bi tenê man. Di sala 1975an de di navbera Îran û Îraqê de ji bo çareserkirina sînoran ku li dijî Îraqê hinek destkeftî bidest xistin û bi dest ji piştgirîkirina kurdan berdan qebûl kir û Protokola Cezayîrê hat îmzekirin. DYAyê jî lê nêrî ku şer dirêj dibe û encam nayê stendin wê jî piştgiriya xwe ji kurdan birî. Di wî şerî de 50 hezar kurd jiyana xwe ji dest da.

Bi vî awayî kurd careke din ji piştgiriya derve mehrûm man û têkçûn, Mele Mistefa Barzanî ji bo nexweşîna xwe tedawî bike pêşî çû Îranê ji wir jî derbasî DYAyê bû ji Serokê nû yê DYAyê J. Carte re du name şandin û di nameyên xwe de gazina xwe bir ser serokên berê yên DYAyê û ji îdareya nû ya DYAyê hêviyên xwe nivîsandin. Xeyala kurdan a xweseriyê heye û îdareya berê ya DYA ev soz daye kurdan lê belê bêyî ku soza xwe bicih bînin kurd bi tenê hiştin lê ez bawer im ku wê îdareya nû soza xwe bicih bîne û ji îro şûn de polîtîkaya DYAyê ya derve ku mirovahiyê dixe navenda xwe wê ji bo kurdên Îraqê jî derbasdar be.

Lê belê dihat îfade kirin ku îdareya nû ya DYAyê dosyaya kurdan ji mêj ve girtibû. DYA li hember Qetlîama Enfalê ku Saddam di sala 1988an de jenosîd li kurdan kir jî bêdeng ma. Proseya di sala 1990î de bi dagirkirina Kuweytê ji aliyê Îraqê ve DYA ji nû ve bi kurdan re têkilî danî. Di dema midaxeleya bi serpereştiya DYA li Îraqê dest pê kir Hêzên Koalîsyonê bi rêya Dengê Îraqa Azad bi weşanên xwe kirin ku kurd serî hildin. Lê belê ev serhildan gelekî kin dewam kir. DYA bi Saddam re rêkeftin pêkanî û Artêşa Îraqê êrîşî deverên ku kurdan lê serîhildabû kir û careke din DYA bêdeng mabû. Di encamê de ji milyonekî zaftir kurd reviyan Tirkiye û Îranê.



> "Di dîroka têkiliyên DYA û kurdan de tim encameke trajîk heye. Dagirkirina Kerkûkê û helwesta DYAyê li hember dagirkirina Kerkûkê jî dîsa heman pirs anî rojevê. Gelo DYA dîsa kurd firotin berjewendiyên xwe yên li gel dewletên herêmî?"

### "DYA naxwaze kurdan ji dest bide"

Li ser bitenê hiştina Kurdan a ji aliyê Amerîka ve û bêdengiya wê ya li hember êrîşên li ser kurdan em bi Pisborê Têkiliyên Navnetewî û nivîskarê pirtûka 'Boyutên Kêşeya Kurdî yên Navnetewî' Dr. Erol Kurubaş re axivîn. Kurubaş destnîşan dike ku lîstika sed sal berê Brîtanya li Rojhilata Navîn xwest bileyîze îro DYA jî diceribîne û wiha didomîne: "DYA jî weke gelek kesan di wê hişmendiyê de ye ku êdî dema guhertinan a Rojhilata Navîn ku bi Sykes - Picot hatiye dirûstkirin, hatiye. Û rola ku Brîtanya sed sal berê li vir lîstiye niha jî dixwaze ew bileyîze. Lê li hemberî wê Rojhilata Navîneke li hember Brîtaniyan tevlihevtir û denklemeke piralî ya kurdan heye. Ji bo çareserkirina vê denklemê jî xwiya dike ku planeke sofîstîke jî di destê wê de nîne. Bi vî awayî di vê heyama dawîn de ji aliyê kurdan û DYAyê rewş wisa ye; Kurdên Îraqê, bi piştgiriya DYAyê nêzîkî xeyalên xwe bûbûn û niha jî dîsa ji ber helwesta DYAyê di metirsiya bidawî bûna xeyalên xwe hatin. Her çi bibe di dîrokê de encama vê têkiliyê tim wisa ye. Ji ber vê yekê jî di lêgerîna riyeke nû de ne. Di vê rê de nêzîkbûna Tirkiyeyê jî wek bijarteyekê xuya dike. DYA jî ji bo xatirê vê rewşê rast bike û qertê kurdan ji destên xwe dernexîne li ser kurdên Sûriyeyê û PYD/YPGê weke amûreke jiyanê dibîne. Ji ber vê yekê jî ji bo piştgiriyê bide wan gelekî camêr tevdigere."

---

## Rîska erdhejê li Kurdistanê:

# "Xeta şikestî ya di navbera her çar parçeyan de aktîf e"

SÎNEMÊ SAKÎ

> Roja 12ê Mijdara 2017an li hin bajar û navçeyên Kurdan ên Herêma Kurdistanê û Rojhilatê Kurdistanê erdhejeke bi pileya 7,3an pêk hat. Endamê Odeya Avahîsaz a Diyarbekirê Nihat Noyan dibêje, "Di navbera Rojhilat, Başûr û Bakurê Kurdistanê de xeta şikestî ( fay) aktîf e."

Roja 12ê Mijdara 2017an li hin bajar û navçeyên Kurdan ên Herêma Kurdistanê û Rojhilatê Kurdistanê erdhejeke bi pileya 7,3an pêk hat. Erdhejê zêdetir xisar da gund û bajarên Kirmanşahê, Helepçe û derdora Helepçeyê. Di heman demê ev erdhej li bajarên Kurdan wek Wan, Diyarbekir û Mêrdînê hwd. perçeyê din jî hat hîskirin. Di erdhejê de bi sedan kesan canê xwe ji dest dan û bi hezaran kes jî birîndar bûn û herwiha gelek avahî jî hilweşiyan û xisareke mezin pêk hat. Odeya Avahîsazan a Diyarbekirê û Zanîngeha Dîcleyê piştî erdhejê demildest komîsyonek ava kirin û çûn Herêma Kurdistanê. Di vê komîsyonê de yek ji endamê Odeya Avahîsazan a Diyarbekirê Nihat Noyanê jî cih girti bû, di derbarê çûyîna Herêma Kurdistanê de dîtin û agahiyên xwe û herwiha bandora erdhejê li ser Bakurê Kurdistanê û rîska erdhejê li ser herêmê ji Heftenameya Basê re axivî.

**Piştî erdhejê komîsyonek hat avakirin**

Endazyar Nihat Noyan destnîşan dike ku navenda erdhejê wekî ku dibêjîn ne Îran e Herêma Kurdistanê ye û nêzî gundekî Helepçeyê erdhej rû daye û Noyan wiha behsa çûyîna komîsyonê dike: "Ji bo ku agahiyên lezgînî bi dest bixin em çûn derbasî Herêma Kurdistanê bûn. Em sê kes ji Odeya Avahîsazan a Diyarbekirê û Zanîngeha Dîcleyê bi hevkariya her du aliyan me komîsyonek saz kir. Em wek komîsyon çûn Herêma Kurdistanê û pêşiyê çûn bajarê Dihokê û digel hin sazîsendîkayên Herêma Kurdistanê me serdana hin ciyên erdhejê kir û me guhdariya gel kir. Çend xaniyên ku xira bibûn, ji aliyê teknîkî ve em li ser wan xebitîn. Ev avahî ji aliyê endazyariyê ve ne dirûst bûn. Avahî li gor hişmendiya endazyariyê çênebibûn yanî avahiyên ku li wir çêbûne ne saxlem bûn. Ger li ser van avahiyan xebat neyên kirin dibe ku xisarên girantir çêbibin. Mixabin gel di van avahiyên bi xisar de hin dijîn. Divê dezgehên peywendîdar bi awayekî lez dest bi tespitan bikin û van avahiyên ku xisar lê çebûne bidin vala kirin. Erê di nav gel de tirs heye lê gel wisa difikire ku erdhej hat û çû. Tê gotin li vê herêmê heta niha erdhej çênebûye û ez bawer im tecrûbeya gel jî di erdhejê de ne zêde ye. Niha ne teqez e lê ger pêkan be emê bi beşdariya hin sazî û zanîngehên li vir û yên Herêma Kurdistanê xebateke berfirehtir pêk bînin. Bi rastî em dixwazin biçin ciyê erdhejê yên Rojhilata Kurdistanê jî bibînin lê Hikûmeta Îranê çiqas destûr bide em nizanin emê bo têkiliyê hewl bidin. "

**" Avahiyên Herêma Kurdistanê baş nehatine çêkirin"**

Noyan li ser komxebatên li Herêma Kurdistanê jî wiha axivî, "Dema em li Herêma Kurdistanê bûn me anî ziman û heta me parlamenterekî re jî got bila xebatên me yên li vir bi xwe re encamek jî bîne piştî vê xebatê em raporekê çêbikin û bila ev rapor pir alî be û bibe bingeha qanûna avakirina Herêma Kurdistanê. Ji ber ku di aliyê qanûnê de li Herêma Kurdistanê tu bernameyek tune ye ez bêjim kîjan dewlet û kî tê li vir vê derê li gor rêbazên xwe avahiyan saz dikin. Mixabin bi awayekî fermî plana îmarê ya Herêma Kurdistanê an tune ye an jî kêm e û ne rêk û pêk in. Aliyên ku avahî çêdikin êdî li gor wicdanên xwe avahiyan çêdikin. Kontrola avahiyan jî tune ye û ruhsata îskanê jî tune ye. Divê berî her tiştî hişmendiyek çêbibe û bingeheke teknikê çêbibe û ger pergal û bernameyeke bo avahiyan tune be dema erdhej çêbû mixabin emê bi encameke giran re rû bi rû bimînin."



Wekî din Noyan li ser çêbûna erdhejê wiha axivî," Kutleya Erebîstana nîvgirav em bêjin her dem ji aliyê cemsera (kutup) Bakur ve diçe. Ji ber ku ji aliyê cemsera Bakur ve diherike her dem ev şikesteka hanê aktîf e. Bi qasî em pê hêsiyane dibêjin ev erdhej 2 santîm û nîv an jî 3 santîm ji nîvgirava Erebistana Suudî ber bi Bakur ve herikiye û vê perçeyê mezin bi hev re hereket kiriye ji loma bandora vê erdhejê ev qas berfireh çêbûye."

Karîkator ---------- Dijwar Ibrahim




### "Divê xelk li gor rîska erdhejê tevbigere"

Tê zanîn ku bajarên Kurdan wek Diyarbekir, Wan û yên din de jî erdhej hatibû hîskirin. Endazyar Nihat Noyan li ser bandora erdhejê ya li ser bajarên Kurdan jî wiha axivî, "Salên borî li Erzîncan, Gimgim (Varto), Çewlig û Wanê erdhej çêbibû. Ji xeta Zagrosê bigire û heta xeta Bêdlisê heta xeta Torosê bi tevahî di navbera Rojhilat, Başûr û Bakurê Kurdistanê de xeta şikestî ( fay) aktîf e. Dema ku kutleya hanî ber bi cemsera bakur ve diçe heta astekî ev şikestek tê ser hevûdu piştî demekê ev kutle zor digire dişike dema ku şikest wê demê erdhej çêdibe. Bo erdheja duduyan ev kutleya hanê zorê bide hevûdu û li perçeyekî dîsa erdhej çêbibe, ev dem digire. Divê hisabê vê yekê bê kirin ez a niha nikarim wextek diyarkirî bibêjim. Di hin ciyan de her çiqas şikestin çêbibin jî di hin cihên din de jî şikestin tam çênabin. Ez bêjim ji Wanê bigire heta Erzîrom, Erzîncan, Çewlig û di vê heremê de serê sê şikestekan digihêjin hevûdu. Ji bo şikestineke din her dem îxtîmalek heye dibe ku erdhej çêbibe. Li vê xetê nebe jî derdorê vê xetê dê erdhej çêbibe. Yani em kurtasî bibêjin ev ciyên ku me behs kir xeta erdhejê ye divê gelê me di vê warî de baldar be û xwedî hişmendiyekê be û avahiyên xwe saxlem çêbikin da ku di erdhejê de ev avahî hilnewişin. Divê gelê me avahiyên zêde bilind çênekin û herî zêde dora 2-3 qatî avahî bên çêkirin baş e. Ji vê qatê zêdetir avahî ji vê xeta Kurdistanê ku me behs kir re baş çênabe. A rast tecrûbeya Bakuriyan a erdhejê heye û ev hişmendî rûniştiye."

# "Ez ji gorê rabûm"

RÊZAN KARWAN



Îdrîs Bişar ji gundê Koço ye, ji wî gundê ku li devera Şingalê komkujiya herî mezin lê qewimî. Bişar tenê ji qetliamê xilas dibe û di wê komkujiyê de kur, bira, xwîşk, mam, xal, bira, pismam û piraniya xizmên xwe ji dest dide. Îdrîs Bişar ku keçika wî ya 9 salî (dema hatibû revandin 6 salî bû) piştî 3 salan, beriya çend rojan li Dêrazorê ji aliyê hêzên Kurdî ve ji destê DAIŞê hat rizgarkirin, niha li Duhokê disekine û dibêje heta ku çarenivîsa hemû Êzidiyên di destê DAIŞê de diyar nebe ez naçim tu deran û ez ê him li ber hestiyên xwe û him jî li benda diyarbûna çarenivîsa wan bim. Îdrîs Beşar dibêje, 'ez ji gorê rabûm' û dest bi vegotina çîroka xwe ya dilsoj dike.

**"Cîranên me bi navê cîhadê êrişî me kirin"**

Îdrîs Bişar ewilî li ser rewşa jiyana wan a beriya DAIŞê disekine dibêje: "Jiyana me beriya DAIŞê gelek baş bû, aram bû, karê me bi siyasetê nebû. Em li ser kar û barên xwe bûn. Tu kêşeyeke me bi hikûmeta Kurdistan û Bexdayê re nebû û dest bi vegotina rojên reş dike: "Seat 3ê bi ser deverê de hatin û saet 6ê sibehê li tevahiya xakê şerên dijwar rû dan. Pêşmerge û xelkê heta 6ê sibehê jî şer kir û bersiv da. Lê ez nizanim ka çi qewimî ku dever hat berdan û Şingal ket destê DAIŞê. Gundê me Koço li ser sînorê Kurdên Êzidî û Ereban de bû. Piştî ku DAIŞ hat têkiliya me ya bi deverên din re qut bû. Em hatin dorpêçkirin. Tirkmen û Ereben Sunne yên ku cîranên me bûn bi navê Cîhadê bi DAIŞê re rabûn û wan jî êrişî me kirin. Dora me hat girtin riya me ya bi Şingalê re, ya bi çiyayê Şingalê re qut bû. Ji xwe wî çiyayî Êzidî ji hemû fermanan parastiye. Tenê ew çiyaye ku bo Şingalê dibe delîl."

**"Gotin, 'mal û milkê we ji me re helal e'"**

Bişar axaftina xwe wiha didomîne: "Piştî ku derdorên me hatin girtin em di gund de asê man. Li derdora me jî kuştina xelkê berdewam bû. Me nedikarî bi derekî ve derkevin. Çek û hemû tiştên me jî ji me hatibûn stendin. Gotin çekên xwe bînin paçekê spî rakin em tiştekî li we nakin. Em ji 3ê mehê heta 15ê mehê asê bûn di gund de. Me bi dizî telefonî derve dikir ku bi hawara me de bên. Em hezar û 250 kes bûn. Herkesek di mala xwe de asê mabû, av, xwarin, kahreb tiştek nemabû. Me xwe gihand hêzên Amerîkî, Pêşmerge, Bexda û aliyên din. Ji me re hat gotin ku wê bi hewara we de bên. Lê kesek bi hewara me de nehat. Piştî ku 12 rojan em di gun de asê man. 15ê mehê êdî DAIŞ bi rihetî derbasî nava gund bû jin, mêr û zarok her kesê li gund hemû di medreseya gund de kom kirin. Jin birin tebeqa jor û mêr jî li jêr kom kirin. 70-80 trimbêlên DAIŞê bi çekên giran li derdora gund bûn. Hemû cure çekên giran ketibûn destên wan. Gund zeft kiribûn. Emîrekî bi navê Ebû Hamza hat li gel rispiyên gund rûniştî û axivîn. Got yan hûn dê bibin misilman yan jî em ê her tiştê we ji we bistînin. Got eger hûn misilman nebin mal û milkê we helal e ji me re. Lê rispiyên gund jî gotin ev 73-74 ferman bi serê me de hatin lê me dev ji ola xwe bernedaye û em vê yekê qebûl nakin. Me dev ji ol û baweriya xwe bernedaye û em dev jê bernadin. Yanî pêşiyê em li gel hev rûniştin. Wan jî got madem hûn me qebûl nakin û hûn nabin misilman, em ê we bibin hidûdê Kurdistanê û herin, derkevin ji sînorên 'dewleta' me. Lê hûn dê mal û milkê xwe hemûyê ji me re bihêlin û zêr, pere çi li gel we be hûn dê bihêlin. Me jî got temam û jin û mêran çi li gel me û di malên me de be, zêr, pere û tiştên din me hemû xistin kîsên wan. Seyare û hemû tişt dest danîn ser. Gotin yek tiştek bi we re bê dîtin em ê we hemûyan bikûjin û em efû nakin. Me jî got bes ku qetlîamek bi serê me de neyê, bila mal û milk biçe, ji ber wê yekê me dengê xwe nekir. Ji xwe me li ser wê yekê li hev kir ku mal û milk û erd ji wan re bimîne û jin, mêr û zarok em hemû bên berdan. Wan jî wisa pêşniyaz û qebûl kiribû. Ev 15ê mehê saet 11.30an pêk hatin."

**"Wan digot qey ez kuştî me"**

Îdrîs Bişar dibêje me emîrên wan hemû nas dikirin. Hemû ji devera me bûn. Erebên dedorê bûn. Tirkmenê Sune û Erebên din hemû DAIŞî bûn. Tirkmenên Sunne ên ji Telaferê zirareke mezin dan Şingalê û wiha pê de diçe: "Ji mêran re gotin siwar bin, jin hêlan. Em birin derdora gund. Me got ji xwe wê me dênin deverekî û em ê werin berdan. Lê gelek ne dur ji gund em kirin kom bi kom ku her kom ji 50-60 kesan pêk dihat. Kur, xal, mam, bira, pismam û xizmên me yên din em hemû. Ji xwe gund hemû mam û pismam bûn, hemû xizm û mirovên hev bûn. Em danîn û kom bi kom hemû qetilkirin. Li ser me rawestiyan, li ber û pişt me rawestiyan. Bi çekên giran gule bi ser me de barandin. Em durî gund nebirin. Em êxsîr bûn di destê wan de. Me nedikarî parastina xwe jî bikin. Di wê dema ku DAIŞê gule li me dibarand û xelk serjê dikir, 2 firoke ku heta niha jî em nizanin yên kê bûn, li esmanan digeriyan lê midaxeleyek, êrişek nekir ser wan. Wan jî em dikuştin. Bi tekbîran bi dengên Allahû Ekber xelk qetil dikir kom bi kom. Dihatin ser serên kuştiyan û birîndar jî dikuştin. Piştî ku deng û dora firokeyan zêde bû, ji hev re gotin em biçin û gazî makîneyên kar kirin ku wan kuştiyan bi komî binax bike, yanî ax bavêje ser. Piştî ku ew çûn ez hê li ser hemdê xwe bûm, saet bûbû 1ê nîvro. Çar gule li min ketibûn. Wan digot qey ez kuştî me. Ku ew çûn ez ji nav terman derketim û heta ku min xwe gihand bin hin pûş û çelî bi destan û kaşkirên min xwe gihand dereke biçûk ku ne durî wan bû û êdî min nekarî durtir biçim ji ber ku hê jî xelk dihat kuştin û çakdarên wan ne dûr bûn. Kuştina xelkê berdewam bû. Li wê derê min kuştina xal, xwarze, kur, bira û hemû xizmên xwe bi çavên xwe dîtin. Min guhdariya wan dikir. Ez birîndar bûm û di rewşeke kambax de bûm. Min xwe di bin komeke pûş de veşartibû û paşê hêdî hêdî ez gihîştim nav bostanekî. 2 gule bi lingên min ketibûn, 2 li zikê min ketibûn, yek di ber serê min re borî bû ku wan digot qey bi serê min ketiye. Lê serê min xêz kiribû. Yanî 4-5 gule bi min ketibûn. Û dozera wan jî dihat ku axê bavêje ser me, hê ku ew nehatin min bi awayekî xwe gihand bin wî pûşî."

**46 rojan di mintiqa DAIŞê de, di şikeftan de ma**

Îdrîs Beşar dibêje di nava çend saetan de bi hezaran Êzidî kuştin û wiha pê de diçe: "Min dît ku mêr hemû xilaskirin, 400 mêr di nava çend saetan de kuştin. 78 jinên temenên wan mezin ku temenê wan di ser 50 saliyê de bû, hemû kuştin. Hemû dayik, xwîşk û jinbira bûn. Paşê buldozera wan hat û ax da ser wan komên kuştî. Ez jî mam di nav bostan de. Piştî ku bû tarî, gundekî Erebên Sunne hezar û 500 metreyan ji me dûr bû, cîranên me bûn, min xwe bi erdê ve li ser dest û zik xwe kaş kir heta wî gundî. Yanî rêyeke gelekî kurt û devereke gelekî nêzîk heta min xwe gihandê zêdetirî 6 saetan derbas bû. 6ê êvarê min da rê ez dema ku gihiştim wê derê saet ji 12an derbas bûbû. Min tenê êdî ewqas karî ku bêjim, 'Av, av' bi erebî. Yek hat avek da min û got here ji vê derê. Min jê re got 'ez birîndar im ez vaye li ber mirinê me lingê min şikestiye, cil di ber min de nemane, cerm û koştê dest, ling û zikê min hemû di ser de hatiye, lingên min şikestî ne, ez tazî bûme. Ez di rewşeke perîşan de me û ez bi ku de biçim. Min ev jî jê re got bi şiyaneke dijwar, min got em cîran û kirîvê hev bûn, me nanê hevdu xwariye em di nav hev de bûn, çi bû çi qewimî ku hûn li me bûn dijmin çi zirara me gihiştiye we, ma wijdan û mirovahî ev e.' Lê wî got qet nabe ku tu li vê derê nabî, lê nêrîn ku ez nikarim biçim, çend kes hatin ez xistim nav bataniyekê û ez birim danîm derveyî gund. Nehêlan ez li wê derê bimînim. Kesek li min xwedî derneket. Li derveyî gund saet 4ê sibehê şivanekî ereb hat ez li kerê xwe siwar kirim. Ez birim di koxekî de danîm, birînên min şûştin, derman li birînên min dan û ez 46 rojan di wê mintiqa DAIŞê de mam, çi di kolkên mirîşkan, çi di govan de û çi di şikeftan de. Ez ne di malên wan de bûm, lê xwarin û av bo min dianîn. Wî kesê şivan piştî wê heyamê ji kesekî re got vî ji vê derê xilas bike. Pere, cil û berg dan min û ez li seyarê siwar kirim di nav DAIŞiyan de ez birim Kerkûkê. Bira, kur û pismam, jin bira min dît ku hemû hatin kuştin, lê jin û zarok çarenivisa wan ne diyar bû û min nedizanî ka bi ku de birine. Ji xwe tiştekî min nemabû. Ez anîm Kerkûkê û ez ji wê derê çûm bo Duhokê. Biraderek hat ez ji ba asayîşê birim û 6 mehan ez xwedî kirim. Ez birim nexweşxanê û alîkariyeke zêde da min. Piştî ku ez hinekî baş bûm. Îcar ez ketim pey jin, zarok û xizman. Piştî heyamekê min bihîst ku jin û zarok hemû derbasî Sûriyê, devera Reqayê kirne. Jin di malakê de girtî bûn ku weke xidam û kar û barên malên wan dikir jinên êxsîrkirî. Min xwe gihand û bi pere jin û her du zarok rizgar kirin. Ji xwe 4 zarokên min hebûn. Kurê min ê mezin hat kuştin. 2 kurên biçûk li gel diya xwe bûn û keçik jî birûbûn devereke din."

**"Dewleteke Kurdî hebûya ev nedihat serê me"**

Îdrîs Beşar radigihîne ku 5 hezar û zêdetirî 300 Kurdên Êzidî li derûdora Şingalê girtin û kuştin. 3 hezar û 400 kes winda ne. Mêr hemû kuştin, jin revandin, pîr mirin, zarok mirin. 27 gorên komî li derûdorên Kurdên Êzidî hene. Li koço jî 9 gorên komî hene. Bi tevahî 34 gorên komî niha li devera Şingalê hene. Gelek ji wan nehatine vekirin. Hinek avê birine. Gelek hê nehatine derxistin. Heta niha 3 hezar kes rizgar bûne. Ez jî ji gorê me." Îdrîs Beşar di dawiya gotinên xwe dibêje Zaxo û Duhokê alîkariyeke mezin gihande me û axaftina xwe wiha bidawî dike: "Hêviya me dewletbûn bû, em li benda serxwebûnê bûn. Em di navbera aliyan de mane. Heşda Şiebî jî ji bo Şîetiyê dixebitin. Gef in li ser bawerî û hebûna me. Em êdî hebûna Ereban ji kîjan mezhebê bin jî qebûl nakin li Şingalê. Me hesab dikir ku em ê bikevin ber hikmê dewleta Kurdistanê. Ol cuda be jî em hemû Kurd in û hêviya me hebû. Lê niha rewş careke din xerab bû. Dewleteke Kurdî hebûya ev nedihat serê me."



# Di bin xemgîniyê de bîranîn û sersaxî

CANO AMEDÎ



Di van rojên dawî de, weke hûn jî baş dizanin derûniya gelek kurdên dilsoz û welatparêz serûbin bû. Civata kurd careke din, di bin êşa îxanetê de, bi rastiya xwe re rûbirû bû. Êşa îxanetê li gor baweriya min êşeke kûr û dijwar e. Mirov zêde pê diêşe. Lewra, dijmin her tim bê minet e, gilî û gazin ji wan nabe. Ew dijminatiya xwe dikin. Lê belê ew aliyên dibin navê "kurdî" de rola dijmin dileyizin, propagandayên reş dikin mirov diêşînin. Em hemû dizanin di pêvçûn an di şeran de têkçûn û serkeftin li gor hêz, qewet, şert û demê tê guhertin. Lê êşa xencera piştê gelek giran e, nayê jibîr kirin û zêdetir mirov diêşîne! Ez bawer im bi milyonan kurd niha wê êşê di dilê xwe de dijîn.

Durûtî û îxanet her tim di nav refên şoreşa Kurdistanê de xwe veşartiye, cih çêkiriye û roj hatiye bi destê dijmin weke xencereke bi jehr, li pişta "birayên xwe" xistine. Lîstikvan, li gor demê tên guhertin. Lê seneryoya îxanetê herdem bi destê dagirkeran û xwefiroşan tê sazkirin. Em dikarin ji salên 1800î û vir de, mînakên balkêş binivîsin. Her hewldan, berxwedan an serhildanên tekoşîna gelê kurd, bi xencera îxanetê têkçûne. Dijminê gelê kurd derûniya civat û kesayetên kurd baş tahlîl kiriye, dijmin baş dizanin ku bi çi awayî, wan bixapînin û bi xwe ve girêbidin. Carina di bin siya olî, carina bi navê "biratiya gelan" carina jî, bi navê çepitî û rastiyê gelê kurd hatiye xapandin. Lê xuya ye xapînoka herî mezin pere ye. Napolyon bîlesev ne gotiye: Pere-pere-pere. Ji ber van sedeman li Kurdistanê herdem, bandora xewn û xeyalên xwefiroşan destê dagirkeran xurt kiriye.

***

Di nav hefteyekî de min sê nûçeyên xemgîn girtin. Ez gelekî ber ketim. Sê dost, sê kesayet li pey hev, ji nav me koç kirin. Jiyana her yekî bi serê xwe balkêş e! Malbata Şex Seîd û ya Seîd Elçî weke malbatê welatparêz, her tim "baca" tevlîbûna doza kurdî dane. Dewleta dagirker bi kuştinê, bi darvekirinê, bi penaberî û bi dorpeçkirina jiyanê ev malbat ceza kirine û hê jî dike…

Mirov pirî caran di bin bandora nûçeyên xemgîniyê û bûyerên civakî de rastî hestên giran dibe. Li seranserê erdnegeriya me, bi giranî di nav pêlên jiyanê de, di demên teng û zordariyê de, bêvefayî di astên bilind de. Gilî, gazin û dilşikestinên bê watê mirovan ji hevdû dûr dixin. Nizanim ev hestên hanê di nav gelê Kurdistanê de çima ewqas bi bandor in? Gelo ev xusiyeta hanê di nav netewên din de jî heye an na?

Dîroka me dîrokeke bi xwîn, bi êş û trajedi ye! Her bihostek axa Kurdistanê bi xwîna şehîdan, bi jenosîdan û polîtîkayên qirkirinê tije ye. Gelek kesayetên navdar û malbatên kurdî di nav rûpelên dîrokê de cih girtine. Çîroka jiyana her yekî bi serê xwe mijara fîlm û romanan e! Hemû merxas, têkoşer û egîdê rojên bêdengiyê bûne. Di kûrahiya bêdengî û tarîtiyê de, çirûskên şoreşê pêxistin û kirasê bêdengiyê çirandin! Ji ber van sedeman gelê kurd herdem deyndarê wan hêjayî û pakrewanan e!

Gelê kurd, bi bacên giran ji bo jiyaneke azad, ked û xebat kiriye û hê jî dike. Sembol û serkêşên demên berxwedanê, ji aliyê dijmînên xwînxwar ve hatine şehîdkirin. Malbat û zarokên wan ji aliyê dagirkeran ve hatine cezakirin û herdem rastî tadeyî û xerabiyan bûne. Dewlet di hemû deman de, wan malbatan li dijî xwe weke tahlûkeke mezin, weke potansiyeleke serhildanê dîtiye û dibin çavdêriyê de xwestiye kedî bike. Pirî caran polîtîkayên dagirkeran bi ser ketine lê herdem weke tovên berxwedanê, têkoşer li ser axa Kurdistanê kêm nebûne. Her têkçûn bi xwe re pêleke berxwedanê aniye û tovê hêviyê geş kiriye.

Piştî berxwedan û serhildanan, demên pêvajoyên têkçûnê bandoreke giran li ser gelê kurd çêkiriye. Demeke direj bêdengî û tirsê civata kurd dîl girtiye. Encamên bandora şikestin û têkçûnê bi xwe re problemên mezin anîne. Weke civatên bindest, civata kurd jî, di bin hestên têkçûnê de, ketiye labîrenta bêheviyê. Pirî caran civat li dijî malbatên serkêşiya têkoşînê kirine sar bûye, ji gelek sedemên cuda, civata kurd di bin bandora dagirkeran de maye û li wan malbatan, kesayetan neheqî kiriye. Rê li ber bêwefatiyê vekiriye.

***

Di hefteyekê de sê dostên hêja, sê hêjayên qedirbilind ji nav me koç kirin. Çîroka jiyana wan, ked û xebatên wan, dîroka binemala wan rûpelek dîroka gelê me ye. Em hemû şirîkê ked û xebatên netewî ne, jiyana her kurdekî welatparêz ji bo me girîng e û cîhê rêz lê girtinê ye.

Parêzer Celadet Elçî, kurê rehmetî Seîd Elçî ye. Seîd Elçî, yekem serok û sekreterê PDKT bû. Jiyan û têkoşîna pêşmergê welat bi serê xwe balkêş e. Dram e! Trajedî ye! Di dîroka Kurdîstanê de herdem weke birîneke kûr pîvanên heq û hiqûqê radixe ber çavan. Celadet Elçî demeke direj, li dijî nexweşiyeke giran berxwe dida. Jiyana wî di nav êş û tengasiyê de derbas bû. Di bin bandorên negatîf de, bi piştgiriya xwîşk, bira û diya xwe li dijî tengasî û jiyanê rawestiyan! Bi vîneke mezin bi ser ketin û bingeha jiyana xwe ava kirin. Lê mixabin nexweşiya pençeşêrê weke neyarekî xayin roj bi roj li dijî wî sekinî û zirar da wî. Di temenekî ciwan de ji nav me koç kir.

Nûçeya duyem a heval û dostê min ê zîndana Amedê, mirina Kenan Kızıl bû. Kızıl têkoşer û welatparêzekî hêja bû. Bi bîr û baweriyên xwe, bi sekn û helwestên xwe Kurdistaniyekî hêja bû. Di zindana Amedê de, di rojên giran û reş de hevalekî têkoşer bû. Piştî ji zindanê derket, di nav refên siyaseta kurd de cih girt. Kenan Kızıl bi nexweşiya dil zû ji nav me koç kir.

Nûçeya sêyem mirina heval, dost û birayê ezîz Şêx Behrun Aygören bû. Şêx Behrûn yek ji endamê binemala Şêx Seîdê Pîranê bû. Şêx Behrûn, neviyê Şêx Mehdî, kurê Şêx Husameddîn bû. Şêx Behrûn weke hemû endamên malbata xwe di bin zilma dewleta dagirker de jiyaneke xerab dît û jiya. Malbat gelek caran koçber bû û li xeribiyê, di nav şertên tunebûnê de jiyana xwe domandin. Li bin "xetê", li ser "xetê", li Trakya penaberiyek bi êş kişandin. Şêx Behrun gelek caran rastî zilma dewleta dagirker bû, îşkence û zehmetiyên mezin dîtin. Demeke direj serokatiya şaredeiya Pîranê kir. Şêx Behrûn bi nexweşiya dil koça dawî kir.

Ez careke din bi koça dawî ya dost û hevalên hêja, xemgîniya xwe bi we re parve dikim. Ji malbatên wan re, heval û hogirên wan re ser saxiyê dixwazim. Cihê wan bihûşt be.

# Li Cizîrê zagona baca dahatê hat sepandin

■ GÊNCO XELÎL

Di destpêka meha Çileya Paşîn de, biryara encûmena zagonsaz a kantona Cizîrê ya taybet bi sepandina baca dahatê li ser astên kes û dezgehan, kete warê cîbicîkirinê. Berî derketina vê zagonê jî bac dihatin komkirin, çi di riya rêbendan re û çi bi riya dezgehên Rêveberiya Xweser re.

Komkirina bacan gelek caran bûye cihê rexnekirin û milmilandinê , ji ber bi awayekî ne birêkûpêk dihatin komkirin. Cîbicîkirina zagonê hîn di destpêkê de ye û niha komîteyên taybet têne avakirin, lê karvedanên rengereng derketin holê.

**"Bac wê ji bo xizmetguzariya welatiyan werin xerckirin"**

Berpirsê Rêveberiya Darayî li bajarê Dêrikê Ehmed Xelef dibêje hatibû biryarkirin ku ji destpêka sala nû ve bac bihatana standin lê ji bo ku fişar li ser welatiyan çê nebe dê ji niha ve dest pê bikin û ev bac bi awayekî salane dê werin stendin. Xelef diyar kir ku naveroka zagonê wiha ye: "Her yekê xwedî dahat be dê baceyê salane bide! Lê xwendekar, hêzên parastinê ku dahatên leşkerî distînin, nexweşxaneyên giştî û dibistanên giştî" ti bacan nadin. Di derbarê xerckirina bacên dê werin komkirin dê ji perwerde û dibistanan re be, herwiha navendên tendirustî û ji dabînkirina av û elekitrîkê bin."




**Welatî çi dibêjin?**

Bazirgan ciwan ji xelkên bajarê Dêrikê ye, rexneyan li komîteyên dabînkirina bacan dike. Ciwan wiha dibêje: "Rexneyên me li wan komîtan ew in ku riya destnîşankirina endamên wan komîtan ne rast e û divê ew kes ji nav bazar û bazirganan bin, ji ber ku tenê ew rewşa bazarê dizanin û dikarin bi awayekî rast nirxê bacan deynin. Rustem Solîn, keşa Dêrikê dibîne ku ev zagon erênî ye lê divê rêvberî xizmetguzariyan jî pêşkêşî xelkê bike û wiha dibêje: "Ez bawer dikim divê ne tenê vêrgiyan bistîne û lê divê xizmetên mîna tendiristî û xwendiniyê jî pêşkêş bike."

Li kontona Efrînê jî zagoneke wisa tê gengeşekirin lê heya niha Encûmena Zagonsaz tişt dernexistiye lê komkirina bacan her berdewam e û bi taybetî di serê salê ango ev dem dikeve çaxa berhevkirina werzê zeytûnan.

Tê zanîn ku di sala 2016an de Encûmena Zagonsaz li kantona Cizîrê yasaya baceya dahatan derxist û ji aliyê Rêveberiya Xweser ve hate pesendkirin û ji vê mehê ve dê were sepandin.

"Her yekê xwedî dahat be dê baceyê salane bide! Lê xwendekar, hêzên parastinê ku dahatên leşkerî distînin, nexweşxaneyên giştî û dibistanên giştî" ti bacan nadin. Di derbarê xerckirina bacên dê werin komkirin dê ji perwerde û dibistanan re be, herwiha navendên tendirustî û ji dabînkirina av û elekitrîkê bin."

# Festîvala şanoyê li Rojava dest pê kir


Sêyemîn festîvala(Mîtan) a şanoyê 11ê Mijdarê li navenda Çiyayê Kurmênc, li bajarê Efrînê ya Rojava dest pê kir.

Festîval bi dirûşma, 'Em jiyanê diçînin' roja 26ê vê mehê, dê 12 şanoyan pêşkêşî xelkên bajêr bike. Li gor serpereştvanên çalakiyê, hemû şanoyên li festîvalên tên nîşandan ji berhemên law û keçên deverê ne, ango biryar hatibû dayîn ku hin şano ji devera Cizîrê jî bihatana lê ji ber nebûna rê kesî nikariye xwe bigînin bajarê Efrînê û tevlî festîvalê bibin.

Endamê Rêveberiya Giştî ya Festîvalê Mihyedîn Erselan di derbarê festîvalê de ji Heftenameya Basê re axivî û da xuyakirin ku wan hewil daye ev festîval ji yên berê cudatir be û bêtir berve pêşkirina karên şanogerî herin, ji ber ku di kopiyên bihûrî de, bêtir paldan li ser fîlmên sîneme û sînevîziyonan dihatin kirin.

Erselan wiha pê diçe: "Di rojên bihûrî de cureyên şanoyê hatin pêşandan, mîna şanoyên stranî, derbirînî, nîşanî hebûn û mijarên wan şanoyan ji folklora Kurdî hatine girtin, ji bo ku em karibin folklora xwe bi riya şanoyê vejînin. Mihyedîn diyar dike ku îsal neh şano ji amadekirina law û keçên Efrînê dê werin pêşandan û di bernamê de biryar bû ku sê şano ji bo herêma Cizîrê hatibûn terxandin lê bi sedema nebûna rê, wan mêvanan nikarîn bigihiştana Efrînê.

**Derhênerên jin zêde bûne!**



Li gor Mihyedîn Erselan dide nîşan dan ku hejmara derhêneran û bi taybetî di jinan de zêde bûne û hêdî hêdî festîvala Mîtan bi saya van derhêneran ber ve akadîbûnê diçe. Erselan teqez dike ku şano li Efrînê pêş de diçe û niha jî nav neh derhêneran sê keç hene û ev bi xwe destkeftiyeke mezin e. Di dawiya axaftina xwe de Erselan hêvî dike ku festîvala Mîtan berve cîhaniyê biçe û hemû çand û netew karibin tê de beşdar bibin.

Di roja yekem de sê şano hatin pêşkêşkirin: Hindê û Rindo, Memê Alan, yan man yan neman. Di roja duyem de (15ê mehê) şanoya 'Bêkes' ya ku ji tekstekî frensî hatiye wergirtin hate pêşandan, şano ji derhênan û lîstina Hêvan Bozo û Osman Hesen bû.

**Em meraqdarê şanoyê ne**

Derhênera ciwan Hêvan Bozo li ser naveroka perçe-şanoyê ji Basê re axivî û got ku tekista nivîskarê frensî Burêh lînd Syorm li ser mirovekî bêkes disekine ango ew mirovê bêkes û yekta, bi tena xwe dijî, ew her tim difikire ku kesek ji wî fêm nake û xwe dûrî cîhanê tev de dike, keçeke biçûk hewil dide ku wî ji wê rewşê derxe û jiyana xweş bi wî bide nasîn, her wiha nêrîna wî ya bedbîn biguhêre, ta ku bi hewildana xwe wî vedigerîne zarokatiya wî û jiyana xweş lê vedigerîne û wî ji wê rewşê derdixe.

**Jin dikare civakê biguhêre!**

Derhênera ciwan Hêvan Bozo di riya vê şanoyê re dixwaze rola jinê di civakê de berz bike. Bozo teqez dike ku jin bi nermiya xwe dikare diyardeyên neyênî biguhêre û jiyana mêrên nexweş bîne ser riya rast û di civakê de kedî bike! Di amadekirina şanoyê de, her du leyzvan rastî astengiyan hatine ji ber ku ew bi tenê bûn û wan bi rolên derhênan, lîstin û amadekirina dîkor rabûne!

Ji aliyê din ve, lîstikvan Osman Hesen ji sê salan ve bi şangeroyê, weke meraqekê, mijûl dibe. Li ser rola xwe di şanoya 'Bêkes' de Osman dibêje ku ew ji xwe razî bû û ewî kariye mesaja xwe bigîne temaşevanan. Peyama şanoyê, li gor lîstikvan Osman ew e ku civak kesan dêşîne, loma hinek berê xwe didin tenêbûnê û ji civakê dûr dikevin tevî ku lehengê vê şanoyê mirovekî zaniyar û hozan e, lê di heman demê de, jin dikare bi rola xwe rabe û mirovên wisa ji sawêr û tenêtiyê bi narîniya xwe rizgar bikin. Mihrecana Mîtan a şanoyê dê 26ê vê mehê bi aheng û belavkirina xelatan bi dawî bibe.

**Li Cizîrê jî festîvala Fîlman**

Di heman demê de 13ê Mijdarê mihrîcana fîlman li bajarê Qamişlo dest pê kir, ango ev festîvala duyemîn e ku ev ton mihrecan li dar dikeve, ev festîvala di bîranîna şewata sînemeya Amûdê de tê li darxistin. Derî di beşdarbûna vê festîvalê de, vekirî bû ne tenê fîlmên li ser asta Kurdistanê lê ji hemû aliyên cîhanê fîlm tên pêşwazîkirin . Li gor Ibrahîm Koçer, komîta mihrîcan Fîlma Rojava 97 fîlm wergirtine, lê ji wan 77 fîlm jê beşdar bûne.

Mihrecana navendî li bajarê Qamişlî dest pê kiriye û heya 17ê Mijdarê berdewam dike. Pêşandana fîlman dê li kêlek Qamişlo li pênc bajarên dîtir jî werin nîşandan ango li bajarên Dêrik du rojan fîlm dê werin nîşandan , li Hesekê rojek li Serêkaniyê du roj, li Amûdê rojek, li Kobaniyê rojek. Li gor ku endamê komîna Fîlmên Rojava, li dawiya mihrecanên dê xwediyê fîlma serketî were xelatkirin.

Li gor serpereştvanên çalakiyê, hemû şanoyên li festîvalan tê nîşandan ji berhemên law û keçên deverê ne, ango biryar hatibû dayîn ku hin şano ji devera Cizîrê jî bihatana lê ji ber nebûna rê kesî nikariye xwe bigînin bajarê Efrînê û tevlî festîvalê bibin.

# Berdevkê HSDê revî an hat revandin?

Sibeha 15ê Mijdarê, fermandarekî lîwaya El-Şemal li devera mertala Feradê li Cerablûsê, ragihand ku Berdevkê Fermî yê Hêzên Sûriya Demokratîk gihîşt navenda wan li bajarê Cerablûsê, piştî ku rêbenda hêzên Kurdî li gundê Ewn Dadat ê devera Munbicê derbas kiriye û piştî wê Telal Silo bi çekên xwe yên kesane û tirembîlekê derbasî nav xaka Tirkiyê bûye.

Piştî du rojan ji derketina nûçeya cudabûna Telal Silo û girtina manşêtên mal û alavên ragihandinê, fermandariya giştî ya HSDê daxuyaniyek belav kir û tê de xuya kir ku Telal Silo, bi vîna xwe û li gel pêkhateya xwe leşkerî ve tevlî HSDê bûye û tê de weke berdevkê fermî yê HSDê hatiye perwerdekirin û heya rêçên wî hatine wendakirin li ser karê xwe bû.

**Mija li ser bûyerê belav nebûye**

HSDê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku ev heyameke Telal Silo tevî malbata xwe di bin gef û fişaran de bû û wî jî ji ber van gef û tehdîdan dixwast dest ji kar bikişîne. Herwiha di daxuyaniyê de tê gotin ku Silo di encama operasyoneke saloxgerî ya taybet de bi alîkariya hin endamên malbata wî hatiye desteserkirin û birîne bo Tirkiyê. Di heman demê de fermandarekî din jî îdîa kir ku Telal Silo bi hin belge û komeke peran ku tê gotin ji 100 hezar dolaran pêk tê bi xwe re birine.

**Telal Silo kî ye?**

Telal Elî Silo di sala 1965an li gundê El-Raî ya gundewarê Helebê ji dayîk bûye, bi nijada xwe Turkmen e, di sala 1985an de tevlî koleja esmanî bûye û weke fermandar derçûye. Di sala 2004an tê girtin û piştî du salên zîndakirinê û ji Artêşa Sûriyê tê dûrxistin. Piştî ku şerê navxweyî yê Sûriyê dest pê dike, sala 2013an de serkêşiya koma Lîwaya Selacîqe ya Artêşa Azad li bajarokê Raî dike heya ku DAIŞ wê deverê dixe bin kontrola xwe, pişt re neçar dibe û berê xwe dide Tirkiyê û çend salan li Tirkiyê dimîne. Di havîna 2015an de tevlî Artêşa Şoreşgeran li Efrînê, dibe. Piştî du salan ji damezirandina HSDê Telal Silo dibe berdevkê HSDê û rûmeta xwendina daxuyana rizgarkirina bajarê Reqayê ji DAIŞê, destine.

Di heman demê de fermandarekî din jî îdîa kir ku Telal Silo bi hin belge û komeke peran ku tê gotin ji 100 hezar dolaran pêk tê bi xwe re birine.

Heya niha di derbarê vê mijarê de ji aliyê malbata Silo, an jî ji aliyê berpirsên Tirkiyê ve tu daxuyanî nehatine dayîn. Tenê raguhandina rikberiya Sûriyê li ser navê wî axaftinan belav dike, lêbelê ev yek mija li ser vê mijarê belav nake. Heta niha nayê zanîn ka Silo hatiye revandin, an ji HSDê cuda bûye an jî ew bi xwe çûye radest bûye.





**FIRAT CEWERÎ**

## Jin

Ji bilî ku jin dê, xwişk, keç û jinên me ne, fonksiyoneke wan ya din jî heye; ew rengên civatê ne jî. Ew bi hebûn û tevlêbûna xwe ya civatê, civatê diguherin, hişkiya wê nerm dikin; wê estetîze, modernîze û erotîze dikin. Civateke ku jin tê de tunebe, ew civat hişk e, ji tolerans û humanîzmê bêpar e, dûrî medeniyetê ye, ne hevdem e. Hebûna jinê ya di siyaset, huner û edebiyatê de nîşana pêşketina civatê ye. Bi taybetî jî huner û edebiyata ku fikir û fantaziya jinê tevlê nebûbe, tahma wê kêm e, kelê ye.

Jin avakir û afirandêner e; ew ne tenê bi zarokan avis dibin, ew bi gotinan jî avis in; bi gotinên efsûnî, nihênî û sihêrdar. Heke em gotinên wan ji ber wan negirin û wan najon ser beravêtina gotinan, em ê bi gotinên wan ji belengaziya zilamtiya xav rizgar bibin û pê di deriyê hisên wan re têkevin hundirê ruhê wan. Em ê di pakiya ruhê wan de xwe di dilê wan de bibînin. Wê dilê wan mazûbantiya malzaroktiyê ji me re bike. Em ê hingî nexwazin xatir ji malzaroka dil bixwazin. Em ê pê re bibin yek. Em ê ne wê bikujin, ne jî di ber wê de bên kuştin. Em ê bi hev re di pêlikên jiyanê de ber bi jor ve hilkişin.

Jin jî mêj ve di govenda edebiyatê de ne, xwe li ba kirine û gelek caran bûne serkêşên govendê. Sapfoya Lesbosî (650-590 berî Îsa) bi helbestên xwe ên li ser evînê hem tesîreke mezin li hevdemên xwe kiriye, hem jî bi wê tesîra mezin heta sedsala me hatiye. Heke xewn û fantaziyên nivîskarên jin ên mîna Jane Austen, Mary Shelley, Victoria Benedictsson, Selma Lagerlöf, Cora Sandel, Virgina Woolf, Astrid Lindgren û bi dehan yên din tevlî gotina nivîskî nebûna, wê edebiyata dinyayê ya bedew îro ne ewçend bedew bûya.

Herçiqas navên jinên kurd di nav listeya nivîskarên jin ên dinyayê de tunebin jî, lê li gora çavkaniyên gerok û misyonerên ewrûpî, jinên kurd ne wek jinên ciranên xwe girtî bûne; ew vekirî, desthilatdar û di civatên mêran de xwedî gotin bûne. Ew hisî bûne, dane dû dilên xwe, ji bo evînên xwe nihurandine; guliyên xwe kirine hefsarên hespên hezkirên xwe, bazinên destên xwe ji hespên wan re kirine nal û di oxira evînên xwe de bav û bira kirine qurban. Wan gelek caran evînên dilên xwe bi gotinên xwe ên dilşewat hûnandine, bi awaz kirine û xwe lê berdane. Ew bi anonîmîtiya xwe, bi hunera xwe ya bilind, di edebiyata kurdî ya devkî de bûne kevirên giran. Giraniya wan ya di edebiyata nivîskî de jî hebûye, di dema xwe de bi nivîskarên mêr re qayiş kişandine, lê ji ber gelek sebeban negihiştine roja me.

Mele Îsmetê (Kiliçaslan) rehmetî, bi xebata xwe ya mitewazî, di bin sernava "Edebiyata kurdî ya klasik" de, (Nûdem No: 40- 2001) navên çend jinên şair dide. Ew di "Dugela Deylemî" de navên Calele Xanim, Şaxweşîn û Fatme Xanimê dide. Di "Dugela Erdelanî 1220-1869" de jî navên Nêrgiz Xanim, Semen Xanim û Mestûre Xanimê bi lêv dike. Herçiqas em îro ji berhemên van xatûnên ku demekê bi edebiyata xwe ya bedew ronahî dida civata me bêpar bin jî, dîsa hin nimûne ji edebiyata wan bi delkan be jî gihiştine roja me.

Lê ev têr nake, hewcedariya edebiyata me ya nûjen bi nivîskarên jin heye. Digel ku ez di hin kitêb, kovar û malperan de pêrgî nivîskarên jin têm jî, dîsa pir kêm in. Kêm bin jî ez lê radiwestim, bi baldarî û bi kelecan dixwînim û jê têr nabim…

# Erdheja Kurdistanê

**ŞERÎF FELAH**





Di şeva 12ê Mijdarê de saet di derdora 21:20an de erdhejek ku li çar perçeyên Kurdistanê û çendîn welatan hat hîs kirin pêkhat. Navenda Meteorolojî û Erhejê ya Kurdistanê ragihand ku pileya erhejê li Derbendîxan, Germiyan û Helepçeyê 7.2 bû. Li gor pisborên Tehran û Bexdayê navenda erdhejê di navbera Rojhilat û Başûrê Kurdistanê ye, bi taybetî jî Ezgeleya Derbendîxanê û Bawecaniya Kirmanşahê bûye.

**Zirar û qurbaniyên li Herêma Kurdistanê**

Erdhej her çar parêzgehên Herêma Kurdistanê û herêmên ne di bin îdareya Herêma Kurdistanê jî hat hîs kirin. Lê deverên herî zêde jê tesîr girtine Derbendîxan û Herêma Germiyanê ye. Li van deveran 8 qurbanî û bi sedan kes jî birîndar bûn.

Dîsa li deverên din jî qurbanî hene. Di vê derbarê Wezîrê Tendûristî yê Herêma Kurdistanê Rêkewt Heme Reşîd ji Heftenameya Basê re ragihand ku: Di erdhejê de li Derbendîxanê 5, Germiyanê 2 û Silêmanî jî kesekî jiyana ji dest da." Dr. Reşîd dibêje; Birîndarên di erdhejê de birîndar bûne 201 kes in û ew jî ji bo nexweşxaneyan hatine veguhestin. Ji ber erdhejê jî 120 kesî şoqa tirsê derbas kirin û ew jî ji bo nexweşxaneyan hatine veguhestin. Birînên wan sivik bûn tedawiya wan hat kirin."

Her çiqas ligel Silêmanî û Helepçeyê erdhej li Kerkûk, Hewlêr û Duhokê ne bi tundî jî hatibe hîs kirin ji ber ku cara yekemin e rastî erdhejan tên gelek mal hatin rûxandin û çendîn kes jî birîndar bûne.

Li gor pisborên erdhej û jeolojiyê erdhej ji ber sedema şikendina xwezayî ya guherandinê pêk hatiye û ji ber ku şikestina rast û berovajî laqî hev hatine û erdhej pêkhatiye. Di dîrokê de ne li Kurdistanê ne jî li Zagrosan erdhejeke wisa pilebilind pêk nehatiye.

Li gor daneyên Herêma Kurdistanê û gel piraniya birîndaran ji ber tirs, şoq û tunebûna hişmendiya erdhejê pêk tên.

**Erdhejê herî zêde ziyan da Kirmanşahê**

Li gor dîmenên ji malên Mehrê (avahiyên ku ji aliyê dewleta Îranê ve hatibûn çêkirin) de Îranê ji dêlva ku alîkariya mirovî bişîne devera erdhejê tenê pasdarên bi çek şandiye.

Kesekî ji ekîba midaxeleya bilez di dîmenê de wiha dibêje: "Em li vir bi sedan kesê ku alîkariya bilez dikin hene lê di destên me ti îmkan nîn in. Em nikarin bi qeweta destan van molozan rakin û xebatê bikin. Ev rewş gel acis kiriye û bi nebûna derfetan ji bin avahiyan malbatên xwe derdixînin.

Gelê ku malên wan hilweşiyan e li park û deverên din bêyî ku pêdiviyên wan bicih bên û li ber sermayê dijîn. Kon û betaniyên wan nîn in. Berpirsên Îranê ji maniyan pêştir tu tiştî nabêjin û ji gel re nabin alîkar.

Çavkaniyên li Kirmanşahê destnîşan dikin ku daneyên Hikûmeta Îranê li ser malperên xwe ragihandiye ne rast in.

Qurbaniyên erdhejê

Her çiqas hikûmeta Îranê 700 mirî û ji deh hezaran zaftir birîndar ragihandi be jî li gor çavkaniyên Qesrî Şirînê ev hejmar xelet in û Bijîşkekî ji nexweşxaneyê ji Basê re radigihîne ku: "Min bi xwe tenê belgeyan definkirina 570 kesî îmze kiriye. Yanê hejmara qurbaniyan ji ya ku hikûmetê ragihandiye gelekî zaftir in."

Tenê li bajarê Serpêl Zehawê ewçend kesî jiyana ji xwe dest daye. Bêguman qurbaniyên li Kirmanşah, Kirênd, Salasî Bawecanî, Daleho, Qesrî Şirîn û 576 gundan zêdetir e. Di encama operasyonên filitandinê de jî hejmar wê zaftir bibe mixabin.

Rehman Seferî ji Serpêl Zehawê ji malpera 'Cam Cem' ê re ragihand ku tenê ji malbata wî 22 kesan jiyana xwe ji dest daye.

Ev bobelat di demeke ku teknolojî pir pêş ketiye rû da ku herkes îro peyamnêrê serbixwe ye. Li gelek bajaran di nava 24 saetan de gelek dîmenên trajîk hatin weşandin. Gel di bin rûxandinan de li malbatên xwe digere û îmkan jî nîn in. Ev dîmen jî kêmasiya hikûmetê jî derdixin ber çavan.

**Ziyanên avahiyan**

Li Kirmanşahê ligel ziyanên canî tunebûna daxwazên rojane jî gel aciz dike û hêviyan dişkîne. Ji ber ku av, elektirîk û xaza malan hatiye qut kirin, li Serpêl Zehawê ava vexwerandinê qirêjî bûye û berpirsên hikûmetê ji dêlva ku çareser bikin heta niha tu gav ne avêtine. Piraniya gel koç kir, devereke ku lê bimînin nehat dîtin.

Li gor zanyariyên di dest de û malperên Hikûmeta Îranê yên fermî, bijîşkên Kirmanşahê bi piranî çûne merasîmên Wîlayeta Îlamê ji bo çileya Îmam Huseyn. Ligel vê jî ji bo çileya Îmam Huseyn dermanên ku heyî ne jî hatine bikaranîn û cihên wan jî nehatine tije kirin. Niha li hemû nexweşxane û saziyên tendûrîstiyê kêmasiya derman û pêwistiyên tendûrîstiyê hene.

Ji ber ku nexweşxaneyên Serpêl Zehawê û Qesrî Şîrîn hilweşiyan e gelek birîndarên wan bajaran ji bo Mehabadê hatine veguhestin. Bajarên Qesrî Şîrîn û Serpêl Zehawê di şerê Îran û Îraqê de bi giştî hatibûn rûxandin û li van bajaran avahiya bingehîn nehatibû çêkirin jî. Wê erdhejê rastiya wan bajaran bi awayekî zindî anî ber çavan.

Li gor dîmenên medyaya fermî ya hikûmeta Îranê piraniya malên hatine rûxandin. Ev yek jî nîşan dide ku avakirina van projeyan çiqasî dûrî standartên cîhanî ne.

**Ji devê erdhejzedeyan mezinahiya bobelatê**

Erdhejzedeyekê ji Kirmanşahê: "Pasdaran dest danîn ser alîkariyên bi dildarî." Li erdheja Kirmanşahê ji 550î kesî zaftir mirovî jiyana xwe ji dest da. Ji 9 hezarî zêdetir kes jî birîndar bûn. Li gor çavkaniyên herêmî Pasdarên Îranê dest datînin ser alîkariyan.

Li gor dîmeneke li ser medyaya civakî belavbûyî hemwelatiyekî ji Kirmanşanê ji gundê Bizmîr Awayê dibêje ku: "Ew agahiyên ku dibêjin dewletê û saziyên fermî alîkariyan dikin derew in. Medyaya hikûmetê dibêje ku artêş û pasdar alîkariya mirovan dikin ne rast in. Li vir tenê ew kesên xwebexş alîkariya gel dikin. Asayîş dest datîne ser alîkariyên dildaran. Ligel windakirina nasên xwe gel ji ber tunebûna pêwistiyên xwarin û mayînê jî nîgeran in.

Gel li hember vê yekê dîmenan digirin û hikûmeta Îranê diderewînin. Tunebûna kinc, derman û ji bo xwarinên zarokan nîgeran in. Kesekî xwebexş li wir dibêje ku pêdiviya dermanan gelekî zaf e û ambulans tuneye ku birîndaran bibe nexweşxaneyan. Berpirsyariya van kesan ew kesê ku ambulans û derman birine Necef û Kerbelayê ne. Her çiqas çavkaniyên hikûmeta Îranê bi belgeyan û raportan bibêjin me alîkarî şandine herêmê jî gel bi dîmenên ku diweşîne hikûmetê diderewîne.

### Pasdaran dest danîn ser alîkariyan

Di heftiya din de gelek bikarhênerên medyaya civakî yên Rojhilata Kurdistanê bi dîmenên xwe rastiya Kirmanşahê û dewleta Îranê anîn ber çavên raya cîhanî. Li seranserê Rojhilata Kurdistanê gel bi alîkariyên xwe piştgiriya erdhejzedeyan dike.

Li gor zanyariyên ji herêmê tişta balkêş ew e ku hikûmet bi rêya Artêş û Pasdaran ji gel alîkarî xwestiye. Lê belê gel ji hikûmetê ne bawer e ku dê van alîkariyan ji erdhejzedeyan re belav bike. Ji ber vê yekê jî gel bi xwe alîkarayan berhev dike û alîkarî digihijîne erdhejzedeyan. Gel bi destên xwe alîkariyan dibe Kirmanşah, Serpêl Zehaw û Qesrîn Şîrînê û belav dike. Li gor gotina gelê Kirmanşahê û Salasi Bawecanî, Pasdar dest datînin ser alîkariyên ku bûye sedema avabûna hişmendiyeke netewî di nav Kurdistanê de. Pasdar û Artêş ditirsin ku ev alîkarî bibin sedema hişmendiyeke bihêz. Tu kes jî nizane ku ev alîkariyên Pasdaran dest daniye ser diçin ku derê.

> Li gor pisborên erdhej û jeolojiyê erdhej ji ber sedema şikendina xwezayî ya guherandinê pêk hatiye û ji ber ku şikestina rast û berovajî laqî hev hatine û erdhej pêkhatiye. Di dîrokê de ne li Kurdistanê ne jî li Zagrosan erdhejeke wisa pilebilind pêk nehatiye.

# "Li vir ti kes welat nafiroşe!"





Li Rojhilatê Kurdistanê xelk hêrs û kerba xwe ya li hember radestkirin û dagirkirina Kerkûkê, bi çalakiyên cur bi cur tînin ziman. Kurdên Rojhilatê Kurdistanê li bajarê Bokanê di dema veşartina termê pîremêrekî Kurd de peyameke balkêş li ser "xiyaneta 16 Cotmehê" ya li hember Kerkûkê û miletê Kurdistanê dan.

Pîremêrê ji Bokanê bi navê Ebûbekir Meirûfî di dema veguhestina alîkariyên mirovî bo mexdûrên erdheja Kirmaşanê de di bûyereka trafîkê de jiyana xwe ji dest da. Termê wî pîremêrê Kurd roja şemiyê bi merasim û şîneke mezin li bajarê Bokanê yê Rojhilatê Kurdistanê hat veşartin. Di dema merasîma veşartina termî wî pîrmêrî de, komek welatiyan pankartek hildabûn ku li ser pankartê wiha hatibû nivîsÎn: "Li vir ti kes welat nafiroşe, boy dimirin!"

**"Xiyaneta 16ê Cotmehê"**

Ev peyama Rojhilatiyan bo misîbeta 16 Cotmeha îsal bû ku hatibû sere Kerkûkê û deverên din yên Kurdistanî. Di 16ê Cotmehê de bajarê Kerkûkê ku weke 'Quds'a Kurdan tê zanîn, di encama îxaneta baskekî YNKê ev bajar û devereên din yên Kurdistanî ji aliyê Heşda Şeibî ve hatin dagirkirin. Ev rûreşî di nav Kurdan de weke, 'Xiyaneta 16ê Cotmehê' tê zanîn.

> Di dema merasîma veşartina termî wî pîrmêrî de, komek welatiyan pankartek hildabûn ku li ser pankartê wiha hatibû nivîsandin: "Li vir ti kes welat nafiroşe, boy dimirin!"



**KADIR KARAGÖZ**

## Eger Edîson Kurd bûya

Di rojeke înê ya ji rêzê, di derûniyeke têra xwe tevlîhev û di zemanekî kurt û kin de gotara xwe dinivîsim. Min biryar dabû heta ku karibim ez li ser sîyasetê nenivîsim lê hema ev zor e siyaset weke tavê ye her çiqas mirov dûrî wê be jî ew pir nezîkî mirov e û hûn dizanin tava Amedê tûj û dijwar e. Ez li ser biryara xwe me, ezê îro li gel jîyana Thomas Alva Edîson li ser sosyo-psîkolojiya welêt binivîsim.

Werin em binihêrin bê Edîson Kurd bûya dê çi bûya. Berî her tiştî bêjim emê hîn jî di tariyê de bûna; di psîko-sosyolojiya hazir a Kurdan de Edîsonek dernakeve, şert û merc nahêlin Edîsonek çîroka xwe temam bike.

Edîsonê di sala 1847an de tê dinê bîçukê şeş xwişk û birayan bûye: Heger Kurd bûna ewê bibûna xulamê kek û xwişkên xwe, here pêşiya mêvanan, avê bîne, pencere veke, derî bigire, here dikanê cixarakê bîne, solên mêvanan rast bike. Vala negotine: 'Bira mirov biçukê gura be ne biçukê bira be'. Ka feqîrê Edîson di kîjan navberê de dikarîbû li ser dersên xwe hûr biba. Heft xwişk bira bûn jî bela ye li welat, xwedê neke ku xwişka wî bi pey yekî keta divê Edîson bi pey xwişka xwe û hezkirîyê wê keta, de ka were tevlî kêr û demançayan îcadan bike. Heger birayekî wî deynek mezin bikira divê ji ber deynan bireviya eyaleta Bostonê. Ji van birayên wî yekî ku mêrek bikuşta, îja diedilî, neyartî zor e, kî dikare hem ji neyaran bireve û hem jî lêkolînan bike. Divê Edîsonê reben laboratuwara xwe ya bi navê Menlo Park li kerê kira, ji New Jersey derketa û terkedinya bûba. Welatê me bela ku lê îndîvîdualîz pêş de neketiye deyn, xwîn û namusa yekî ji bira û pismamên wî tê pirsin.

Edîson dest bi dibistanê dike lê tenê di nava çar mehan de, mamosteyên wî bi sedema dereng têgihiştinê wî ji dibistanê dûr dixin: Heger Kurd bûna di peşî de dê û bavê wî û derdora wî ewê wî bêheş binav bikirana, henekê xwe pê bikirana û tiştê hebû jî dê biçûna tor belkî dîn jî bibûya.

Edîson di sala 1879an de lembê îcad dike û heba wan di 2.50 dolarî de 50.000 hebî difiroşe: Heger Kurd bûya ewê cîranê wî çavek lêxista weke topa ezmanan. Ewê merivên wî bi gotana: 'Heta doh jî deyndar bû, heta doh jî li Port Huron a Mîchîgan di trênan de li ser lingan sebze û fêkî difirotin, firrîya yaw…

Edîson bû şirîkê zanyarê înglîz Joseph Wîlson Swan, bi hev re şîrketeke mezin ava kirin û şiklê dawîn yê lembeyên îro danê: Heger Edîson Kurd bûya ewê merivên wî bigotana: "Jixwe ji berê de fehma wî kêm bû, çû xelk kir şirîkê xwe, ewê Josph Wîlson Swan pera jê biçirpîne" Hevalên wî wê serê wî gêj dilê wî qirêj bikirana û bigotana: "Ma kû şirîkatî tiştekî baş bûya ewê Xwedê ji xwe re şirîkek çebikira".

Edîson û Henry Ford du cîran û hevalbendên baş bûn gelek îcad û peşxistinên zanyarî û ticarî li ser kareba û otomobîlan pêk anîn heta mirin jî dost man: Heger Edîson Kurd bûya niha Beko Ewanek ketibû navbera wan û ew ji hev dûr xistibûna. Belkî îro em li trempêlên bê lembe siwar dibûn.

Bi van mînakan tişta dixwazim bêjim ev e ku di nava civaka îro de derketina Edîsonekî an Nîkola Teslayekî pir zor e. Nezanî, deyndarî, neyartî û çavnebarî herî zede ye. Divê di civaka me de ji dêvla nezaniyê zanyarî, ji dêvla deyndariyê arîkarî, ji dêvla neyartiyê biratî, ji dêvla çavnebarîyê desthevdan were bi cîh kirin. Ka binihêrin ji dema Kîyanîyan, Medan heta niha çima kesekî navdar ji me tine, qaşo em 40 milyon in. Divê em ji hev hez bikin xêr û başîya hev bixwazin bi derd û girîyên hev şad nebin nekenin. Divê em aramî û hizûra hev bixwazin, bera herkes bextewar be. Ji hev re yar bin, min di helbesteke xwe de gotibû:

Bikene yar, dixwazî bike neyar dostên min
Ned girî yar, bikene yar, dixwazî bixwe goştê min
Bi neçir a çav min bikûje bide guran postê min
Lê ned girî yar bike dojeh ti dixwazî bihûşten min

# Meşa Cengo

FERAT KEVIR



Di nav rûpelên dîrokê de meşên bi wate hatine kirin. Her ku gel ketiye tengasiyê û li rêya çareseriyê geriyaye meş mîna şêweyekî berxwedanê amade bû. Di dîrokê de gelek meşên bi wate hatine kirin. Hinek ji wan weke mesafeyeke ku bidin berxwe û biqedînin û pê re jî di dawiya meşa xwe de bigihijin armancên xwe û hinek jî dûr û dirêj in! Yek ji wan meşê dûr û dirêj bêgûman meşa Kurdan a azadiyê ye! Ev meşa wan ji bav û kalan weke mîrat maye! Di nav vê meşa Kurdan a dûr û dirêj de gelek lehengên hêja hene ku mirov bi her cureyên hunerê qala wan bike û ji gel re pêşkeş bike! Yek ji wan lehengan di van salên dawî de bû mijara fîlmekî! Derhêner berê kameraya xwe da zarokekî ku meşa wî ji ku û çawa ji ber çi sedemê dest pê kiriye! Fîlma Meş di bingeha xwede dibe meşa zarokekî Kurd û wê mîratê berdewam dike! Baş e lê çima zarokekî Kurd vê mîratê dispêre xwe û derdikeve vê meşê? Sedem çi ye fîlma Meş ji me re bi awayekî hunerî vegotiye! Îcar ezê niha derbas bim vegotina fîlm!

Demsal payiz e û sal jî 1980 ye û devera ku mijar lê dibe fîlm Nisêbîn e! Cengo xortekî nûgihayî ye! Bê dayik mezin bûye û xwişka wî ew spartiye xwe û jê re dêtî kiriye! Du birayên Cengo hene. Yek jê li pey doza Kurdistanê diçe û yê din jî dijberiya wî dike! Bavê Cengo jî zilamekî extiyar û di halê xwe de ye! Komek hevalê Cengo hene ku di bazara Nisêbînê de bi wan re kar dike û di bin Pira Alaman de carcaran kom dibin! Yildiz, Aso, Miho... di nav wan de Cengo dil daye Yildiza xweşik! Binê Pira Alaman devera wan zarokan e ku ji kar û barên jiyanê qut dibin û di wir de dîsa vedigerin zarokatiya xwe.

Cengo li kolan û bazarê Nisêbînê beniştan difiroşe! Ev kar di zarokatiya min de jî hebû. Ez bawer im hê jî berdewam dike. Zarok an solan boyax dikin an dendikên zebeşan difiroşin an jî tepsiyek şîranî li ser serê wan e û kolan bi kolan digerin. Cengo jî yek ji wan zarokan e ku debara xwe bi vî rengî dike. Rojekê li devê deriyê qonaxa hikumetê ya Nisêbînê Xelilo nas dike û bi vê naskirinê tekiliyeke dostane di navbera wan de çêdibe! Êdî Xelîlo û Cengo dibin heval û Cengo Xelîlo jî bi xwe re dibe qada zarokatiyê. Ev qad Xelîlo jî dispêre xwe! Xelîlo jî di ciwantiya xwe de li ber xwe da ye û ji aliyê dewletê ve hatiye girtin û îşkencekirin! Piştî zexta ku li ser wî tê kirin ew jî berteka xwe, berdewam dike lê belê îcar bi şêweya xwe! Xelîlo zilma ku li ser Kurd û zimanê Kurdî dibe bi rojiya xebernedanê protesto dike û êdî qet naxive! Her roj diçe devê deriyê qonaxa hikumetê û li wir dimeşe! Diçe û tê! Her çiqas berdine de,wî binçav bikin, lêdin jî ew dev ji çûnûhatina xwe bernade. Weke ku bêje hûn çi jî ji min bikin ev der ya min e! Hûn li vir dagirker in! Yên ku divê ji vir here ne ez im hûn in. Xelîlo mîna kesekî ku hişê xwe wenda kiriye tê dîtin! Tevgerên wî yên di civakê de ne weke yên herkesî ne! Ji ber wê jî civak dibêje ew dîn e! Lê bes Xelîlo ne dîn e. Ew qerekterekî protest e! Li devê deriyê qonaxa hikumetê şimaqekê li serbazê dewletê dide. Ev şimaq mirina wî nêztir dike. Li gor min ev şimaq jî dide xuyakirin ku Xelîlo di bingeha xwe de li hember van kirinan dagirtiye û xwe bi wê şimaqê rehet kiriye.

Ez dîsa vegerim ser Cengo! Di 12ê îlona sala 1980î de li Tirkiye darbeya leşkerî pêk tê û êdî zilma îqtîdarê ya li ser Kurdan ji destên rêvebirên siyasî dikeve destên rêvebirên leşkerî. Bi vê guhartinê re asta zilmê bilintir dibe. Hebûna Kurdan bi her awayî tê înkar kirin. Yên ku qala Kurd û Kurdistanê dikin bedelê bi canê xwe didin. Ciwan û zanayên Kurd di şevekê de têne topkirin û di zindanan de bi awayekî wehşî tên îşkencekirin! Zimanê Kurdî tê qedexe kirin û kesên ku bi Kurdî diaxivin tên cezakirin! Darbeya lêşkerî zilma xwe di her maleke Kurdan de dide hîs kirin û rêya berxwedan û serhildana Kurdan jî zûtir dike û hewcetiya wê dide ber çavan.



Cengo jî ji vê zilma dewletê para xwe digire! Di serî de birayê Cengo ji ber zilma dewletê tevlî wê meşa dûr û dirêj dibe û berê xwe dide çiyayên Kurdistanê. Bavê wî ji ber ku bi Kurdî diaxivî û kurê wî berxwedêrekî bajêr e (Salih) di sergirtina malê de tê qetilkirin. Yildiz a ku Cengo jê hez dikir ji ber zilma dewletê dîsa neçar dimînin û bi malbatî koçî metropolan dikin. Şoqa dawî ya ku Cengo jiya jî mirina Xelîlo ya di quluba wî de bû. Pêlek zilma dewletê di nava saetan de jiyana Cengo tarûmar dike.

Zilma ku li serê Cengo û derdora wî tê kirin rêya meşa Cengo jî vedike. Zarokek ku di kolanên Nisêbînê de li pey jiyana xwe digere, hewl dide bijî, hezkiriyekê çêdike û dostaniyan dideyne. Bi gotina herî hêsan dixwaze bijî. Lê belê bûyerên ku li der û dora wî diqewimin ji rihê zarokatiya wî re zêde tên. Di wî emrî de tiştên giran dijî. Hemû heval û endamên malbata xwe wenda dike. Bi tenê tê hiştin. Rihê zaroktiya wî tê perçekirin. Darbeya leşkerî mîna panzerekê di ser jiyana wî re diçe û dixwaze Cengo têk bibe û kesên ku di meşa Cengo de dest bi rêwitiyê dike yek bi yek wenda bike. Lê belê bi ser nakeve.

Fîlm bi lêv kirina navê Cengo dest pê dike. Bûyerên fîlm hemû li derdora Cengo diqewimin. Çîrok di serî de bi awayekî rehet diçe. Em yek bi yek qerekterên xwe nas dikin. Dever dema îro ye lê bele cil û berg û devera çêkirî me di nava fîlm de zemt dike û me dibe dema qewimandine bûyerê. Piştî ku fîlm digihîje astekê êdî dema pevçûnê tê. Pêşî Xelîlo bala Cengo dikeşîne. Cengo hewldide wî nas bike pê re hevaltiyê deyne lê Xelîlo sekna xwe ya protest berdewam dike. Cengo hinekî ber xwe dide û Xelîlo dide dûv xwe. Dibe ku Xelîlo jî bêriya zarokatiya xwe kiribe. Pevçûna duyemîn di navbera Cengo û dewletê de diqewime. Pevçûna esasî ev e. Mirov dikare wisa bixwêne ku Cengo di vir de temsîla Kurdan dike. Dewlet bi her awayî êrîşî Cengo dike û dixwaze wî tune bike. Bav, bira, heval, dost çiyê Cengo hebe dibe hedef ji wan re. Di rihê zarokekî de dixwazin hêviyên gelekî pûç bikin, lê bes serê wan li textekî hişk dikeve. Cengo wî rihê zaroktî dike dareke berûyê û di orta Kurdistan de datîne. Ew dar çiqas were şewitandin, were qut kirin, bê av jî bimîne dîsa şîn dibe!

Bêgûman ji ber ku fîlm qala 12ê îlonê dike, dibe ku ji aliyê hin kesan ve asta çîrokê kêm hatibe dîtin. Yanî ew wehşeta 12ê îlonê di fîlm de bi awayekî vekirî nehatibe vegotin û ev bûbe sedema rexneyê. Lê bes mesele ne ew e ku her tişt bi awayekî vekirî were vegotin. Rast e çîroka fîlm di 12ê îlonê de derbas dibe. Gelek serpêhatî hene ku divê fîlmê wan werin çêkirin, her yek ji yê din biêştir û hêjatir e. Lê belê li gor min divê derhêner û senarist asta wehşeta ku dewlete li ser Kurdan kiriye ne bi awayekî propagandî lê bes bi awayekî hunerî vebêjin. Di beşên hunerê de vegotina herî hêsan zimanê propagandî ye. Hunermendên ku xwe ji vî zimanî xilas kir û nêrîneke hunerî zimanekî hunerî afirand bê gûman wê demê tekiliya xwe û gel jî di bingeheke zexm de saz dike û bi ser dikeve. Çîroka fîlm ne tiştekî ku di 12ê îlonê de nehatiye jiyandin berovajî vê serpêhatiyên bi rengî pir in û divê bibin fîlm. Li gor min bijartina çîroka fîlm jî û bi her awayî vegotina fîlm li gor van esasên jor pêk hatiye û fîlm serkeftî derketiye! Şêweya fîlm ne sloganîk e lê bes fîlm di bingeha xwe de peyamên rastiyeke bi dîmen û diyalogên zana digihîjîne me.

Li gor min şêweya fîlm hilbijartina çîrokê û çêkirina senaroyeyê di fîlm de baş hatiye honandin! Fîlm li gor çîrokê dest pê dike weke ku me amadeyî cenga Cengo bike. Di serî de em li navçeyeke Kurdistanê ne her tişt di rê de xuya dike lê hêdî hêdî çîrok me dike nava xwe û bûyerên ku diqewimin me ji serê fîlm qut nake jê zêdetir me bi fîlm ve girê dide. Cengo kî bû? Cengo çi dikir? Evqas tişt çima hatin serê Cengo? Kê rê ya çiyayên Kurdistanê ji Cengo re vekir? Kî bû sedema kuştina rihê zarokatiya Cengo? Fîlm li gorî xwe bersivekê dide van pirsan û me di nav bersivan de bi pirsên nû re dihêle. Cengo kî bû? Kê ewqas zirar da giyana Cengo ku îro ne bi me re ye. Her bersiv pirseke din çêdike û em jî bê Cengoyan mîrateya ku ji bav û kalan ma ye mîna barê Sisifos ji ser pişta Cengoyekî didin yê din.

> Cengo li kolan û bazara Nisêbînê beniştan difiroşe! Ev kar di zarokatiya min de jî hebû. Ez bawer im hê jî berdewam dike. Zarok an solan boyax dikin an dendikên zebeşan difiroşin an jî tepsîyek şîranî li ser serê wan e û kolan bi kolan digerin. Cengo jî yek ji wan zarokan e ku debara xwe bi vî rengî dike.

# Xewna herî dirêj; awêneya Tarkovsky

MARÎA AYAZ



''Dema tu kesî tuneye ku bisekine û li tiştên tenik bifikire... ''
Gülten AKIN*

Fîlmê Andrei Tarkovsky Awêne, di dîroka sînemaya cîhanê de cihekî girîng digre. Gelek klîşeyên sînemaya helbestî bi sînematografiya Andrei Tarkovsky dest pê kiriye.

Tarkovsky berî her tiştî, kurê bavekî şair e. Bavê wî helbestvanê ûris Arseni Tarkovsky ye. Genetîk û çanda helbestê ji bavê xwe stendiye. Ji ber wilo, ew bandor xwe di fîlmên wî de nîşan dide.

Fîlmekî ku ji rexneyê re zêde vekirî û di heman demê de jî zêde girtiye Awêneya Tarkovsky.

Goethe dibêje ku; 'Berhemek çiqasî dur be ji rexneyê re, ewqasî bi qîmet e.'

Awêne, ji xewn û dîmenên di binhişê Tarkovsky de pêk tên. Yanî dîrektor zarokatiya xwe nîşanî me dide di perdeya spî de...

Fîlm bi dîmenekî ji xwezayî dest pê dike. Li bexçeyekî li ser kevîka hejikê hewşê runiştî, jineke boz û xweşik, cixare di destê wê de, li asoyê dinêre. Ji dur ve mêrek tê. Mêrikê ku çenteyekî piçuk di destê wî de ye bi jinê re diaxive. Ji jinê cixareyekê dixwazê. Mêr jî li ser hejikê hewşê rudine. Ji nişkê ve dar dişke. Herdu dikevin 'erdê. Bi hev dikenin...

Di pirtuka xwe ya bi navê 'Dema Mohrkirî' de Tarkovsky qala pêvajoya çêkirina fîlmên xwe dike. Dema qala fîlmê xwe Awêne dike, ew bi xwe jî nikare bi temamî vebêje naveroka fîlm. Ji ber ku ew, fîlmê xwe bi ruhekî cuda kişandiye. Bi dîmenan helbestek nivîsandiye û ez bawer im ji wî pê ve tu kes nikare têbigihîje...

Em dikarin bibêjin ku Tarkovsky ev fîlm ji bo xwe, dayika xwe û bavê xwe kişandiye û temaşevan, ji qewlê Laura Mulvey wan rontgen dikin...

Binhişê Tarkovsky binhişekî pak e. Li wir, demên di temenê wî de yên herî bi bandor di dema zarokatiya wî de diqewimin. Bavê wî, wî û dayika wî diterikîne diçe leşkeriyê. Serbazekî di artêşa ûris de ye bavê wî. (Şairekî leşker...)

Piştî çûna bavê wî, ew û dayika xwe tenê dimînin. Ew demên wî û dayika wî em dibînin di fîlm de. Di fona fîlm de jî gelemperî helbestên bavê wî em dibihîzin ji dengê Tarkovsky.

Helbestên bavê wî gelekî girtî ne mîna fîlmên kurê wî. Helbestên pir zelal in lê dîsa jî mirov hîs dike ku tiştine sergirtî di pişt wan de hene. Di navbera dê, bav û lawik de...

Tarkovsky ji xirecir, tevlihevî û keft û leftê zêde aciz e. Ev acizî di hemû fîlmên xwe de vegotiye. Ji mirovan re, bi dîmenên xwe dibêje ku; 'Bisekine, ev çi lez e? Hinekî li xwezayê, li der û dora xwe meyzêne. Bisekine. Jixwe dinya li dora xwe, li dora te digere. Meyzêne ev şibake ye, ev perde ye, ev ba ye, ev kulîlk e. Ev kulîlka beybûn e ewa din gûl e. Ev gûl pembe ye...'

Tu lezgîniya Tarkovsky tune ye. Jiyanê hêdî hêdî dijî. Mîna bavê xwe, ristik ristik dibîne hemû bûneweran. Pisporê hûrgûliya ye.

Di fîlmê Awêne de Tarkovsky, mîlîtarîzm, şerê cîhanê yê duyem û rewşa Rûsya, ya demên şer jî vegotiye. Leşkerên zarok, westiyayî, bêhêvî mayî û maxlub...

Tarkovsky ji mekanên xirbe, wêran û deforme hez dike. Di fîlmê xwe Awêne de gelek mekanên wilo bikaranîne. Di nava daristaneke dor vekirî de, li maleke bi textikan, bi dîmenên mîna tabloyên Van Gogh fîlmek kişandiye.

Xweza û mirov bi hev re dilîzin di fîlm de. Tarkovsky, xwezayê jî mîna lehengekê dibîne. Pelek ji darê weşiyayî, bîrek, kûlîlkek jî dikare bibe lehengeke Tarkovsky.

Tarkovsky di pirtuka xwe ya bi navê 'Dema Mohrkirî' de dibêje ku, divê ramaneke tevlihev û felsefeyeke helbestî qet ewqasî hêsan neye vegotin. Divê sergirtî be. Vegotineke sergirtî...

Engels dibêje; 'Fikrên nivîskarekî çiqasî veşartî bin, ji bo hûnerê ewqasî baş e.'

Dibêje ku; 'Dema ku carekê ji hev fêm kiribe du mirovan, ew herdu mirov heta hetayê wê karibin ji hev fêm bikin.'

Di fîlmê Awêne de, sereke-leheng qet xuya nake. Lê bi dîmenên ku em dibînin û bi helbestên ku têne xwendin em leheng nas dikin. Em dikarin di derbarê leheng de têbigihîjin hinek rastiyan... Leheng Tarkovsky bi xwe ye. Car caran bi dayika xwe re bi telefonê diaxive, qala demên bihurî dike. Car caran jî qala nuanseke ji zarokatiya xwe dikî. Tiştina dipirse ji dayika xwe.

Li gorî Tarkovsky mirov, ev çar hezar sal in ku hînî tu tiştî nebûne. Çar hezar sal in ku ji sirra jiyanê bêhay in. Ji wateya hebûna xwe bêhay in.

Andrei Tarkovsky, ji edebiyatê pir hez dike. Bingeheke wî ya fireh heye. Ji Goethe, Herman Hesse û Marcel Proust pir hez dike.

Têkiliya Proust ya bi dapîra wî re û têkiliya Tarkovsky û dayika wî dişibe hevdu.

Ji dîrektoran jî, ji Luis Bunuel hez dike. Di fîlmên derhênerê îspanî Bunuel de jî wateyeke girtî, vegotineke sergirtî û surrealîzm heye. Xewn hene... di heman demê de jî rexneyeke veşartî ya di derbarê kapîtalîzmê de heye.

Di fîlmê xwe Awêne de Tarkovsky, helbest, wêne, edebiyat, felsefe, psîkolojî û gelek mijarên din bi hev re, helbestek ji dîmenan hûna ye. Helbesteke dirêj...

# “Xwezeya Dêrsimê ji bo mêşvaniyê gelekî guncaw e”

BERFO GILÎDAX

Bajarê Dêrsimê bi xwezaya xwe ya cure giha, kulîlk, gelî, çem û çiyayên xwe ve tê zanîn. Helbet di nav xwezayeke wisa de pêkanîna hin karan zêdetir pêkan e û yek ji van jî mêşvanî ye. Li Dêrsimê bi salan e mêşvanî tê kirin û hingivê parzûnkirî, pêtek û hingivê qovana reş çêdibe. Murat Kaçarê ku him mêşvaniyê him jî firotina hingiv dike ji Heftenameya Basê re di derbarê mêşvaniya Dêrsimê de axivî.

**“Bi salan e li Dêrsimê mêşvanî tê kirin”**

Murat Kaçar ewilî dibêje li bajarên Erzîrom, Erzîngan, Sêwas, Dêrsim, Wan, Colemêrg, Bedlîs, Çewlîg û Sêrt li van cihan mêşvanî tê kirin û bi taybet jî hingivê kulîlkên herî bi qelîte li van deran çêdibe. Ji ber ku him xwezaya van deveran gelekî dewlemend e him jî şert û mercên avûhewayê bo çêbûna hingivê pêkan e. Deverên din ku ger hingivê kulîlkan çêbibe jî bi qasî hingivê li van bajaran resen û bi tahm çênabe. Li Dêrsîmê jî hema 70-100 sal heye ku mêşvanî tê kirin û heta her deverê vî bajarî hema piraniya şêniyên Dêrsîmê ji berê ve an ji bo malbata xwe an jî bo bazirganiyê mêşvaniyê dikin û Kaçar wiha pê de diçe, “ Xwezeya Dêrsimê bo çêkirina hingiv gelekî pêkan e. Mezinên me behs dikirin 30-40 sal berê hema hemû Dêrsimiyan qovanên hingiv datanîn -hê jî wisa ne - û piştî ku hingiv çêdibû wek diyarî didan dost û hevalên xwe heta hingiv bi peretî nedihat firotin û çend kîlo jî ji xwe re hildidan û tahma vê hingivê gelekî rind bû.



Dêrsim bi xwezaya xwe ya cure giha, kulîlk, gelî, çem û çiyayên xwe ve tê zanîn û li vî bajarî bi salan e mêşvanî tê kirin. Mêşvan û firoşkarê hingiv Murat Kaçar dibêje, “Li hember navê Dêrsimê pêşdarazî heye ev yek bandorê li bazar û firotina hingivê me jî dike û em zehmetiyê dikişînin da ku xwe bigihînin bikirên derveyî Dêrsimê”

Wekî din ne pêkan e ku ev hingivên 30-40 sal berê niha hebe. Çima wisa dibêjim, çimkî şert û merc guherîne û teknolojî pêş de diçe û mirov bêhtir mudaxeleya çêkirina hingiv dikin. Ji aliyêkî ve xweza jî diguhere ji ber tevgerên mirovan. Lê li Dersîmê ev 10-15 salên dawî bazirganiya hingiv zêde bûye.”

**“Mêş di mehên navbera Hezîran û Tebaxê de hingiv çêdikin”**

Kaçar di derbarê wextê hilberîna hingiv de van agahiyan dide, “Hilberîna zêde ya mêşan di mehên serî an nava meha hezîranê de dest pê dike û heta meha tebaxê hingiv çêdibe. Di van mehan de him şert û mercên xwezayê gelek musaîd e him jî mêş zêdetir digerin. Di dema meha nîsanê de şekir û tiştên din didin mêşan lê êdi divê ji vê mehê şûn de tiştekî nedin mêşan. Vê usûlê kesên ku dixwazin hingivên xwezayî çêbikin dikin lê yên din heta meha Gulan, Hezîran û heta meha Tîrmehê jî şekir didin. Bi vî awayî mêş giran dibin û naxwazin bigerin û mêş hema li derdorê rûdinin û hingiv çêdikin. Yanî rêjeya şekirdayîna mêşan girîng e ger zêde bidî ev zirar e lê heta rêjeyekî kêm şekir beriya hilberîna hingivê tê dayîn yanî heta Nisanê di rêjeya sedî 5-10 de şekir dikarin bidin.”

**“Mêş heywanên hesas in û eleqeyê dixwazin”**

Mêşvan û firoşkarê hingiv Kaçar, li ser lênêrîna mêşan jî wiha diaxive, “Mêş ajalên hesas in eleqeyeke baş dixwazin. Li Dêrsîmê zivistan bo mêşan zehmet derbas dibe hin mêşvan mêşên xwe li Dêrsîm û Xarput/ Elazîzê mihefeza dikin. Ji bo ku mêşan ji sir û seqema zivistanê mihefeze bikin wan dixin ciyên taybet û heta sobe jî vêdixin. Hin mêşvan şekir didin mêşan hin mêşvanên din jî bermayiyên hingivan didin mêşan. Wekî din hin mêşvan jî bo zivistanê mêşên xwe di mehên Îlon û Cotmehê de hildidin dibin herêma Behra Spî çimkî zivistana li wir hişk derbas nabe, demsal germ e. Ji aliyê din ve jî ger ziwayî û bayên hişk hebe ev yek jî bandoreke neyînî li ser mêşan çêdike û mêş nikarin wê demê hingiv çêbikin.”

## “Li Dêrsimê hingivê parzûnî, yê pêtek û qovana reş çêdibe”

Kaçar diyar dike ku hingiv di meha Tebaxê de tê berhevkirin û ya rast hingiv çiqas bisekine evqas rind dibe. Herî dereng di dawiya meha Îlonê de hingiv tê berhev kirin. Mêşvan hingivên xwe ambalaj dikin û li cihekî mihefeza dikin bo firotinê û Kaçar wiha behsa cureya hingivên ku li Dêrsimê çêdibe dike, “Sê cure hingiv li Dêrsimê çêdibin û hingivê parzûnî, yê pêtek û hingivê qovana reş. Yê herî bi qelîte jî hingivê qovana reş e. Hingivê parzunî makîneya wê heye bi vî makîneyê hingiv didarive û li vir zêdetir hingivê perçebûyî, şikestî, xwarbûyî, tê darivandin. Wekî din cureya hingivê pêtek jî ji xwe pêteke kovanê ye û yên sixlam tên rakirin. Divê li vir tiştekî bibêjim bi rastî tu cudahiya hingivê pêtek û yê parzûnî tune ye hema hema mîna hev in. Herî dawî cureya hingivê qovana reş heye û di vê cure hingivê de tu madeyeke din tune ye. Di çêkirina vê hingivê de mêş zêdetir li xwezayê digerin û hinek jî li gor hingivên din di wexteke dirêj de çêdibin. Ji ber qelîteya van her sê hingivan bihayê van jî cuda dibe. Li Dêrsimê bihayên hingivên parzûnî û yê pêtek di navbera 70-90 lîreyî de ye. Ji ber ku hingivê qovana reş gelekî bi qelîte ye ji loma hinekî din biha ye û di nabeyna 200-300 lîreyî de tê firotin. Vî cure hingivî bi taybet bo zarokan, kal û pîran û kesên nexweş pêşniyaz dikin.” Murad Kaçar balê dikişîne û dibêje li hember navê Dêrsîmê pêşdarazî heye û ev yek jî bandorê li firotin û bazara hingivê Dêrsimê dike û Kaçar wiha pê de diçe, “Li hember navê Dêrsimê pêşdarazî heye ji loma em zehmetî dikişînin xwe bigihînin kiryarên derveyî Dêrsimê û nikarin reklama hingivê xwe jî baş bikin.“

---

# Li Kurdistanê demsala dims û bastêq e

BILAL ADLIĞ

Bi hatina Payîzê dema dermankirin û çêkirina bastêq û benî û dimsê ye. Gelek cûreyên tirî li devera Mêrdînê digihîjin û her yek ji van cûreyan jî xwedî taybetmendiyek û tameke cuda ne. Tiriyê herî şêrîn yê cûreyê Mezrone ye. Ji tiriyê mezrone bi giştî dims, bastêq, benî û şerab tên çêkirin. Di vê hejmarê de me berê xwe da devera Omeriyan a Mêrdînê û em bi cotkarên hilberandina benî, bastêq û dimsê re li ser kar û barên wan axivîn. Hecî Ehmedê Omerî ji Basê re çîroka amadekirina van xwarinan dike û wiha dibêje: “Dims, li her devera Kurdistanê tê çêkirin lê ya herî baş a Omeriyan e. Ji nexweşînê bigirin ta qewetê hûn dikarin di hemû deman de vexwin.”

“Dimsa Omeriyan derman e”

Hecî Ehmedê Omeriyan dibêje hatina ser mehsereyan ji bo me weke çandeke dîrokî ye û wiha direjîyê dide gotinên xwe: “Hatina ser mehsereyan ji bo me wek çandekê ye, her çend karê rez û tirî ji bo me zehmet be jî, kêfa wê jî heye û gundên me di vê demê de dibin cihên seyranê. Cûreyên tiriyên me zêde ne, lê ev dem dema ‘mezroneyê’ ye ku ew tiriyê me yê herî bi nav û deng e, em ê qederê mehek an jî mehek û nîv li vê derê bin û bi tiriyê mezrone bastêq, dims û beniyan çêbikin.”

“Bastêq û dimsê me navdar e”

Tiriyê mezrone ye ku jê bastêq, benî tê çêkirin, cotkarên Kurd heta mehek li ser mehsereyên xwe ne, lewra ew serê salekê ye li benda van rojan in, ku amadekariya firotina hilberînên xwe bikin, hinek ji wan ji bo hewcedariya zivistanê ji bo xwe çêdikin, eger zêde man jî cotkar dibin nav bazara Mêrdînê difroşin. Ji bilî bastêq û beniyan li herêma Omeriyan di vê demê de dims jî tê çêkirin, gundiyên Omerî dibêjin ku dims li hemû deverên Kurdistanê tête çêkirin, lê dims wekî dimsê Omeriyan ji ya her deverî xweştir e.. Di Kurdistanê de dimsê herî xweş dimsê Omeriyan e, ew hem ji tiriyê me, hem jî ji axa me ye, dims ji bo tendirustiya mirovan jî gelek baş e, zivistanê ew kesên ku kevçiyek dimsê me vexwe tu carî ew nacemide û dimsê me herikandina xwînê jî baş dike.”

“Cûreyên tiriyên me zêde ne, lê ev dem dema ‘mezroneyê’ ye ku ew tiriyê me yê herî bi nav û deng e, em ê qederê mehek an jî mehek û nîv li vê derê bin û bi tiriyê mezrone bastêq, dims û beniyan çêbikin.”

## Bastêq ber bi Ewropa ve jî diçe

Herwiha cotkar Xelîl Berbang, ji me re dibêje, “Em, benî û bastêqên xwe difiroşin heta Swêdê û Ewropa jî. Bastêq û beniyên me gelekî navdar in û em ji bilî Mêrdîn û der û dorên xwe mahsûlên xwe difiroşin Stenbol, Îzmîr û welatên Ewropa jî.”



---

# Biharê bacanên sor payîzê silqok

DARA BANDÎNÎ

Welatê me ji bo hilberandina sewze û fêkiyan pir dewlemend e. Di çar demsalên salê de mirov dikare çandiniyê bike û debara xwe pê bike. Her heftiyê mijareke li ser cotkariya bajarên Kurdan cihê xwe di rojnameya me de digire. Vê heftiyê jî em li devera deşta Dîcleyê bûn û em ligel cotkarên baxçeyên Hevselê li ser kar û barên wan axivîn. Deşta Dîcleyê dikeve Rojhilatê Diyarbekir û bi dar û baxçeyên xwe bala geştiyaran jî dikişîne. Di payîzan de rengê xwezayê dispêre xwe û ji bo kesên diçin wê deverê dibe cihê şanaziyê.

**“Salê du caran hildiberînin”**

Cotkar Mehmet Salih ji Sûra Diyarbekirê ye ku di şer û pevçûnan de mala wî jî hatibû hilweşandin. Mehmet Salih û dozdeh endamên malbata xwe ji Sûrê koç kiriye û berê xwe daye gundekî aliyê Erxanî. Mehmet Salih dibêje; “Berê rewşa me ya aborî gelekî baş bû, ez tevlî du kurê xwe û keçên xwe me karê hilberandina cotkariyê dikir. Niha ji ber hilweşandina malên me em ketine kirê û her diçe rewşa me ya aborî têk diçe. Ji neçariyê em 6 kes di vî karî de dixebitin û wiha didomîne: “Bi destpêka biharê em li baxçeyên hevselê îsot, bacan û bacanên sor dajon. Piştî serma tê û êdî bacan û îsot hew berheman didin em dest bi çandina siqok, bexdanûz, tûzikê dikin. Welatê me ji bo hilberandinê gelekî xwedî derfet e lê ji ber ku rewşa siyasî ne baş e mixabin karên me jî ne li gor dilê me diçin.”

**“Ne ji îcarê bûya rewş ne xirab bû”**

Mehmet Salih dibêje, eger axa mirov be dîsa karekî baş e lê dema tu îcare dikî ji xwe tu piraniya dahata xwe didî wê îcarê û axaftina xwe wiha didomîne: “Ji bo em bikaribin çandiniyê bikin divê em erdê xelkê îcare bikin. Îcarekirin jî ne hêsane îro. Em ji neçariyê van karan dikin ji ber ku karekî din ji destên me nayê. Weke ku min got eger dewlet piştgiriya van hilberandinan bike wê bi awayekî hêsanî em ê bikaribin van cûre xwarinan bifiroş in derveyî welêt jî.”

## “Mirov bikaribe xizmeta axê bike, ax berhemdêr e”

Mehmet Salih ji me re qala firotina berhemên xwe dike û pê de diçe: “Em berhemên xwe didin hev û dibin bazar û xwaringehan bi xwe difiroşin. Rojane sed, sed û pêncî kîlo em silqokê berhev dikin û difiroşin. Kîloya silqokê li bazarê bi giştî yek lîreyî diçe. Roqa û tivir hê derneketine. Bi rastî eger mirov bikaribe xizmeta axê bike, ax ji bo mirov berhemdêr e. Dema tivir û roka jî bigihîje wê ji bo me çêtir be. Wê demê jî ji Mersîn, Edene û deverên din ev berhem tên Diyarbekir û bazarê erzantir dikin. Lê belê êdî ez extiyar bûme û zarokên min jî naxwazin vî karî bikin. Em niha 6 kes di vî karî de dixebitin. Bifikirin ku rojê 6 kes di cihekî de dixebitin û tenê 150 lîre pere kar dike. Du zarokên min zewicî ne. Em tev di kirê de ne. Eger Sûr ne hatibûna rûxandin niha em di malên xwe de bûn û wisa hejar nedibûn. ”

“Berê rewşa me ya aborî gelekî baş bû, ez û du kurê xwe û keçên xwe me karê hilberandina cotkariyê dikir. Niha ji ber hilweşandina malên me em ketine kirê û her diçe rewşa me ya aborî têk diçe.”



# Çekuyî Beyaxkîyî

SEZGÎN FIRAT

No wendegeho hîrê qatin, bi hewşê xo yo teng, bi rengê dêsanê xo yo gewr, serê dêsan de bi perçîno asinên, merdim ke dûrî ra biewnîyo ci ra û nêzano wendegeh o, sey hepîsxane aseno. Sinifê xo têkaleke de rez bîyê. Kel-melê ke teder ê seke seba domanan nê seba hepsîyanê ameyoxî tede ca bîye. Tîya de çîyê ke hewcedarîya xo esta sewbîna yê. Sinifanê nê wendegehî de tebeşîrî mêbê problem nîyo. Kursîyê ke wendekarî ser o ronîşenê mêbê tede xeletîye çin a. Lingî, qorrî seba kamcî rojan estê vanê û vîyarenê şonê. Sinife de mamostayê kî mêbo tebaye nêbeno. Sermamostayê sinifê ha yo serê texteyê sipîyî de ewnîyeno wendekaran ra. Bê ey derse dest pênêkena. Berqestî ra yew mufetîş game bierzo zerre, verê verkan çimî ginenê serê texteyê sipîyî ro. Eke ê hîrê çerçeweyî cayê xo der ê, mufetîşî ra gore her çî hazir û nazir o. Neke cayê xo de mêbê endî ne mamostayîya xirabe ya malimanê sinife manena ne bêrêzdarîya înan.

Wendekaro newe ke sifte game erzeno nê wendegehî tersê xo, yê wendekaranê pîlan ra zedêyêr beno. Tayê pilosînê pêşê maya xo ra, tayê xo kenê berz danê erdî ro, tayê mize verdanê xo ser ke ma û pîyî, înan nê cayê xeribî de ca mêverdê. Endî beno hayleme. Vengê bermayîşê wendekaranê neweyan, dêsanê hewşî de zimayeno. Wendekarî ke zanenê destî ra çîyê nêno, birûy ancenê pêser, lewan verdanê ro, bêzerrî ver bi sinifa xo şonê. Wext ke vîyareno tersê nê wendekaran nîşeno la herînda nê tersî de pozxinîye zîl dana.

Roşan serra ke ma û pîyî bi kalikî ra koç kerd, amayê hîna hewt serrê xo de nêbîbî. Ganî serra bîne do bişîyêne wendegeh. Keye de qala wendegehî ke bîyêne gupayîşê zerrîya Roşanî zedîyêne. Ge-ge pîyî ci rê sûke ra kitabî ardêne ke wa waştişê wendişî yê lajê xo bizedîyo. Roşanî kitabî girewtêne xo dest yew bi yew ewnîyayêne pelanê kitaban ra, qeleme girewtêne û cerebnêne ke binuso. Tayê wextan de kî bi çuye erd kendêne û kerdêne ke herfan xêz bikero.

Roşan hetê embazan ra, bextê xo ra qayîl nêbî. Zaf reyan vazdayêne bi maye het, bi pêşê maya xo xirnika xo kerdêne pak û hesirî ardêne war.

-Dakîle, vatêne, nê domanê cîrananê ma yê neweyan qey pê qiseykerdena mi kay kenê?

Maye virane fîştêne lajê xo ra

-Tebayê nêbeno, biko. Şima embazê yewbînan ê. Rojê ti zî ziwanê înan museni,

Vatêne û peyser erşawitêne leyê embazan.

Roşan, roşna çimanê înanê keyeyî bî. Hela ke seba kalikê xo. Maye ke kewte ra Roşan ard, kalikî xebere erşawitibî verekwanê dewe ra, vereke serebirnaybî. Ewro roşanê ma yo, vatibî. Aye ra pîyî name Roşan nabî pa.

Kalikî ge-ge ewnîyayêne tornê xo ra û wina vatêne

-Tamara pîyê mi tede esta. Pîyê mi alîm bî. No kî sey pîyê kalikê xo beno merdimo muhîm.

Ey qelema ke pîye xo ra yadîgar mendbî, Roşanî rê dardibî we. Key ke bî pîl û şî wendegeh yê ey biba vatibî.

A roje rew amaybî. Roşan şodir her kesî ra ver hîşyar bibî. Serê aşme de ma û pîyî o berdibî qeyd kerdibî. Înan eynî roje çîyê ke luzimîya xo esta sûke ra herînaybî.

Qelemî, defterî, pakkerî, şapikî,işlege, çente, sole neweyî....

Maye hetêk ra pîyî hetêk ra dest pê girewtibî, kewtibî raya wendegehî. Bi gamanê hîrayan şîbî. Sey heme wendekaranê bînan Roşanî berê caxlemeyî ra game eşte bi zerre, çimî fetilnay. Hewş bibî pirrê wendekaran. Sey heme serranê viyarteyan tayêne pilosîyaybî pêşanê mayanê xo ra, tayêne xo kerdêne berz dayêne erdî ro. Roşanî şope ma û pîyî xo ra nîyada û destê xo xelisna ra şî dora ke wendekarî teder ê. Maya Roşanî lew na çare ra û

-Daye qida, mêtersê!..Sey vatena mamostayê xo bike, va û hetê peyê dore şîye. Leyê merdeyê xo de tîk vinete.

Game ra tepîya yew mamostayo dergo porkejo rîhuyayîşin çepê Roşanî de vejîya.

-Hoş geldin Roşan, va û destê xo berd sereyê Roşanî û mîşt da.

Roşanî hayret mend ke mamostayî nameye ey se zana. Sereyê xo berz kerd û di çekuyî tirkî fekî ra perra.



-Xoş buldum...

Roşan hem bandarê embazanê xo yê neweyan hemî kî banderê mamostayê bibî. Ge-ge embazanê wendegehî sey embazanê taxe henêkanê xo bi ziwanê Roşanî kerdêne kî ey qet goş nêdayêne ci. La yê mamostayî pê tinaz kerdiş ra sewbîna bî.

Roşan rew musayêne. Çi persê mamostayê bibê, desinde bêçike dardêne we, cewabê persan dayêne.Roşano biaqilo rewmusayox... Mamostayî ra gore têna yew qusurê Roşanî bibî. Ey no qusur maya Roşanî ra wina tarif kerdibî. Ge-gane ziwan mêçarno kurdkî ser dahîna baş beno. Tey tirkî qisey bikerî...

Mamostayê Roşanî çekuyanê ey 'çekuyê beyaxkîyî'* name kerdibî. Sinife de sewbîna ziwan qisey kerdiş qedexe bîye. Neke fekê wendekaran ra yew 'çekuya beyaxkîye' bivejîyo, tenefuse dest ra şîyêne. Zengil ke dayêne piro înanê ke 'çekuyê beyaxkîyî' şuxulnay sinife de mendêne êyê bînî vazdayêne bi hewşî. Eke rojê de hîrê çukeyan ra zede çekuyî fekan ra biperrê, endî hetan dersa peyêne hewş bîyêne qedexe. Ge-gane kî yew linge ser o vindertiş bîyêne cezaya wendekaran.

Sinife de bi Roşanî û hîrê embazanê ey ra têna çar wendekaran ziwanê Xizirî** zanayêne. Înanê bînan çekuyanê nê çar embazan ra qet çîyê fehm nêkerdêne.

Roşano belengaz... Nê çekuyanê beyaxkîyan ver tîje ra hesret mendibî. Her roja Heqî de di-hîrê seatî ke bêtenefuse vîyartêne endî mîze zor dayêne Roşanî ra. Mîyanê derse de dest eştêne pizeyê senikî, ver bi masaya mamostayî şîyêne. Bi vengê xo yo şermayoxo nizm;

-Miza mi ame, örtmenim, vatêne. Mamostayî binê çiman ra ewnîyayêne ey ra û

-Doğrusunu söyleyene kadar göndermeyeceğim (Hetan ke ti rast mêvajî ez do to nêerşawê) vatêne. Endî bîyêne ax-uxê Roşanî. Ereqo serdin nîştêne pira, bi dest miyanê leqanê xo dawasnêne û leşa xo bîyêne di qat. Peynîye de rewşa xo bi tirkî mamostayî ra vatêne û îzna xo girewtêne. Mîze hende zor dayêne ci ke vazdayîş hete de bimano nêeşkêne game bierzo.

Hirê serrî wina derbaz bîy, şîy...Emser Roşan sinifa çarîne de waneno. Wendegehî rike kerde nêvurîya, Roşanî kî çekuyanê beyaxkîyan ra fek veranêda. Mamostayî ge eşt binê goşan ra, ge xebere erşawite ma û pîyî ra wa wendegehî het bêrê, teme kerd, qedexe kerd, la nêbî. Roşanî fek veranêda.

Rojeka sey ê bînan bîye. Mamostayî texteyê sipîyî de yew vateyê verênan nuşt û wendekaran ra waşt ke derheqê ci de yew paragraf binusê. Çimê Roşanî ge mamostayî ser ge texteyî sipîyî ser çerixîyay. Ey manaya ê vateyê verênanî ser o tayê fikirîya û qeleme girewte xo dest şîyês çekuyî beyaxkîyî têlewe de ardî pêser. Dima çekuyî hûmarîtî, çimî zeliqnay corî ra, hesab kerd û şîyês çekuyî kene panc rojî va û cayê xo ra werişt. Deftera xo berde serê masaya mamostayî de naye ro. Mamostayî ewnîya deftere ra seke fehm kerd ke cumleya Roşanî bi tirkî nîya perra ey ser û va

-Yabancı cümle yazmışsın (To cumleya beyaxkîye nuşta.)

Roşan gêra mamostayî ra û bi kirmanckî

-Cumleya mi de şîyês çekuyê beyaxkîyî estê. Ez qayîl a bi panc rojan mêşira tenefuse va.

Mîyanê seate de ma û pîyê Roşanî wendegehî de vejîyaybî. Mamostayî wayîrê çekuyanê beyaxkîyan ser de bîbî kom û teme kerdêne ke reyena çiyo winasî mêkero. Maya Roşanî kerd vileyê kalikê ro. O yo ke tey tirkî qisey nêkeno kalik o va hesîrî ardî war.

Înanê keyeyî ra xeyrcê kalikî kes cumleya Roşanî meraq nêkerd.

-To çi nuşt biko?

-Mamostayî yew vateyê verênan nuşt û mi kî çarna bi kirmanckî.

"Eke şima wazenê yew millet mîyan ra wedarîyo, her çîyî ra ver ziwanê ê milletî bikîşê."

* Beyaxkî: Yabancı

** Ziwanê Xizirî: Dêrsim, Gimgim û çend cayanê bînan de kirmanckî sey ziwanê Xizirî qebul beno.

# Kirmanckî de Yewna Xebata Akademîke

Binê banê Enstîtuyê Ziwananê Ganîyan yê Tirkîya yê Unîversîteya Artukluyî ya Mêrdînî de yewna xebata muhîme ya akademîke ameye qedênayene. Wendekarê Beşê ziwan û Kulturê Kurdan Veysel Yildizhanî xebata xo ya masterî Bi Tarîxê Nusîyayena Xo ya Tewr Kehene Çekuyê Kirmanckî (Zazakî) (1798-1903) qedênaye û çend rojî verî teslîmê enstîtuyî kerde.

Tezê Bi Tarîxê Nusîyayena Xo ya Tewr Kehene Çekuyê Kirmanckî (Zazakî) (1798-1903) metnanê tewr verênanê kirmanckî yê ke mabenê serranê 1798-1903î amade bîyê ser o virazîyayo. Çekuyê nê metnan verê mîyanê xo de çeku bi çeku sey ferhengêkê tirkî-kirmanckî rêz bîyê, het de tarîxî nusîyayena înan û çimeyê nuştekî yê her çekuye nusîyayo. Keso ke biewnîyo nê ferhengî ra, do tirkîya çekuye, wanîyayîşê çekuye, tarîxê tewr verên yê nusîyayîşê çekuye, çimeyê çekuye û formê orîjînal yê nusîyayîşê çekuye bivîno.

Na xebate de nêzdîyê 2000 çekuyê tirkî û vera her çekuya tirkî de zî goreyê çimeyan tewr tay çekuyêka kirmanckî ca girewto. Na xebate de nê çimeyan ra çekuyî estê: nuşteyê Sultan Efendî, Robert. G. Latham, Peter J. Lerch, Otto Blau, Ehmedê Xasî û Albert von Le Coq. Nê kesan ra Sultan Efendî û Ehmedê Xasî kirmanc ê û bi kirmanckî nuşto, ê bînî rûs, alman û îngilîz ê û qiseykerdişê yew kirmancî neql kerdê û nuştê.

Na xebata ke hetê Veysel Yildizhanî ra nêzdîyê di serrî û nêm de nusîyaya, bi şêwirmendîya M. Malmîsanijî amade bîye. Yildizhanî derheqê xebata xo de rojnameyê ma Basî rê qiseykerd û wina va: "Na xebate hem hetê fonolojîyê ziwanî ra hem zî hetê ferhengnasîya ziwanî ra seba cigêrayoxan çimeyêk a. Kurdkî de, hawayêko winasî de xebatêka yewin a. Hêvîya ma a ya ke na xebate sey kitabêk biweşanîyo û bireso meraqdar û cigêrayoxanê kirmanckî dest.


Seke yeno zanayîş, tezê tewr verên yê kirmanckî Folklorê Kirmancan Ser o bi ke hetê Nadîre Guntaş Aldatmaze ra Unîversîteya Artukluyî de amebî amadekerdene. Çend tezê masterî yê kirmanckî yê bînî yê ke wendekaranê na unîversîte amade kerdê û sey kitab weşanîyayê nê yê:


Nadîre Guntaş Aldatmaz, Folklorê Kirmancan Ser o, Weşanxaneyê Roşna, Dîyarbekir 2014, 248 r.

Seîd Veroj, Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancca: Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî (Hevberkirina Gramera Zazakî û Kurmancca: Dîyalket, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî), Weşanên Ava, Dîyarbakır, 2014, 312 r.

Bîlal Zîlan, Di Kitabê Muhemmedê Şêx Ensarî: "Raro Raşt" û "Me[illegible]lûmatê Dînîye" (Metn û Cigêrayîş), Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2017, 240

Pınar Yıldız, Mehelî û Kirmanckîya Înan, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2017, 176 r. [demo nêzdî de]





mardin artuklu üniversitesi

K. T.
Unîversîteya Artûklûyî ya Mêrdînî
Enstîtuyê Ziwananê Ganîyan yê Tirkîya
Şaxê Mayzanistê Ziwan û Kulturê Kurdan

Tezê Masterî

**BI TARÎXÊ NUSÎYAYENA XO YA TEWR KEHENE ÇEKUYÊ KIRMANCKÎ (ZAZAKÎ) (1798-1903)**

Veysel YILDIZHAN
13711042

Şêwirmend:
Mehmet TAYFUN



NADÎRE GUNTAŞ ALDATMAZ

## Şar, Senî Beno Milet?

Milet ke va gerek tayê çîyê hemparî (muşterkî) mabênê ê şarî de bibê ke merdim ci ra vajo "milet". Eke her kes gorê xo, goreyê dewa xo, gorê eşîra xo, goreyê suka xo hereket biko, o wext mabênê şarî de yew hemparîye nêvirazîna û merdim nêeşkeno ke ê şarî ra vajo "milet".

Serê na hemparîye de mi gore ziwan yeno. Zaf tebî yo ke fekê her mintiqa, fekê her eşîre, yê her dewe yewbinî nêgêno. Beno ke tayê dewanê yew mintiqa de, belkî zî mîyanê eşîran de fekî û dîyalektî cîya-cîya bê. No hal zaf mumkun o û henî yo zî. Ma vajîme Dêrsim de, ziwanê dewanê boverê çemî û yê naverê çemî cîya yo. Naverê çemî de û boverê çemî de na rey mîyanê eşîran de ferq esto. Mavajîme ziwanê eşîra wisivan û yê eşîra abasan mota mot sey yewbinî nîyo. Ancî qiseykerdişê eşîra qirxan û yê eşîra alan sey yewbinî nîyo. Înan ra zî vêrdîme ra, di dewê ke têleye der ê zî pê tayê çekuyanê yeybinî kay kenê. Êdî ez qalê ziwanê hetê Çewligî û yê hetê Dîyarbekirî zî nêkena. Çike seba dêrsimijan famkerdena ziwanê ê hetan dahîna problem o, dahîna zor û zehmet o. Çitur ke seba çewligijan û seba dîyarbekirijan famkerdena fekê Dêrsimî zor û zehmet o. Palîyîj û dêrsimîj eke zor nêkerê yewbinî qet fam nêkenê.

Nê yê ke vanê "şima ziwanê ma xeripnenê, kenê xirabe, ma, nê ziwanê nuştekî ra çîyê fam nêkenîme, no ziwan, ziwanê ma nîyo" qiseyê mi seba înan o. Ma vajîme ke şima ziwanê mintiqaya xo ra zaf hes kenê û nêwazenê ke bivurîyo, eke henî yo qisey bikerê, binusê, qeyd bikerê û xo vîrî ra mekerê. Ez zî qiseykerdişê mintiqaya xo ra zaf hes kena û sanikan û çîyanê bînan qeyd kena, nusena û qisey kena. Ez bi dêrsimijan yewbinî zaf weş fam kenîme. La gerek şar zî yewbinî fam biko. Kamcîn şar? Gerek şarê Dêrsimî qiseykerdişê şarê Palîyî, yê Palîyî zî qiseykerdişê şarê Dêrsimî fam bikero. Şima senî sey yew miletî yewbinî fam kenê? Şima ra tayê kesî, ziwanê xo ra "Dersimce" vano. Gorê şima "Bingölce", "Diyarbakırca", "Paluca", "Siverekçe" zî estê?

Ma vajîme ke kes pêşkarê ziwanê şima nêbî, henî sey "Dersimce", "Paluca" mend û qet ziwano nuştekî nêbî. Wa henî bo, wa henî bimano. Ma meşte bêro ke ê dêrsimîjî, palîyîjî, çewligijî merdî û domanî zî nêmusay û qisey nêkerd, o wext no ziwan nêmireno? Ma vajîme ke şima qeyd kerd û dard we. Rojê ê bantî zî nêpoyînê? Ma vajîme ke rojê no ziwan bî ziwanê perwerdeyî û wendekarî bi no ziwan perwerde bî. Şima goreyê bi kamcîn ziwan kenê! Bi "Dersîmce", "Bingölce"? "Siverekçe" yan … ?

Her kes mintiqaya xo de wa ziwanê xo bisevekno, qisey bikero, binuso la yew ziwano müşterek kî zî lazimo ke şar zî yewbinî fam bikero. Her cayê dinya de zî miletê dinya nîya kenê. Hama-hama her welat de fekî zaf ê la ziwanê çapemenîye yew o. Qet dûrî nê, verê çimanê xo de qaytê tirkî bîyîme. Tirkî de çend çeşît fekî estê. Êdî luzûm nêkeno ke ez her raye vaja. Keso ke Tirkîya de ciwîyeno, heme zî zaf rind zanenê ke tirkîyê Xarpêtî û yê Denîzlî zaf cîya yê. Ti ke di kokimanê her di cayan bidê qiseykerdene kes kesî fam nêkeno. Hende cîya yê. Hem zî se serrî yo ke wayîrê yew ziwanê muştereki yê. Ancî zî cîyayîye dewam kena.

Yê ma, ne mîyanê şarê ma de tekilîye esta ne zî heta nika yew ziwano standart bîyo. Naverê çemî û boverê çemî bîle ferq keno çike çem, seba şîyayîş ameyîşê şarî yew manî bîyo. Çapemenîye; kitab, rojname, radyo, tv. Usn. çin bîyê. Şima wazenê ke no nîya dewam bikero? Labelê dewam nêkeno. Îmkanê xo çin o ke dewam bikero. Çike nê ziwanî êdî zaf kes qisey nêkeno. Şima çiqas danê xo ro wa xo ro dê, ziwan beno vîndî.

Şima nê probleman ser o tim tirkî munaqeşe kenê. Yanê kesê ke hesasîyetê ziwanê xo tey esto zî tirkî qisey kenê. Hem zî heredînê ma ra û bi tirkî vanê "… Cok samimiyetle yazmak zorundayim. Anadil calismasi olarak yayinlanan yazilarin bircogunu okuyup anlamiyorsam o benim Anadilim degildir öyle degil mi? Kirmanckiyi süsleyecem daha farkli birsey yapacam diye benim Anadilimi degistiremezsin kardesim." Hem zî no nuşte zaf maqul o, kibar o. Tayê estê dahîna heqeret re ma kenê ke çayê ma sey ziwanê dewa înan nênusenîme.

Zanayîşê milet bîyayîşî tena kurdan nê heme şaranê na cografya de çin o. Ancî verê çimanê xo de tirkan de qayt bikerîme. Nêzdîyê se serrî yo ke xoser ê. Ancî zî sey yew miletî nê, sey cemaatan organîze benê. Tayê silemanij yê, tayê nurij yê, tayê nakşîbendî yê û hona zaf cemaatî estê sey nînan, ge ge kewenê têorte, nanê hure. Ge ge yewbînan de herb kenê.

Tena tirkî nê erebî zî hona sey eşîre yê û ê zî sey yew miletî nê, sey yew eşîre bîyê dewlete. Yanî dewleta xo dewleta eşîre ya. Ma çik îme ke, ma leyê nînan de hona vizêr dest pêkerdo. Milet bîyayîş kotî yo ma kotîme! Ma hona ziwanê xo ser o nêameyîme hure, êdî çiyo bîn ca de vindo. Hona dîn esto ke esas o adirê ma dareno we.

nadirega@hotmail.com

# Hîlmîyê Siwêrekî (1900-1959)

SEÎD VEROJ

Hîlmî Beg yan zî Hîlmîyo Sêwregij, serra 1900î de qezaya Sêwregi de ameyo dinya. Bado şiyo Îstanbul, labelê ma nêzanê çi sebeb ra û çi wext şiyo uca. Wexto ke uca de bîyo, têkilîya ey bi teşkîlat û şexsiyetanê welatperwer û roşinvîranê kurdan ra bîya û winî aseno ke o bi xo zî zerwaştox yan zî azayê nê teşkîlatan bîyo.

Derheqê keye, qicikeye, wendiş û tehsîlê nûştoxî, heyatê ey yê wextê Komare de agahdarîyêka ma ya vêşî çin a. Ey, qanûnê peynameyan ra dime peynameyê "Ergün"î girewto. Tena ma zanê ke o wext postexaneyê Îstanbulî de xebitiyayo, ti ra pey sewbîna cayan de zî mudirîya postexaneyî kerda, çar kênayê ey bîyê û mueseseya postexaneyî ra teqawît bîyo û serra 1959 de Îstanbul de dinya xo bedilnaya. Warê ey weş û cayê ey behiştê Homayî bo.

Muhtewaya nuşteyanê ey ra dîyar beno ke Hîlmîyê Siwêrekî, kurdêko welatperwer o; zaf qîymet dano tehsîlê gedeyanê kurdan, ziwan û kulturê kurdan. Hetê fikir û sîyasî ra zî wazeno sey heme miletan Pirensîbê Wîlsonî seba mileta kurdan zî bêrê tetbîqkerdiş. Coka veng bi ciwananê kurdan dano û vano: "Bi qelema xo, bi cesaretê xo yo medenî, bi kar û kerdişê xo yê milî wextê xebate ameyo û belkî zî vîyarto."

Nuştiş û eserê Siwêrekî, yew heta zî fikir û fikirîyatê ey eşkera kenê. Hende ke ez zana, nuşteyê Siwêrekijî kovara Jîn û rojnameyê Serbestî de ameyê neşirkerdiş. Nuştoxê ma, nuşteyê xo mabênê serranê 1918-1919î de bi di nameyan nuştê; bi kurdî "Hîlmîyê Siwêrekî" û bi tirkî zî "Siverekli Hîlmî". O wext Jîn û Serbestî pîya girêdayeyê Cemîyeta Tealîya Kurdistanî bî. No sebeb ra yo ke ma şênê vajê ke Hîlmîyo Siwêrekij bi xo zî yan zerwaştoxê Cemîyetî bîyo yan zî raşte raşt azayê cemîyetî bîyo.

Kovara Jîn de hewt nuşteyê Hîlmîyê Siwêrekî neşir bîyê: Nuşteyo yewin, hûmara 8. de bi sernuşteyê Kürd Gençlerine (Ciwanadê Kurdan rê), hûmaranê 14., 19. û 24. de zî rêzenûşteyê Kürd Atasözleri (Vateyê verênan yê Kurdan) ameyê neşirkerdiş; hûmara 13. de nuşteyê Şehirliler ve Köylüler (Sûkij û Dewijî); hûmaranê 22. û 25. de zî bi nameyê "Kürd Çocukları İçin Şiir" (Seba Gedeyanê Kurdan Şiîrî), rojnameyê Serbestî de zî roja 11ê gulana 1919î de bi nameyê Aziz Kürdistan (Kurdistano Ezîz) nûşteyêkê ey ameyo neşirkerdiş.

O, nuşteyê Kurdistano Ezîz de, di xusûsîyetan ser o vinderto: o yewin, îlheqkerdişê Kurdistanî bi hukmatê Ereban yê Îraqî yo; o didin zî, vanê "Îran Kurdistanî wazeno". Nuştox idîaya Îranî bi wişkîye red keno û vano: "Bêguman hîç yew dewlete û milleta Îslamî zî qandê çîyêk winasarênî misade nêdano Îranî. Prensîbê Miletanê ke Wîlsonî dîyar kerdî zî qandê naye rê misade nêkenê. Çimkî Wîlsonî zî qebûl kerdo ke her milete qederê xo bi deste tayîn bikero. Dewamê nuşteyê xo de, seke ewro zî tayê kesî îdîa nîsbeta irqî ya mabeynê kurd û eceman kenê, cewabê înan dano û bi kilmîye vano: "Kurd hîç yew wext nêbîyo ecem. Hîç yew minasebet mabeynê ecemîye û kurdîtîye de çin o. Nê hurdî qewmî hem tarîx de û hem zî nika, mabeynê înan de bi heme hewayan ra ferqî estî."

Ma nêzanê ke nê nûşteyan ra teber sewbîn kovar û rojnameyan de, nuşteyê ey ameyî çapkerdiş yan nê? Belkî sewbîn nuşte û kitabê ey zî bibê labelê goreyê zanayîşê ma yê nikayên, nuşte û eserê ey yê ke çap bîyê namêyê înan cor ra ameyî rêzkerdiş.

Peynî de ma şênê vajê; gelek kesê ercîyayê winayênî estî ke ked û huqûqê înan ma ser o zaf o, labelê ma bi xo înan xo vîrî kerdî. Labelê şexsîyetê sey Siwêrekî, bi xebat û qelema xo, millet û welatê xo rê xizmetê zaf muhîmî kerdî. Mahîyetê nê nuşteyan de ey xîtabê milete û bîlhesa zî xîtabê ciwananê kurdan kerdo. Awayêko nûştoxî bi xo hûmara 8. ya Jînî de xîtabê ciwanan kerdo, ez zî vateyê ey dubare kena: "Gelî ciwanan! Deştê zerrênê ke binê hewranê berzan yê Kurdistanî de bêwayîr mendî, heme dewê xopan û keyeyê xirabe yê welatê ma, daristanê sey cenetî û koyê berzî veng danê şima; şikayet û lomeyê xo şima wendoxan ra kenê; pabeyê hewara şima yî û vanê "Bi qelema xo, bi cesaretê xo yo medenî, bi kar û kerdişê xo yê mili wextê xebate ameyo û belkî zî vîyarto.

Gelî ciwanan! Hêvîya welatî pêro şima yî.

> **Seba Qiçekanê Kurdan Yewveng**
>
> Ma ne beg î ne paşa yî
> Ma heme keko yî, heme bira yî
> Dostanê xo rê canfîda yî
> Dişmenanê xo rê bela yî
>
> Pîyê ma wo her hewt qatê asmênî
> Ma ya ma wa weş Kurdistan
> Ma ewladê heme kurdan
> Ma wazenê îlm û îrfan
>
> Ders û raştîye embazê ma yî
> Şûr û qeleme hemhalê ma yî
> Nêverêne meng û serrî
> Her ca bibo gul û lale
>
> **Îstanbul, 21 temmuze 1919**
> **Kurmancî ra çarnayox: Seîd Veroj**

> Peynî de ma şênê vajê; gelek kesê ercîyayê winayênî estî ke ked û huqûqê înan ma ser o zaf o, labelê ma bi xo înan xo vîrî kerdî. Labelê şexsîyetê sey Siwêrekî, bi xebat û qelema xo, millet û welatê xo rê xizmetê zaf muhîmî kerdî.




Hîlmîyê Siwêrekî (Arşîvê Fahrî Ergunî ra)

Belê, mesela heyatê Kurdistanî yo. Hîç mekewê pey hewnandê xapînokan. Ewro wezîfeyê zaf muhîmî dekiwenê şima mil. Nê gam û rojê ke ma tira vîyarenê, zaf muhîm î. Mekewê hewnan!

Eke ma wazenê huzurê dinya û rîpelanê tarîxî de bêleke bimanê, gerek ma fek ezezî, guman û îxtilafandê xo ra veradê, Êdî însaf bikê!..."

Wexto ke ma bala xo bidê di şîîranê ey yê kurmancîyan -ma yewe çarnaya kirmanckî ser û cêr ra nuşta- ma şênê vajê ke nê di şîîrê ey edebîyatê gedeyanê kurdî de nîmûneyanê tewr verênan ra yê.

Çimeyî:

Jîn, Siverekli Hilmi, Kürd Gençlerine, no: 8, Îstenbol, 19 Kasım 1334 (1918),

Jîn, Siverekli Hilmi, Şehirliler ve Köylüler (24 Şubat 1335/1919), no: 13, Îstenbol, 10 Mart 1335

Jîn, Siverekli Hilmi, Kürtlerde Atasözleri, no: 14, Îstenbol,

Jîn, Siverekli Hilmi, Kürdlerde Atasözleri, no: 19, Îstenbol, 22 Mayıs 1335,

Jîn, Hîlmîyê Siwêrekî, Ji bo zarowê Kurdan-1: Serê Sibê (Şiîr), No: 22, Cild: 5, s. 941

Jîn, Siverekli Hilmi, Kürdlerde Atasözleri (Önceki Sayılardan Devam), No: 24, cid: 5, s. 1023

Jîn, Hîlmîyê Siwêrekî, Ji bo zarowê Kurdan-2: Yekdeng (şiîr), cild: 5, No: 25, s. 1049, Îstenbol, 21 Tîrmeh 1919

Serbestî, Siverekli Hilmi, Aziz Kürdistan, No: 492, Îstenbol, 11 Mayıs 1919

# Tilelo (Tirba Elo)

ARÊKERDOX: ZAZANUS

**Derheqê Efsane de Tayê Malumatî**

Herçiqas ewro sey Tileloyî (hetê tayê kesan ra sey "Tirelo"yî zî vajiyeno) bêro nemakerdiş zî eslê xo Tirba Eloyî ya. Verê cû şarî bi "Tirba Eloyî" name kerda labelê wext vîyarto, no name bedilîyayo bîyo "Tilelo".

Tilelo hem nameyê tirbe yo hem zî nameyê dewa ke girêdayeyê Dîyarbekirî ya yo. Xora dewe nameyê xo tirbe ra girewto. Nika dewlete nameyê na dewe kerdo "Karaçalı". Na dewe rayîrê Farqîn-Licê-Çewlîgî ser ro, nizdê 15-20 km teberê Dîyarbekirî de ya. Seke yeno zanayîş derûdorê Tileloyî de zafêr kurmancî ciwîyenê labelê efsaneya Tileloyî mintiqayêka hîra ra vila bîya û ewro mîyanê kirmancanê Licê de zî behsê na efsane beno.

Her komel yan zî şar, efsaneyê ke hetê bawerî û kulturî ra xîtabê înan kenê xo mîyan de muhafeze keno. Ê komelî wazenê efsane ro wayîr vejîyê û hîsê aîdîyetî xurt bikê. Nika Tirkîya de Dêrqam, Afşîn, Tersûs, Eskişehîr û Efes de cayê ke sey Eshabê Kehfî qebul benê estê û şarê nê şaristanan her yew vano "cayê Eshabê Kehfî yo rast cayê ma yo." Gerê ma na zî vajê, sedemo yew zî aborî ya. Çunke eke baş bidîyê şinasnayîş cayê winayinî cayê turîzmî yê û qezencêkê madî danê peydakerdene. Bi eynî şekil mintiqayanê cîyayan de ma rastê versîyonanê efsaneya "Tilelo"yî zî yenê. Efsaneya çemê Mizurî nê versîyonan ra yew a.

Herçiqas hedîseyê peyênî cîya bibê zî, Efsaneya çemê Mizurî versîyonêkê efsaneya Tileloyî ya. Efsaneya Çemê Muzirî de, sey efsaneya "Tilelo"yî reyna şiwane (Mizur) miletî ver remeno. Şitê destê ey rişêno û cayê ke şit gineno erd ro de çewres çimeyê awe ber benê. Û Mizur çimeyê peyênî ro şina war û beno vindî.

Sey sanikan efsaneyî zî bi fekkî aj ra aj neqil bîyê. Wexto ke fek ra fek neqil bîyê -zaf ra tay- tayê motîfê nê efsaneyan bedilîyayê. Versîyonê na efsane ya ke Roşan Lezgînî arê dayo de, werdo ke zerrîya axayî şina ci kufte yê. La versîyono ke mi arê dayo de cinîya axayî esîde pewcena û vana "werekna nika axa zî etîyade bibayn û na esîde biwerdên." Yanî werd esîde ya û yew îştekê axayî çin o. Cinîya axayî bi xo wazena axa esîde biwero.

*1-Nadîre Güntaş Aldatmaz (arêkerdoxe), Sanikanê Mamekîye Ra, Weşanê Enstîtuya Ziwananê ke Tirkîya de Ciwîyenê ya Unîversîteya Artuklu, Mêrdîn, 2013, r. 65*

*2-Çç, r. 161*

*3-Na efsane Comeleşa Licê de arê dîyaya.*

## Efsaneya Tileloyî

Deşte de yew axa beno. Axa wayîrê komûkulfetî yo. Û yew zî şiwaneyê ey beno. Şiwaneyê axayî merdimêko şithelal o. Nê sedemî ra axa zaf qedrê şiwaneyê xo gêno.

Demî şinê dewranî yenê rojêk axa werzeno şino hec. Axa wexto ke hema hec de beno, cinîya axayî keye de esîde pewcena û veng dana şiwanîyî zî. Cinî, tutê axayî û şiwane sifreyî ser o ronişenê û esîde wenê. Cinîya axayî tamê esîde zaf ecêbnena. A game axa keweno aye vîr, zera aye bena tenge û vana:

-Werrekna nika axa zî etîya de bibayne û na esîde biwerdên.

Senî cinîya axayî winî vana, şiwane ca de vano:

-Tebeqêk esîde deker ez berî wa axayê mi biwero.

Cinîya axayî xo rê xo de vana "beno ke şiwaneyî esîde mird nêwerda û seba xo wazeno". Ca de werzena tebeqêk esîde dekena û dana şiwaneyî. Şiwane tebeqa esîde gêno keweno rayîr û çiman ra beno vinî.

Demêk ra pey şiwane, destê ey de tebeqa venge, agêreno yeno keye. Cinîya axayî ra vano:

-Mi esîde berde da axayê xo û ez ameya.

Cinîya axayî bawer nêkena labelê nêwazena ey bişeqezno. Rojî derbaz benê, hecê axayî temam beno. Û axa agêreno yeno keye. Hema ke qefleyê hecîyan nêresayo dewe, dewijî kewenê rayîr û şinê vernîya hecîyan. Axa senî dewijan vîneno vano "meyîrên vernîya mi, şêrên tewafê şiwaneyî bibên, o welîyê Homayî yo."

Axa ke winî vano, dewijî agêrenê ver bi şiwaneyî şinê. Şiwane dewijan vîneno û remeno. Dewijî zî bi vazdayîş kewenê ey dima. Şinê resenê serê yew tepeyî. Şiwane ewnêno ke dewijan ver xelasa ey çin a, dua keno Homayê xo rê û vano "ya rebbî ti erd biqeleşnê, ez piro şêrî war." Terefê Homayî ra erd qeleşêno û şiwane piro şino war. Destê ey de çiwaya ey bena; o ke ard ro şino war çiwaya ey teber de manena. Dewijî şinê tewafê çiwaya ey benê. Tewafî ra pey çiwaya şiwaneyî zî erd ro şina war bena vinî.

A game ra nat şar, ê cayî sey quba qebul keno.

# Awa Feratî Şina

SERDAR ROŞAN

şêxê min şi
mîrê min şi
awa feratî şina

qicêko diserre mîrê min o
vagona trêna tirkan de surgun o
xinûs ra surgunê dewêka tirkan o

mîrê min torinê şêxê pîlî yo
o yew zerrîciwan o dîyarbekir de
serberz o verê sêdara tirkan de
generalê tirkan rêz bîyê
hêvîya xatirwaştişê zerrpola yê

şêxê min xortêko ciwan o
torinê ma do heyfa ma bigîrê, vano

mîrê min hema qic o
verê berî de kaykeno

trêne leqena, vagonî leqenê
rayîr dûrî yo
serd o
yew baz paca ra aseno
mîrê min heweno
vano
biewnîye, yew baz, dayê
gelo ma nika ça yê

trêne şina
ver bi xerîbîye şina
rayîr dûrî yo

mîrê min qic o
mîrê min hewn vîneno
hewnê xo de bazî vîneno

mîrê min xatir waşt vizêrî
va,
wext o
lazim o
ez hendî şirî

bi edeb û fikir bî
bêrîya bazê xo kerdebî

nika verê bazê xo de yo
kîşta bazî de pereno

pîya ewnênê milkê xo ra
pîya ewnênê milkê ma ra

şêxê min xatir waşt
mîrê min xatir waşt

tûtêko qic verê berî de kaykeno
trêne leqena
vagone leqena
ver bi xerîbîye şina
awa feratî şina.

# Şima Zanayêne?*

Împaratorê Moxolan, Hülagu Xanî 10 Sibate 1258 de Bexdad girewt xo dest. Bajar cêr ra cor ame talankerdene û camî çarnîyay axuran. Adir panîya pêro kitabxaneyanê nê bajarî ra ke ê wextan Bexdad sey merkezê tewr gird yê dinyaya Îslamî ameyêne hesibnayene. Gama ke kitabê ke nêamebîy veşnayîş erzîyay awa Dîcle, awa çemî bi rojan rengê murekebî herîkîyaye...

Teşebusê veşnayîşê kitaban o ke roja 10 gulane 1933 de Almanya de dest pêkerdbî demêkê kilmî de her cayê welatî ra vila bî. Mabênê hîrê hewteyan de Almanya de bi se hezaran kitabî amey veşnayîş. Bajarê ke tede kitabî amey veşnayîş, hemîne de unîversîteyî estbîy. Gama ke kitabî ameyêne veşnayîş tena zabitanê nazîyan nutiq nêdayêne, profesoran zî xîtabê bi hezaran merdiman kerdêne. Wexto ke eserê Heîne, Marx, Freud, Seghers, Brect, Zuckmayer, Zweig û Remarqueyî erzîyayêne zereyê adirî ke kilan mîyan de biveşê orkestrayanê leşkerîyan marşan dayêne piro, merdiman zî sey heywanan zûrayêne. Nazîyan tena Berlîn de 20.000 kitabê nê nuştoxan eştî adir û veşnayî. Leşkeranê nazîyan heme welatî de eşt kitabxaneyan û weşanxaneyan ser, bi kamyonan kitabî berdî meydanan û eştî zereyê adirî. Îdareyê Hîtlerî di serrî dima yew "lîsteya qedexeyan" weşanaye. Goreyê na lîste, nazîyan 3.601 kitabê 524 nuştoxan ke goreyê înan "bizerar bîy" kerdêne qedexe...

Ewro wextê ma de (Nîsane 2003) dumanê sîyayî yê bi hezaran kitaban û belgeyan rawuştbî asmênê Îraqî. Kitabxaneyê Neteweyî yê Bexdadî ke tede 40. 000ê xo destnuşteyî (nusxayî) 420.000 kitabî estbîy (nînan mîyan de mesnewîyê Leyla û Mecnunî ke hetê Fuzulî ra 1535 de nusîyabî zî estbî) talankerdiş ra dima amebîy veşnayene, Muzeya Arkeolojî zî amebî talankerdiş. Ameyêne vatiş ke erjê ke amebîy talankerdiş hetê leşkeran û rojnamegeranê îngilîzan û amerîkayijan ra neqlê Dewletê Yewbîyayeyî yê Amerîka (DYA), Îngilîstan û Fransa bîyê ...

Bi goreyê datayanê World Survey of Îslamîc Manuscrîptî yê 1993-1994î, 113 kitabxaneyanê Îraqî de -1194ê xo bi tirkî- pêro-pêser 82.258 destnuşteyî (nûsxayî) estbîy. Labelê nika aqubeta înan nêna zanayêne...

*Sernuşte hetê ma ra ame panayene
Tirkî ra çarnayox: Pêşar Bextewer
**Çime:** Louise-Noëlle Malclès, Andrèe Lhèritier, M. Türker Acaroğlu, Batı'da ve Türkiye'de Kaynakça Tarihi, İletişim Yayınları, Îstanbul, 2003, r. 138-139



## 20:39a Ciwanmerd Kulek:

# Gerînekeke Gêjker



UMRAN ARAN

Destpêka romana Nabokov, Hoqboqa di Tariyê de wisa ye: "Zemanekî li Berlîna Almanyayê zilamekî bi navê Albinus dijiya. Dewlemend, xuyanî, bextewer bû; rojekê ji bo xatirê dostikeke ciwan dev ji jina xwe berda; hez kir; nehat hezkirin; û jiyana wî bi felaketekê qediya. Ev e tevdê çîrokê û me jî karîbû ew bi vî halê wê bihişta, heger ne ji xweşî û sûda vegêranê ba."

Li vir Nabokov bi wan xwîner û nivîskaran re ku ji bo wan serî û dawiya çîrokê, bûyerên qewimî, surprîz hwd zêde girîng in henekê xwe dike. Ji ber ku Nabokov dizane ku hem ji bo xwîner û hem jî ji bo nivîskaran piştî kemilînekê, êdî çîroka çîrokê zêde ne girîng e; ji pirsa çi qewimî bêhtir, pirsên wek çawa qewimî, bi çi zimanî behs kir, bi çi çavî dît, ji ku karîgeriyek lê bûye hwd qîmetê bi xwe ve digirin. Ji ber ku Nabokov dizane ku a esil vegêran e, ji efsûna vegêranê bawer dike. Ji wî çîrokbêjê şikeftê heta bi amûrên teknolojîk vêgêr jî her bi awayekî efsûnbaz in.

Qey ji ber vê yekê ye, weku Nabokov ne di destpêka romanê de jî be, Kulek jî li berga paş a kitêbê çîroka çîrokê nivîsiye: "Keçek û xortek li maseyekê rûdinin û her tişt ji bo wan, bi awayekî bêveger, ji bint de diguhere. Dem di qonaxekê de radiweste û li meyxaneya ku stranek li ser hev dubare lê dide rêwîtiya berepaş dest pê dike. Lê li derveyî vê xelaka ku tê de asê mane dinyayeke dî, demeke ku bêhawe lezgîn dajo, pîrbûn, jibîrçûn, bext û aqûbeteke nediyar ji bo herduyan heye. ..."

Belê çîroka çîrokê ev e. Du yarik diçin meyxaneyekê û kêfê dikin. Piştî demekê keçik diçe destşokê gava ku vedigere lawik çav bi tayên spî dikeve di porê wê de. Heman tişt li serê lêwik jî diqewime, her ku ji cihê xwe radibin pîr dibin. Di gerînekekê de asê dibin, dawiya dawî biryar didin ku rabin û vê qederê qebûl bikin. Heta ku digihîjin derve êdî bûne kal û pîreke peloxî. Ev bûyer bi xwe bûyereke ji rastiyê wê de ye û xwedî rehendekî efsûnî ye; lê efsûna vegêranê ku me amaje pê kir, ne tenê ev e helbet. Heger ev di çarçoveyeke afsûna me amajepêkirî nehatiba rûniştandin wê çi ferqa wê heba ji çîrçîrokeke derasayî? Lê belê hatiye rûniştandin. Bi halet û sembolên ecêb, bi referansên bo kitêb û fîlminan, bi bikaranînên cuda yên gotarê (gotara neyekser a serbest pir serkeftî ye) di vegêranê de, bi îmajînasyoneke xurt vegêraneke efsûnî derketiye holê.

Ji ber vê yekê xwîner jî nikarin xwe ji ber xelekên vê gerîneka her du ciwan an her du kal ketinê, rizgar bikin û ew jî tê de dizîzikin, dema ku tên dawiya romanê dinêrin ku hê li serê wê ne. Lê ji bo edebiyata heqîqî dawî û serî ne girîng in, edebiyat zemên digire û ditewîne; berdide û vedizeline; dike xelek û li hev digerîne; tu xêzekitî nikare li ber hêza wê serî danîne, lewma saet her 20:39 be jî ne xem e: Ev warê em lê warê edebiyatê ye, zeman û mekan êdî di destê afirînerekî din de ye. Û heger ew karibe me bavêje gerînekekê, erda me ji ber nigê me bikişîne, ez jê re dibêjim afirîner; û Kulek ji heq vê yekê hatiye der.

Lawik hem senarîst e, hem çîroknûs û hem jî rojnamexwan. Erê we şaş nebihîst: Rojnamexwan. Piştî ku kaptanek ji radyoyekê li bernameyeke bi dengê lêwik dûblajkirî bi kurdî guhdar dike, dide dû wî û wî digire kar da ku rojnameyan wergerîne û bi kurdî jê re bixwîne. Kaptanekî ecêb e, ne wisa? Her çend keçik bersivê pê vedike û dibêje ku belkî kurd be bi eslê xwe, tu delîl ji bo vê bi dest me nakeve (nivîskar vê xalê jî wek çend xalên din vekirî dihêle).Min ji vî kaptanî hez kir; ji ber ku kaptanên wanî bi tenê di edebiyatê de hene: Te dî em carinan dibêjin "errik filankes wek ê kitêban e" an jî gelo me digot "wek ê fîlman"?

> Dema ku lawik dest bi çîroka wan dike, her hewl dide hevoka destpêkê ya rast bibîne. Dema ku di dawiya senaryoyê de –ku li ser xwe û yara xwe nivîsiye û ew jî di romanê de heye- keçik xwe dikuje, sebeba vê yekê wiha tê şirovekirin weku divê dawî trajîk be lewma li gor lawik şahî û kêfxweşî hestên sivik bûn.

Çîrok, senaryo, fîlm tevde di vê romanê de tên amajepêkirin an jî li nav hev dikevin. Çima gelo? Ji ber ku her sê jî warên vegêranê ne, warên efsûnê ne. Leheng her car di deqeya 44an a fîlmê Lars von Trier Europa de diteqine û di xew re diçe ku ev fîlm bi teknîka xwe ya vegêranê berçav e. Her du lehengên ciwan an jî extiyar, ew jî bi efsûna vegêranê dizanin, lewma ji bo ku ji wê gerînekê rizgar bibin, biryar didin ku qala xwe bikin. Lê nikarin jê rizgar bibin ji ber ku haya wan jê tuneye ku ew jî di wê gavê de ku qala xwe dikin, çîroka xwe vedigêrin, jî hêla kesekî din ve tên vegêran. Lê ecêb e her ku bedena wan dirize bîra wan, hafizeya wan vedije. Esasen ne ecêb e, ji ber ku êdî ew xwe vedigêrin, çîroka xwe dibêjin, xwe dikin edebiyat, ketine warê edebiyatê. Heçku jiyana wan a berî ser wê maseyê jiyana rastîn bû û piştî li ser wê maseyê rûniştin, êdî jiyana wan a edebî dest pê dike. Qey lewma keçik tiştên heta wê demê negotî dibêje, li tiştên heta wê demê wê lê guhdarnekirî guhdar dike. Edebiyat jî ne tiştekî werê ye? Jiyan bi serê xwe, wek jiyan, zêde ne xav û tisî ye? Ma edebiyat jiyana di jiyanê de dernaxe, tişta negotî nabêje, jiyanê naşuhurîne?

Min behsa sembol, bûyer û amajepêkirinên ecêb kir. Ez ê piçekî li ser wan rawestim. Her du yar, ciwan diçin wê meyxaneyê lê belê extiyar radibin jê. Erê werê xuya ye? Lê gelo bi rastî jî wisa dibe? Gelo jixwe ev her du ciwan ji serî de ne extiyar bûn? Ka em binêrin. Gava ku nuh diçin wir maseyek "rezerve" heye. Kal û pîrek tên li wir rûdinin. Di destpêkê de mirov difikire ku ev kal û pîr derhişa her du ciwanan e. Paşê gava ku lehengên me extiyar radibin, çavê wan bi wê maseyê dikeve û her du ciwanan dibînin, yanî xwe dibînin. Ew her du kal û pîrên maseya kêlekê ew bûn. Ciwan pîr bûbûn, pîr jî ciwan bûbûn. Yanî ev ew bûn, an jî ew ev bûn. An jî tiştekî din? Çi? Hişên tewişî? Gerdûnên paralel?




Gava ku li ser wê maseyê ne, keçik bi kevnikekî spî pisîkekê çêdike. Ha ji we re sembolek. Lê bi vê pisîka kaxezî tenê namîne. Pisîkeke reş û spî tê dikeve himêza pîra li ser maseya kêlekê. Hêviya her du ciwanan pardon extiyaran çêdibe û vêya wek nîşana guherînekê dibînin. Ev ji ku derket îcar? Çima pisîkek bibe nîşana guherînê? Gelo fîlmê Matrix hat bîra we jî? Di wir de Neo çav li pisîkekê dikeve û dibêje "dejavu", lehengên din bi metirsî disekinin û Trinity dibêje; "Gava ew tiştekî diguherînin, ev yek pêk tê." Ev tiştên han ji aliyekî bandora fîlman be, ji aliyekî jî rengvedana felsefeya serdest ya berdest e.

Dema ku lawik dest bi çîroka wan dike, her hewl dide hevoka destpêkê ya rast bibîne. Dema ku di dawiya senaryoyê de –ku li ser xwe û yara xwe nivîsiye û ew jî di romanê de heye- keçik xwe dikuje, sebeba vê yekê wiha tê şirovekirin weku divê dawî trajîk be lewma li gor lawik şahî û kêfxweşî hestên sivik bûn. Keçik li vir îtirazî encamê dike. Ev hizr û gengeşeyên derbarê fîksiyonê de yên li cem lehengan aliyê bançîroksaz yên romanê pêk tînin. Herwiha dema ku em vê yekê, bûyer û sembolên ecêb, bandorên ji fîlman û zanistê yên di romanê de heyî hemûyan didin ser hev aliyê postmodernîst ê romanê derdikeve. Ez dikarim bibêjim ku ev roman mînakeke baş a romana kurdî ya postmodernîst e.

Min bi Nabokov dest pê kiribû, ez ê bi wî biqedînim. Nabokov di nivîsara xwe "Xwînerên Baş û NivîskarênBaş" de, dibêje: "Mirov dikare nivîskarekî ji sê riwangehan bibîne: Çîrokbêj, mamoste, efsûnbaz. Nivîskarê mezin van her sêyan harmonîze dikin, lê tişta ku giran tê efsûnbaziya wan e." Çîrokbêj li ser şopa hestan e, mamoste dersan dide û efsûnbaz bi xeyal û şêwazeke xurt berhema xwe dihûne. Dema ku min di vê berhemê de gotinên pir zêde yên "ji nişka ve" û manend û hevwatayên wê xwendin ez kerixîm jê, ji ber ku çîrokbêj serî li fenêkên sivik dida ku cihê wan tuneye di edebiyata heqîqî de. Di edebiyata heqîqî de "mêrik radibe û xwe dikuje" ne hewce ye "ji nişka ve rabe" û xwe bikuje. Dema ku min hinek gotinên li ser zimanê kurdî û hinek jî biwêj û îbare xwendin ku êretî sekinîbûn weku derketibin pêşangehê, min mamosteyek dît; lê pir lawaz bû nikarîbû zêde ders bidaya. Lê bi giştî efsûnbaz xurt bû di berhemê de.

Haa birra piştî min kitêb qedand kêliyekê min got qey ez ji ber fîlmekî rabûme! Nizam dejavu bû çi bû!?

# Dengê Fotografekî




MUSTAFA DOĞAN

Min çendek berê ev fotografê Bismilê, li ser medyaya civakî dît. Nizanim çima yekser Lîsbona Fernando Pessoa hate bîra min, piştre jî Dublina James Joyce. Tevî ku min hîç bi çavê serê xwe ev bajar nedîtibin jî, belkî ji ber tesîra van nivîskaran min ev hîs kir, wê jî nizanim. Ji teyarê hatiye kişandin. Hevalekî li ser şîrove kiribû û gotibû; "Ji bilî Bismilê dişibe her derê." Ecêb kenê min hatibû.

Min di dilê xwe de got; "Ji jor ve her tişt çiqas xweş e, gelo em jî di çavê rebb-il alemîn de wisa qeşeng û li hev hatî xuya dikin?". Ji ber ku ez ji bilindahiyê ditirsim, dema li balafirê siwar dibim newêrim zêde li jêr binêrim, loma jî dîmenên wiha nakevin ber çavên min. Tam di vir de hevokek ji çîrokeke Lokman Ayebe tê ber devê min: "Erê ez çiyayî me lê ez gelekî ji bilindahiyê ditirsim."

Ez dema girtina fotograf nizanim; loma ji xwe re texmînan dikim. Ji rengê wê, dibe ku payiz be. Wextê cot û tovan yanî. Bêhna mazotê ji gund û çolteran hiltê. Zevî pir in li Bismilê. Loma jî li wir demsala herî xweş havîn e. Ew dema ku ber êvaran hilmeke bêhempa ji zevî û çolan tê û digihîje hundirê hundirê hundirê kezeba mirov. Qemyon li ser hev diçin û tên ber lodên genim. Genimên ku ji deştên fireh tên çinîn, bi rengên xwe yên spesîfîk, bênderên gundan û bazarên navçê dixemilînin. Karkerên ku genim bar dikin, ji bo ku xwe ji dûmana genim biparêzin poşiyan didin ber devê xwe. Poşiyên kesk û sor û zer ên ku di newroza Diyarbekirê de di bin temeziyê sergovendan, havînê di bin dîwar ji devê wan re ji bo ku dûmana ceh û genim neçe gewriya wan. Helbet ev poşiya sê reng a li ber devê wan, ji bo çepgirekî, dîmeneke bêhempa ye û ew dikare çend teoriyan li ser şirîkatiya micadeleya neteweyî û proleterî bêje. Lê yê min lingên wan ên li ber tava havînê reş bûyî, di bîra min de ne. Ew lingên ku bi toz û topaxê diguhere rengekî ecêb. Tiştekî din jî tê bîra min niha ku ez li vî fotografî dimeyzînim. Sala ku bavê min nîsk diçandin, meha gulanê dihat û ez dibirim gund ji bo alîkariyê. Ji ber ku dawiya mektebê bû, ders tunebûn û me wê demê bi keçikan re têra xwe galegal û laqirdiyan dikir, ez hêrs dibûm. Heta ez diçûm gund min di rê de hezar çêr û sixêf dikirin ji cotkariyê û ji nîskan re. Lê dîsa jî min ji kelecana havîna wê qezayê hez dikir.



Ya rast heta xortaniya min jî, vî çemê di fotograf de bala min nedikişand. Haya min zêde ji Dicleya ku xwe badide û berê xwe dide aliyê başûr tune bû. Piştî ku min kitêba Mehmed Uzun a Hawara Dîcleyê xwend û min fîm kir ew çem, ev çem e, êdî ew der bûbû meskenê min. Uzunê nivîskarê efsane yê xortaniya me, wekî gelek kesan pir tesîr li min kiribû. Ji ber ku rojên çarşeman dersa me ya dawî Rehberlik bû û kesî ti qiymet nedidayê ez derdiketim û bi meşê dihatim peravên Dîcleya ku di romanê de behsa wê tê kirin. Biharan helbet pirtir bû ava çem û seyra wê xweştir bû. Li ser kevirên peravan ciwanan tişt dinivîsandin. Ji ber ku nivîsandina wan gelek xirab bû, min kite bi kite, herf bi herf dixwendin: S-e-n-î W-e-f-a-s-ı-z-ı-n K-ı-z-ı. Dû re li Biroyê Dengbêj ê qehremanê romanê difikirîm. Salên balixbûna min bûn. Di cihên kitêbê yên erotîk de, bêhemd nav ranên min germ dibûn. Diponijîm ku vê avê şahidiya heyata wan kiriye. Tiştên wisa min diheyirînin û dilê min dibezînin. Hêj evar nebûbû, min hesabê saetê digirt û radibûm. Lazim bû ez beriya tarî bikeve erdê biçûma û riya min jî nîv saet dewam dikir. Ez bi tirs dihatim, heke yekî ez bidîtama û ji bavê min re bigota; "Me Mistefa li devê çem dîtiye" min ê çi xwelî li serê xwe bikira. Heke bavê min zanibûya dê çi bigota. Bi îhtimaleke mezin wê bigota: "Law ma te aqil avêtiye? Çem e çem! Eynisî li gund jî heye!"

Bavê min erê. Gelo bavê min tam dema vî fotoyê Bismilê ji jor ve hate girtin çi dikir? Me got payiz e. Wekî seranserê cotkarên vî bajarî ew jî niha ketiye tetêla cot û tovan. Heke mibzer an traktora me perçeyek neşikandibe û ew niha ne li senayî be, niha belkî ji yazîxaneya xwe derketiye û ber bi mizgefta navendî ve diçe. Dema diçe camiyê, kapika qondera xwe dişkîne hertim. Di rê de îlleh leqayî dostekî xwe hatiye û bi hev re behsa rewaya (nem) erdan dike. Berberên xwe dibîne belkî, porê wî tê bîra wî. Direj bûye? Nizanim. Te dî dostên wî jî sal bi sal kêm dibin, diçin ber rihma Xwedê. Dema stranên li ser derewbûna dinyayê dibihîze serê xwe ji rastê ber bi çepê dibe û tîne. Ez tê de derdixim ku wê hîsê ew jî digire hêdî hêdî. Ku ez dibêjim Yazîxane, bila yazîxaneyên klasîk ên ku ewraq û dosya tê de hene neyê bîra we. Li wir sandalye rêzkirî ne. Ew bi nas û dostên xwe re li wir rûdinê, xwarin dixwe, çay vedixwe û heta êvarê behsa halên dinyayê dike; gotin diçin û tên, vedigerin ser meseleyên vî bajarê ku em di fotograf de lê niştecih in tu demê eleqeya ku heq dikin nedîtine. Dîroknûsiya serdest ku bi refleksek oryantalîst û kolonyalîst dîroka xwerêxistinkirina Kurdan a bajarî, siyasî û civakî; bi giştî bi gund, çiya, eşîr, koçberî û çolteriyê pênase dike, Kurdan bi taybetî ji jiyana bajarî û aîdiyetên wê yên çandî, ilmî û siyasî bêpar û mehrûm dihêle.

Dinya hemû ev navçe ye. Ji ber ku hemû çîrokên wan ên bi salan, di paxîla vir de razayî ne.

## Destana 12 siwariyên Kurd:

# 'Donzdeh Siwariyên Merîwanê' bo Kurmancî jî hat wergerandin

Pirtûka bi navê 'Donzdeh Siwariyên Merîwanê' ku ji aliyê Pîremêrd ve hatiye nivîsîn û ji 72 rûpelan pêk tê, ji weşanên Peywendê belav bû. Pirtûka ku ligel Kurmancî reseniya pirtûkê ya bi zaravayê Soranî jî tê de cih digire, ji aliyê Memê Mala Hinê ve hatiye amadekirin.

**Naveroka pirtûkê**

Pîremêrd, di vê berhema xwe de behsa şerê donzdeh siwariyên Kurd ê li hember artêşa Îranê ya bi dondzeh hezar kesî dike. Ev donzdeh siwar bi lehengî şer dikin û artêşa Îranê têk dibin. Berhemên wekî Mem û Zîn û Donzdeh Siwariyên Merîwanê nîşan didin ku Pîremêrd bi van her du destanên ku di nav Kurdan de heta îro nifş bi nifş bi devkî hatine veguhastin, dixwaze hesteke neteweyî pêk bîne. Dema ku mirov bala xwe dide naveroka van herdu berheman, mirov dibîne ku Pîremêrd bi hêmayên neteweyî ev her du berhem neqişandine.




### Jiyana Pîremêrd

Di sala 1867yan de li Silêmaniyê tê dinê. Di panzdeh saliya xwe de dibe katibê nifûsê yê Silêmaniyê. Di sala 1898an de diçe Stenbolê. Salekê li mabeyna seraya Osmaniyan dimîne. Li Stenbolê di sala 1905an de perwerdehiya hiqûqê xilas dike. Di hin navçeyên de qeymeqamî dike. Di sala 1918an de dibe miteserifê Amasyayê. Heta sala 1923an li wir miteserifî dike. Di sala 1925an de vedigere Silêmaniyê. Di sala 1926an de dibe serperiştyarê rojnameya Jiyanê. Di gelek rojname û kovaran de bi sedan nivîsên wî derçûne, dema ku ew li jiyanê bûye berhemên wî yên li jêrê weke pirtûk hatine çapkirin. Di sala 1950î de li Silêmaniyê koça xwe ya dawî dike. Pîremêrd heta niha ev berhem nivîsîne: Mem û Zîn (Şanoname, 1934), Dîwanî Mewlewî (1935), Diwanzde Sîwarey Merîvanî (Çîrok, 1935), Mehmûd Axay Şîwekel (Şanoname, 1942), Galte û Gep (1947)

## Qosera Mêrdîna îro:

# Tarîxa Dinêserê

Pirtûka bi navê 'Tarîxa Dinêserê' ku ji 176 rûpelan pêk tê ji weşanên Peywendê derket. Ji pirtûka "Hilyetu's-Seriyyîn min Xewasî'd-Duneyseriyyîn" Hatiye Neqandin û ji aliyê Îbnu Ilalmiş Tebîb û Dîroknas Ebû Hefs Umer Kurê Xidirê Duneyserî ve hatiye nivîsandin (574-640/1179-1243). Amadekirin û wergera wê ya ji Erebî jî ji aliyê Mela Birhanê Tarînî ve hatiye kirin.

Naveroka Pirtûkê

Tarîxa Dinêserê (Qosera Mêrdîna îroyîn), di warê dîroknûsiya bajarvaniyê ya serdema navîn de, çavkaniyeke gelek muhîm e. Hem dîroknasên Ewropî, hem jî yên Misliman bi giştî li ser bajarên wekî Şam, Bexda, Qahîre, Îsfahan, Şîraz û Stenbolê berhemên xwe pêk anîne ku ew bajar bi giştî paytextên Împaratoriyan bûne û wekî navendên cîhana Îslamî hatine qebûlkirin. Lê belê, li perîferiya împaratoriyan gelek bajar hene, di warê ilmî, çandî, aborî û siyasî de hîç ji van bajaran kêm nîn in. Bajarên Mezopotamyaya Bakur ên ku Kurd lê niştecih in tu demê eleqeya ku heq dikin nedîtine. Dîroknûsiya serdest ku bi refleksek oryantalîst û kolonyalîst dîroka xwerêxistinkirina Kurdan a bajarî, siyasî û civakî; bi giştî bi gund, çiya, eşîr, koçberî û çolteriyê pênase dike, Kurdan bi taybetî ji jiyana bajarî û aîdiyetên wê yên çandî, ilmî û siyasî bêpar û mehrûm dihêle. Ji ber vê nêrîna serdest, dîroka gelek bajarên Kurdan ên qedîm an nehatiye nivîsîn yan jî li ser tarixa milletên din hatiye hesibandin. Gelek destxet û belgeyên têkildarî dîroka bajarên qedîm yan li refên arşîvan de li benda rizînê hatine hiştin, yan jî bi zanatî hatine/têne tehrîfkirin. Ev berhema ber destê we, xebateke xwedî taybetiyeke wiha ye. Biçûk be jî dixwaze parçeyek muhîm yê dîrokeke qedîm ji tunebûn û rizînê xilas bike. Tarîxa Dinêserê hem ji bo xwendevanên 'jirêzê' yên eleqe nîşanî dîroka serdema navîn a Kurdan û Îslamê didin, hem jî ji bo dîroknas û lêkolîneran berhemeke muhîm e.




### Jiyana Îbnu Ilalmiş

Tebîb û dîroknas Ebû Hefs Umer kurê Xidir kurê el-Lemiş kurê ed-Duzmiş kurê Israîlî yê Duneyserî (574-640 / 1179-1243). Ji Dinêserê ye. Cara ewilî li bajarê xwe Qur'ana Kerîm û qiraetan cem Îbnu Zamir Elî kurê Muhemmed kurê Debbasê Nîlî, Îbnu Xutluxê Nisîbînî û Elî kurê Emr kurê Usmanê Sêrtî dixwîne. Fiqhê li ba Seyfudînê Meraxî û Qadî Ebû Imranê Makisînî dixwîne. Mezheba wî Şafiî ye. Lê gelekî feydeya fiqhê ji Qadî Etîq kurê Ibrahîmê Eyzûlî û Muhellebî (Girmelêbî) distîne. Ilmê tibê jî nik Sabit kurê Ehmedê Herranî li Dinêserê dixwîne. Ilmê Hedîs, Tefsîr, Luxet, Nehiw û Şiîran li cîyê mîna Herran, Irbîl, Mûsil, Bexdad, Mekke û Medîneyê û herî dawî jî li bajarê xwe Dinêserê li bal gelek alim û şêxan dibe guhdar, dinivîsîne û dixwîne. Berhemeke din ya wî ya bi navê 'Hilyetu's-Seriyyîn min Xewasî'd-Duneyseriyyîn' heye.

# Serlêdanên Pêşbirka Helbestan a Arjen Arî ya 5. dest pê kir

GÖNÜL GÜN

Arjen Arî di sala 2012an de ji nav me koç kir û ev pênc sal in li ser navê Arjen Arî pêşbirka helbestan tê lidarxistin. Îsal ji bo pêşbirka helbestan a Arjen Arî ya 5. serlêdan di 1ê Mijdarê de dest pê kir ku dê heta sere meha sibata 2018an berdewam bike û encama pêşbaziyê wê di 1ê Nîsana 2018an de bê eşkerekirin. Ev pêşbirk ji aliyê malbata Arjen Arî û Weşanxaneyên Evrensel û Lîsê ve tê lidarxistin. Berpirsê Weşanxaneya Evrenselê ya Diyarbekirê Reşo Ronahî di derbarê pêşbirka helbestê ya Arjen Arî de ji Heftenameya Basê re axivî.

**Ji bo Arjen Arî helbest...**

Di serê meha mijdarê de destpêkirina serlêdana pêşbirka helbestan a Arjen Arî ya 5. hat eşkerekirin. Reşo Ronahî diyar dike ku kesên bixwazin serî li pêşbaziyê bidin heta sera Sibata 2018an dikarin dosyayên xwe bîşînin. Encama pêşbaziyê jî dê 1ê Nîsana 2018an de eşkere bibe. Pêşbirka helbestan a Arjen Arî bi tenê di zaravaya Kurmancî a Kurdî de tê kirin. Ronahî ji bo pêşbazan şert û mercên pêşbaziyê wiha rêz dike, "Divê heta niha tu berhemên wan wek kitêb nehatibin weşandin. Dibe ku çend helbestên kesên ku bixwazin serî li vê pêşbaziyê bidin berê di hin kovar û rojnameyan de hatibin weşandin ev yek ne muhîm e lê divê ev berhem wek kitêb li ser navên wan nehatibin weşandin."

**"Dosyayên ku xelatê wergirin wê bibin pirtûk"**

Ronahî di derbarê pêşbaziyê de axaftina xwe wiha didomîne, "Divê dosyaya pêşbazan dora 50-60 rûpelan be yanî divê dosyaya wan bi qasî dora pirtûkekî hebe. Çima wisa dibêjim? Ji ber ku dema ku encam diyar bû û xelatek hat dayîn wê demê ev dosyaya dê bê çapkirin yanî wê bibe kitêb. Heta niha ji aliyê weşanxaneya Evrenselê ve dosyayên ku di pêşbaziyê de bi serketin wek kitêp çap bûn. Sala bê jî dosyayên ku xelat werbigirin wê bên çapkirin. Wekî din wextê ku pêşbaz dosyaya xwe ji me re bişînin divê bi vî awayî dosyayên xwe bişînin. Ji her dosyayê gerekî pênc heb bên amadekirin û ev dosya jî ji kompitirê bê derxistin û vê dosyaya xwe jî têxin CDyekî. Çima ji dosyayekî pênc nimûne dixwazin, ji ber ku pênc heb endamên juriyê hene. Ji bo her endamên juriyê nimûneyek dosyayê bê şandin da ku li ser wan dosyayan bikaribin bişixulin. Her wisa di zerfeke piçûk de jî divê pêşbaz danasîna xwe bi kurtasî bikin û nimireya telefona xwe jî binivîsînin. Piştî ku encam diyar bû em ê vê zerfê vekin xwe bigihînin kesê biserketî.

**"Armanca me ya sereke; vekirina pêşiya nivîskarên ciwan ên Kurd e..."**

Ronahî dest nişan dike ku îsal di juriya pêşbaziyê de Berken Bereh, Ülkü Bingöl, Osman Memed, Dîlber Hêma û dawîya dawî jî her sal li ser navê malbatê xwîşka Arjen Arî Necla Arî cî digirin û Ronahî wiha behsa girîngiya vê pêşbaziyê dike," 5 sal berê wextê weşanxaneya me û ya Lîsê dest bi vê xebatê kirin armanca me ew bû me digot em nivîskarên ciwan ên Kurd teşwîq bikin ji bo ku bi dilrihetî û firehî binivîsin. Ji wan re bibe armancek û ji me re dosyayên xwe bişînin. Dosyayên ku ji me re hatine hinartin em bibêjin wekî xelat dosyayên wan çap bikin wek pirtûk. Pêşiya wan vekin û danasîna wan bikin. Her wisa qe nebe yên ku ji me re dosyayên xwe şandine karibin wê cesaretê werbigirin û kitêbên xwe çap bikin xwe bigîhinin xwîneran. Armanca me ya sereke ev bû. Ji hêla din ve ji bo şert û mercên îroyîn jî bibêjim ya rast me par jî gotibû em îsal jî dibêjin ev demên dawî gelek sazî û komele, dezgehên li ser çand, huner û edebiyata Kurdî xebatê dikirin hatin girtin. Televîzyonên Kurdan, televîzyonên ku xwedî weşaneke muxalîf in hatin girtin. Herî dawîn jî televîzyonên Herêma Kurdistanê ji Turksatê hatin derxistin. Em li hemberî wan hemû zext û zordariyan dibêjin vê pêşbaziyê em hewl didin têkoşîna parastin û pêşvebirina edebiyat û zimanê Kurdî bikin."

### "Cara yekem jinekê ev xelat wergirt"

Li ser pirsa, "Gelo salên borî eleqeya raya giştî ya Kurdan bo pêşbaziyê çawa bû?" Ronahî wiha bersiva pirsê dide, "Ewilî bo raya giştî bibêjim, raya giştî ji destpêkê û heta niha eleqeyeke baş nîşan nedaye, em nikarin derewan bikin ya rastî ev e! Me heta niha gelek caran bangewazî kiriye helbet îro tê fêmkirin tv tune nin, rojname tune nin bi rastî jî zor e lê par tv, kovar hebûn me digot danasîna vê xebatê bikin û hûn jî ragihînin xwîneran û ragihînin raya giştî. Têra xwe ev çênebû em vê ya bibêjin! Ji hêla nivîskarên ciwan ve dikarin bibêjin çend salên ewil eleqeyeke mezin hebû a rastî lê ev du salên dawî eleqe hinek kêm bûye. Êdî ji ber zilm û zorahiyê ye û ji ber çi ye nizanim dibe ku ji ber vê ye jî. A rast nivîsandin û şandina dosyayê tu ji min bipirsî li pêşiya vê tu astengî nîne. Dikarin dosyayên xwe bişînin ma kî pêşiyê bigire lê dibe ku mirov bitirsin û mirov bi vî gumanê tevbigerin û xwe paş bigirin." Reşo Ronahî axaftina xwe wiha bi dawî tîne: "Par cara ewil jinekê ev xelat wergirt. Ez hêvî dikim helbestvanên jin bêhtir eleqeyê nîşanê vê pêşbaziyê bidin, bêhtir binivîsin, bêhtir xwe bigihînin vê pêşbaziyê û xwe pêş bixin. Mixabin me heta niha gelek caran got lê pir bi cî nehat lê dîsa jî bangewaziya me ev e sazî, dezge û çapemeniya Kurdî hêvî dikim li vê pêşbaziyê xwedî derkevin û danasîna vê bikin û ragihînin raya giştî."



Pêşbirka Helbestan a Arjen Arî ya 5. dest pê kir û serlêdan wê heta serê meha Sibata 2018an berdewam bike û encama pêşbaziyê wê 1ê Nîsana 2018an aşkere bibe. Xebat û dosyaya ku di pêşbaziyê de serbikeve wê weke pirtûk were çapkirin.

---

Çîroknivîs Ronî Reşo:

# Pêşbirk şewqa nivîsê zêde dikin

DARA DIRBÊSÎ

Li Batmanê heftemîn pêşbirka li ser navê Şerzan Kurt a çîrokan hat lidarxistin. Di pêşbirkê de Ronî Reşo di beşa çîroka Kurdî de xelata serkeftinê wergirt.

Weke ku tê zanîn Şerzan Kurt ê Batmanî di sala 2010an de li Zaningeha Sitki Koçman a Muğla ya bajarê Tirkiyê rastî êrîşa polîsên Tirkiyeyê hatibû û jiyana xwe ji dest dabû. Piştî qetilkirina Şerzan Kurt şaxa Eğitim – Senê ya Batmanê ji bo bîranîna Şerzan Kurt her sal pêşbirka çîrokan bi Kurdî û Tirkî lidar dixe. Îsal jî pêşbirk hat lidarxistin. Gelek kesan serî li pêşbirkê da û di pêşbirkê de ji aliyê lîjneya hilbijêr ve çîroka Ronî Reşo di beşa Kurdî de çîroka herî serkeftî hat hilbijartin. Ronî Reşo di 25 saliya xwe de ye û niha di cafeyekî de dixebite. Ronî ji me re çîroka pêşbirk û nivîsandina xwe vedibêje.

**"Bala min li ser Kurdî hebû"**

Ronî Reşo dibêje: "Weke hûn dizanin ev xelat ji bo xatirê bîranîna şehîd Şerzan Kurt tê dayîn. Îsal di beşa Kurdî de çîroka min hêjayî xelatê hat dîtin. Herwiha di beşa Tirkî de du kesan xelata serkeftinê stendin û axaftina xwe wiha didomîne: "Min li zaningehê di beşa Wêje û Zimanê Tirkî de xwend. Lêbelê dema ez li lîseyê bûm jî min hest pê dikir ku ez Kurdî hîn bibim û nivîs û xwendina xwe bi Kurdî bikim. Di lîseyê de dema min li televizyonên Kurdî temaşe dikir, min ji xwe re weke ferheng, peyvên ku min nizanibû berhev dikir û li ser rojnameya Azadiya Welat, her roj 20 peyvên Kurdî belav dikirin û min jî li wir ji xwe re peyvan li ferhenga xwe zêde dikir. Bi vî awayî ez fêrî Kurdî bûm. Dema min berê xwe da bikaranîna medyayên civakî bi Kurdî jî min dît ku gelek ciwanên weke min bi zimanê xwe dinivîsin ez pir kêfxweş bûm."



**"Têngihim ji ber çi xwe li behra Tirkî dixin"**

Ronî Reşo di derbarê nivîsandina bi zimanê dayikê jî wiha dibêje: "Jiyan li deverekî destpê dike û ez ne bawer im ku dawiya wê were. Çawa ku min dest bi Kurdî kir, naxwazim ku zimanê Kurdî jî bidawî bibe. Ez têngihim ku ew Kurdên baş bi Kurdî dizanin û berê xwe didin deryaya nivîsandina zimanê Tirkî. Ji ber ku qada nivîskariya Tirkî gelekî berfireh û xwedî pênûsên pir xurt e. Lê belê li gorî min ne nivîsandina bi zimanê Kurdî ji ber ku zimanê xwe baş bikarnayîn e. Ez bawer nakim ku min zimanê xwe pêş nexista minê bikaribûya hest û ramanên xwe wisa bi hêsanî bilêv bikira an jî binivîsanda."

**"Di nav Kurdan de divê nivîsandin bê teşwîqkirin"**

Ronî Reşo ji bo teşwîqkirina nivîsandina bi ziman ji aliyê ciwanan re ji me re wiha diaxive: "Bi rastî ne ji ber xelatdayîna pere an jî xelateke bi maddî ez dibêjim lê belê dema em li civaka Tirk, Ereb an jî cîhana modern dinêrin ji bo ciwanên wan binivisîn in gelekî wan teşwîq dikin. Ê min ev pêşbirka min a duyemîn min berê jî ji bo pêşbirkekî çîrokeke xwe şandibû. Niha naxwazim bibêjim da kîjan pêşbirk e. Herwiha beriya sê salan min ji pêşbirka helbestan a Rojava re jî helbesteke xwe şand û di wê pêşbirkê de jî ez bûm sêyemîn. Îro em lê dinêrin ev xelatên wisa nivîsandin û nirxandinê bi me ciwanan re geş dike."

### "Çîroka çîroka min ji qetlîama Helepçeyê destpê dike"

Ronî Reşo di derbarê çîroka xwe de dibêje, çîroka min ji bikaranîna çekên kîmyewî ji aliyê Saddam ve li ser Kurdan, li Helepçeyê dest pê dike û wiha didomîne: "Dema ez li zaningehê bûm hevalên min ji min re qala Helepçeyê dikirin. Kekê min jî li ser vê yekê ji min re qala serpêhatiyên xwe yên wê demê kiribû ji min re. Paşê jî bi hevalekî Zaxoyî re me hev û du nas kir. Ew kes jî yek ji wan zarokan bû ku piştî wê karesat û qetlîamê bi malbata xwe reviyabû û hatibû Diyarbekirê."

Çîroknivîsê ciwan Ronî Reşo dibêje: "Dixwazim hinek ji we re qala wan serpêhatiyên kekê xwe û wî hevalê xwe yê Zaxoyî bikim. Kekê min digot 'Dema xelkê Helepçeyî rastî qetlîamê hat reviya hat Diyarbekirê û li Diyarbekir Seyrantepe ew li qampekî bicih kirin. Dora qampê tev têlkirî bû û havîn bû germ bû. Di nava qampê de hewzeke vekirî hebû û ev penaber di bin wê tava germa havîna Diyarbekir de ji wê ava germ vedixwarin. Em ciwanên Bakurî jî dilê me ev qebûl nedikir û me ji malan qalibên cemedê dida hev û me bi tiraktoran ji wan re dibir da ku bikaribin ava cemidî vexwin. Dema em diçûn wir ji ber têlan me nedikarî em wê cemedê bidin wan. Me ji derve ve bi poşetan diavêt nav kampê, lê poşet li têlan dieliqîn û li jor diman. Wê demê zarokên li kampê bi keviran ew poşet dianîn xwarê da ku bikaribin tasek ava cemidî vexwin.' Dema min ev serpêhatî gohdarî kir û ji wî hevalê Zaxoyî ku ew bi xwe jî yek ji wan zarokên li kampê bû jî erê kir di serê min de çîrok rûnişt û ji xwe min jî bi awayekî postmodern ev çîrok vegot. Mijar û bûyer tev rast in tenê min ew hunandiye."

"Dema ez li lîseyê bûm jî min hest pê dikir ku ez Kurdî hîn bibim û nivîs û xwendina xwe bi Kurdî bikim. Di lîseyê de dema min li televizyonên Kurdî temaşe dikir, min ji xwe re weke ferheng, peyvên ku min nizanibû berhev dikir."

---



CIWANMERD KULEK

## Navên Kurdî û Amcalar Teyzeler

Rojekê min zarokek dît û mam heyirî. Ez jî zarok bûm, lê ew çend salan ji min piçûktir bû. Tişta ku ez lê mam heyirî parçeyek cilê li xwe kirî bû: Şalwarek lê bû. Heta wê rojê min dîtibû ku tenê kalan, zilamên wek bapîrê min salmezin, şalwar li xwe dikir. Heta bi mêrên wek bavê min navsere, çil-pêncî salî jî, van şalwarên fireh, jora wan wek telîs fireh, devling wek goreyekê teng, li xwe nedikirin. Evana bêhtir şalên qumaş li xwe dikirin, ên ku ji navtengê heta gûzekê çi bigire wek lûleyeke sobeyê riprast dadiketin, ku di nîvê vê lûleyê de –eger em li ser teşbîha xwe herin –, li texma çokan, enîşkek hebû û li wê derê şal bi awayekî kevankî firehtir dibû. Ji min werê bû ku kengî bavê min bihata 'emrê bapîrê min wî dê nema van şalan li xwe bikira û ji dêvla wan şalwarekî ji evanên kalan li xwe bikira. Meseleya şal û şalwaran bo hişê min î piçûkaniyê tenê meseleya temen bû. Û ji bo vê yekê ez dimam heyirî: Çawa piçûkekî di ser qonaxa temen re qevaztibû û ev kategorî binpê kiribûn?

Salan da pey salan, bavê min û hevalên wî jî bûn kal, lê yekî ji wan jî dev ji wan şalên xwe yên wek boriyan berneda û lingê xwe di şalwaran ranekirin. Nexwe weku ez difikirîm mesele ne temen bû? Li beramberî vê, kalên bi şalwar tevî şalwarên xwe yên fireh xatir ji dinyayê dixwestin û diçûn. Nizanim wî piçûkê wê rojê îro çi li xwe dike, lê êdî pê ewle me ku ez ê di ti temenekî de şalwaran li xwe nekim. Vêga difikirim ku kalê min dema di temenê bavê min de bû jî şalwar li xwe dikir, û dema di temenê min de bû jî, û dema di temenê wî zarokî de bû jî. Tişta ku ji bo wî normal bû ji nişka ve ji bo me bûbû anormalî. Bi vê pêla nû şikestek li zincîreya kulturî diket, babetek ji xelekekê derbasî xeleka dî, ji nifşekî derbasî nifşê dî nedibû. Hin kesên wek wî zarokî jî weke xelekeke ji zincîra xwe qutbûyî ji pa're, di anakroniyeke ecêb de, tenya û hesarge diman. Parçeyeke kulturê ê ku ji adet diket, dawiyê li ser kî bûya bi wî ve dima, dibû nîşana wî, heta ku wî nifşî ew bi xwe re dibir. Ew nifş jî çiqas diçû pîr dibû û ew parçe tenê wan û bi wan re pîrbûn û kevnbûn dianî bîra mirov.

Di baweriya min de qedera ziman jî hinekî werê ye. Şalwar mînakeke çawa be di serboriya me ya cilûbergan de, di ziman de jî navên taybet xwedî çarenûseke wisa ne. Gelek caran mirov ji min dipirsin: Em ji zarokên xwe re li navekî bi kurdî digerin, ka tu çi pêşniyar dikî? Û gelek caran dibihîsim xelk gazinan dikin û dibêjin: Kurd navên kurdî li zarokên xwe dikin û bi wan re bi tirkî diaxivin, berê navê zarokan bi erebî bû lê zimanê wan kurdî bû, zarokên îro navên wan bi kurdî ne lê gotinekê bi kurdî nizanin… Karesata nemana kurdî agirê van gazinan dadide û dizanim ji kezebeke şewitî dertên. Lê ev babet muhtacî çend pirsên dî ye jî: Gelo bi rastî jî navê Rojbîn bi kurdî ye lê ê Ehmed ne bi kurdî ye? Tişta ku navekî ku kurdan hezar salan li xwe kiriye û du helbestkarên wan ên herî mezin û qedîm pê nasraw in neke kurdî û yekî ku deh-bîst sal e derketiye dike kurdî çi ye? Etîmolojiya peyvan? Nexwe wê çaxê çend navên kurdî hene di tarîxê de ku kurdan li zarokên xwe kirine? Eger mesele kok be dema peyva "roj" pêşî derket em çi bûn? Reh û resenî çi be jî mêjû û rabirdû aîdiyetekê çêdike û bi min ji aliyan ve Ehmed dikare ji Rojbîn pirtir kurdî be.

(Ligel vê, hewldan û helwesta ku Rojbîn dixe nav kurdî û serboriyekê dide destpêkirin jî heja ye û dibe ku tarîxeke dirêjtir jî wiha dest pê bike. Û di vê bobelata ku kurdî daye ber xwe û dibe de bi peyvekê be jî gavek e ber bi hawara ziman de.)

Û tişta ku Ehmed li hember Rojbîn nemeqbûltir û bêrewactir dike jî bi min ev mêjû û rabirdû ye. Van navên kevnar tenê kesên pîr, kal, navsere, xal, met, xaltî û mirovên ku ji bo jiyana me ya nû nabin model tînin bîra me. Taybetmendiyeke hevbeş a navên kurdî ên vê dawiyê ku dibin mijara behsê ew e ku ev nav nû ne. Weke di mînaka şalwaran de, bi hilbijartina van navan jî daxwazek heye ji bo nehiştina şopên ku kevnarî (û pê re rebenî û pîrbûnê) yê di bîr tînin. Çunkî navê Remezan, Evdilmecîd, Mehmûd ne tenê zimanekî biyanî, her wiha kevnbûn û pîrbûneke ne xweş tîne hişê nifşê nû. Em difikirin ku bi navê Remezan, Evdilmecîd, Mehmûd zarokê me di piçûkaniya xwe de dê bibe wek kalekî dest bi gopal yan navsereyekî gundî û di nav nifşê xwe de bi navlêkên wek Remo, Evdo, Miho were hetikandin. Di aliyekî hişê xwe de em hizir dikin ku ji bo ku bibe Hemed, Remezan, Şemsedîn jî şertekî temenî heye û lazim e zarok bigihêje wî 'emrî. Helbet gava nav kevn bibin, zincîreya wan jî ji kevnî û rizîbûnê bişkê û kevnbûna wan tenê wek kêmnirxî be, kurtkirina navan a ku di zimanên dî de şirîniyê dide jî dê di wî zimanê de bibe tahlî. Em dikarin bi rihetî sersam bibin ji bo van kurtkirinan: Juan-Juanito, Carmen-Carmenita, Elizabeth-Liz, Robert-Rob, Michael-Mike, William-Will… Çunkî evana îro di nav kulturên pêşketîtir de temsîl dibin. Ji ber ku zimanê kurdî ji ava xwe ya heyatê, ji xezîneya xwe ya kulturî, ji kontektseke dewlemend û likar bêpar e, rewşeke navan a şîrîniyê jî namîne û heta dê û bav di hilbijartina navan de dîqat dikin bo ku navekî ku neye kurtkirin bidin zarokê xwe. Dibêjin, "em filan navî bidin zarokê xwe hevalên wan dê wiha navê wî xera (kurt) bikin û henekê xwe pê bikin."

Vê şerpezetiya zimanî giriftî di komeke dî a navan de jî çêkiriye. Ew jî koma navên merivantî (xizmatî)yê ye, ku di vir de weke di babeta jorîn de meseleya neaxaftina kurdî jî tine. Di nav gelek merivên (xizmên) ku bi kurdî diaxivin de jî navên merivantiyê bi tirkî êdî tên gotin. Êdî ti keçik naxwaze xweha wê jê re bibêje "xûçê/xwişkê" dixwaze bibêjiyê "abla", ti yek naxwaze xwarziya wê jê re bibêje "metê" yan biraziya wê jê re bibêje "xaltî/xalet", çunkî xûç û met û xaltiyên di hişê wan de tev bi fîstanên kevn, nexwende û pîr in, dayik xwe wek "Anne" didin nasîn ji zarokên xwe yên ku bi wan re bi kurdî jî diaxivin. Kur, xort, mêr, qewîtî li zar, bira, xwarza û birazayan dikin ku ew "Baba" "Abi" "Dayı" û "Amca" ne. Çunkî Abla, Amca, Teyze, Dayı giştûk di cîhaneke nû û pêşketî, geş û bihêz de temsîl dibin, lê xwişk û bira û xal û xaltî giştûk wek şalwarê dawî ê li kalê me yê dawî sinyalan ji cîhaneke kevn, bêhêz, çilmisî, kirêt dişînin. Her kes dixwaze xwe li peywendeke ku jê hez dike bi cî bike û kes di kurdî de wê xweşî û stariyê nabîne.



## Bihûşteke veşartî

# Çiyayê Nemrûdê û Gola Krater

MEHMET ALİ AYDIN

Navê xwe ji Qralê Babîlê 'Narmuk' yê di wê demê de serweriya wê axê dikir stendiye. Di Farisî de tê wateya çiyayê tefiyayî. Bi demê re di nav gel de bûye Nemrûd.

Di sedsala 15. de Ermeniyekî bi navê Vardan berheme Haissmavoruk de qala mijara teqîna çiyayê di navbera Chat (Xelat) û Bagesch( Bêdlîs) wiha dike, Ew çiyayê di navbera Xelat û Bêdlîsê de di sala 1441an de bi teqîneke mezin dengekî pir bilind derdixîne ku herkesê der û dora wê bi tirseke mezin ditirsin. Bi qasî bajarekî ew çiya ji hev vedibe û ji wê qulê agirekî bi rengê dûxanê derdikeve.

Em di vê berhemê de hîn dibin ku bêhneke xof û kûjer mirovan nexweş dixîne, kevir dibin weke agir û tahtên qerase bi dengê ewran difirin asîmanan jî. Di berhemê de cihê ku qala wê tê kirin Mahrut yanê çiyayê ku îro em bi navê Nemrûd dizanin e. Çiyayê Nemrûdê di dîroka Anatoliyayê de ligel Çiyayê Erciyesê yek ji çiyayê di faaliyetê de ye. Ev çiya her çiqas îro weke ku tefiyabe xuya bike jî divê mirov bi vê yekê nexape. Ji ber ku li ser vî çiyayî goleke germav heye û hê jî ji der û dora wê golê xazên germ derdikevin divê mirov bizanibe ku ne tefiyaye û tenê di dema rawestandinê de ye.



Çiyayê Nemrûdê û Gola Krater dikeve Rojavayê Gola Wanê, li ser axa Titwan, Xelat û Norşînê. Nemrûd bi dirêjahiya 10 km di cîhanê de mezintirîn gola krater e. Gola Krater a ser Nemrûdê di cîhanê de duyemîn gola mezin a krater e. Mirov dikare di ser du navçeyên Bêdlîsê de Titwan û Xelatê de biçe Gola Nemrûdê. Ji Titwanê 13 km û ji Xelatê jî 25 km dûr e.

**Kîjan Çiyayê Nemrûdê?**

Navê xwe ji Kralê Babîlê 'Narmuk' yê di wê demê de serweriya wê axê dikir stendiye. Di Farisî de tê wateya çiyayê tefiyayî. Bi demê re di nav gel de bûye Nemrûd. Ji ber ku Çiyayê Nemrûdê yê Titwanê baş nehatiye nasandin tim bi Çiyayê Nemrûdê yê Semsûrê re tevlîhevî derdikeve holê. Ji ber ku di hinek weşanên magazînî de dema qala Gola Krater ya Nemrûdê tê kirin ligel wê qala şûnwarên dîrokî jî tê kirin. Halbûkî ne li Nemrûda Bêdlîsê şûnwarên dîrokî hene û ne jî li Çiyayê Nemrûda Semsûrê gola krater heye. Çiyayê Nemrûdê di nav volkanên bi beş de di serdema Kuvaterner de pêk hatiye û çiyayê herî girîng ê Anatoliyayê yê tefiyayî ye.

**Bihûşta golên veşartî**

Li ser çiyayê Nemrûdê hêla Rojava bi golê hatiye veşartin. Di zinarê Nemrûdê de 2 jê mayînde 3 jî demkî bi giştî 5 gol hene. Di nav golên Nemrûdê de ya herî mezin bi şeklê xwe yê nîveheyv a Nemrûdê ye. Kûrahiya vê golê bi giştî 100 metre ye. Li aliyê Rojavayê Bakurê vê golê kûrahî 155 metre hatiye pîvandin. Li gor lêkolînên ku li ser avê hatine kirin jî av paqij, bê bêhn û ji bo vexwarinê guncav derketiye.

Gola Ilicaya Şîn jî 30km2 firehî û 8 metre jî kûrahiya wê heye. Naherike tu derî tenê dibe ku ji binê wê terkek peyda bibe. Berovajî Gola Nemrûdê ye ku şînahî li dora wê tune ye û di zivistanê de diqeşime, Gola Ilicayê bi kaniyên germavê tê avdan û tu carî naqeşime, li der û dora wê jî qamiş tên dîtin. Gol, bi çiloyên ku ser rûyê golê vedişêrin û zinarên 690 metre bilind ve hatine pêçandin. Di nava Gola Ilicayê û der û dora wê gelek kaniyên germavê hene. Ya herî girîng jî kaniya dikeve Bakurê Rojhilatê golê ye. Ava ku ji vê kaniyê derdikeve di zivistanê de 40 Co di havînan de jî digihîje 70C o yî. Mîneralên di nav Gola Ilicayê de ne ji ber pileya germê gelekî zêde ne û ev mîneral jî ji bo hin nexweşiyan dibin derman.

Her wiha li devera Gola Ilicayê ji bilî kaniyên germavê kaniyên bûhara germ jî hene. Nêzîkî di qadeke 150 m2 bûhara germ ji kaniyan derdikeve. Kaniyên bûharê yên ku 150 metre dikeve Başûrê Rojhiltaê golê xwedî germahiyeke ku mirov hîs dike ye. Bi vê taybetmendiya xwe di nav gel de bûye bawerî ku ev kanî ji nexweşînên astim, bronşît, romatîzmayê re baş tên.

Heta Kalderaya Nemrûdê çêbûye nêzîkî 210km3 maddeyên volkanîk firandiye. Di vê dema rawestandinê de bilindahiya wê 4.450 metre ye û herî dawî di sala 1441an de faal bûye. Di kêlîka teqînan de kumikê xwe yê li ser zinarê xwe winda kiriye û şeklê konî wergirtiye.

**Fauna:**

Faûnaya (hemû ajalên derverekê) Nemrûdê bi werdekên qedîfe ku li qadê gona xwe dikin û baza tahtan statûya devera taybet stand û her wiha Sîqalka Sor jî li wir qep dikeve. Nemrûd rawestgeha gelek çivîkên koçber e û ji ber nêçîrvaniya bê pergal jî cûreyên wan gelekî kêm bûne. Li deverê di demên dawî de tenê, kew, werdek, kêvroşk, çivîka mozê, qaqlîbaza Gola Wanê, rovî û hirç tên dîtin. Pezkovî jî mixabin bi giştî êdî qediyaye.

**Flora:**

Li nav û dora Kalderaya Nemrûdê 450 cûre nebat hatine tespîtkirin. Van nebatên ku hatine tespîtkirin jî ji sedî 44an yên vê herêmê ne. Dîtina cûreyên din yên nebatan derdixe holê ku avûhewaya herêmê di demên berê de cuda bûye. Nebatên niha heyî ji sedî 8,4 endemîk in. Guldexwînên ku tenê li vir çê dibin di cîhanê de xwedî nav û deng in.

Ji ber ku Kalderaya Nemrûdê di devereke girtî de ye û baran jî baş dibare, hebûna golan di nav kalderayê de dike ku ji nebatan re têra xwe ritûbet hebe. Vejatasyona Kaldera Nemrûdê ji hûş (Betula) û spîndara lerzok (Populus ttremula) pêk tê.

Bi giştî dar û barên Kalderaya Nemrûdê ku dikevin dora golan ev in: "Spîndara Lerzok (Popolus tremula) Dara Merxê (Juniperus communis subsp.nana) Darspî ya bi pelên çinarî (acer platanoides), Uveza çûkan (Sorbus umbellate, sorbus torminalis, sorbus tamaschjanae,sorbus aria), Adi Cehri (Rhamnus frangula), Darberû (Quercus pinnatiloba), Muşmulaya Çiyayî (cotoneaster nummularia), Incas (prunus divarcata) Bî (salix alba), Biyê spî (salix pedicellata, salix cinera) Darê Merxê yê bilind (juniperus excelsa), Dara Barûdê (frandula alnus) û Gilyasa bi bîn (cerasus mahalep)

Stepên Kalderayê jî li devereke berfireh belav bûne. Gewen (Astragakus) di serî de cûreyên wan ev in; Çoban yastixi (acanholimon) korunga (Onobrychis megataphros), labada (rumeks acetosella), cehter (thymus kotchyanus) çîçeka zêrîn (alyssum pateri) yumak ( festuca ovina) çaya eda (salvia sp.) çîçeka dawetê (ranunculus crateris) gûşîdar (silene arguta), nefela sêpelk ((trifolium arvense), anix (pimpinella kotschyana), pojan (artemisia fragans) kanêje (centaurea triumfetti)

Li devera Nemrûdê mirov debara xwe bi ajalvaniyê dikin. Li der û dora golê ajalvaniya ajalên biçûk tê kirin. Ajalên ku li der û dora golê diçêrin kêmasiya avê ji golan peyda dikin.

Di gola Krater a Nemrûdê de gelek masiyên sazan hene. Lê belê ji ber ku Kalderaya Nemrûdê devera Qada Xwezayî ye û li gor Qanûna 2873 ya Parqên Netewî nêçîrvanî jî qedexe ye.

Li aliyê Bakurê Rojhilatê Gola Nemrûdê deverên bi qamiş hene. Dîsa li aliyê Rojhilata Gola Sarogermo qamiş hene. Lê belê çinandina van qamişan nayê kirin. Kalderaya Nemrûdê ji ber ku koniya herî ciwan a Wolkan a Anatoliyayê ye û ji ber ku nehatiye mehitîn xwediyê taybetmendiyeke zanistî ye jî. Bi vê taybetmendiya xwe jî bala lêkolîneran dikişîne.

Tesîsa Kaşkirinê ya Nemrûdê di sala 2007an li aliyê Kalderaya Nemrûdê yê ku li Gola Wanê dinêre dest bi xebatên xwe kir.

Kalderaya Nemrûdê, Serguzeştê Gerdûnî, Qada Turizmê bi statûya devera avê û bi pileya yekemîn a xwezayî tê parastin. Di sala 2012an de Wezareta Darisatan û Avê ji bo tescîlkirina Qada Ramsarê dest bi xebatên xwe kiriye û plana îdareya wê mewcûd e.

## Dîroka jeolojîk a gola krater

Wisa tê texmînkirin ku çêbûna kratera Nemrûdê di serdema Pliosen Jeolojîk de ji ber lewhayên tektonîk ên Rojhilata Anatoliyayê hev asê kirine û firehiyek derketiye holê, ev çiya jî wisa derketiye holê. Dema mirov derbasiya jeolojîk a Serhedê dinêre dê bibîne ku Gola Wanê û Havzaya Mûşê berê pêk ve bûn. Ji ber lava çiyayê volkanîk rastiya Rahvayê ya 1760 metre ji avê bilind derketiye holê û her du hawza ji hev veqetandiye bi vî halî jî dîtbariya Gola Wanê ya îro ji ber hebûna volkanî ya Nemrûdê derketiye holê. Di proseya pêkhatina Nemrûdê de wisa tê texmîn kirin ku 210 km3 maddeyên volkanî avêtiye der û dora xwe. Di yekemîn teqîna Çiyayê Nemrûdê de 110 km3 madde reşandiye dora xwe ya nêz. Lava ku jê derketiye jî nêzîkî 30 km3 ê ye. Bi demê re lavên ku derketine li dora xwe civiyane û bilindahiya koniyê derxistine ser 4000 metreyî. Di vê navberê de ji ber sedema girtina devê çiyayê volkanîk gelekî xaz û magma civiyaye û bûye sedem ku bi teqîneke pir mezin biteqe. Herwiha ser kalderaya wê ya gloverik û işinî fireh bûye û kalderaya îro derxistiye holê. Kalderaya Nemrûdê bi firehiya xwe ya 40 km2 devera herî karakterîstîk û orîjînal a ser rûyê erdê ya volkanîk e.

Bi rastî jî ev kaldera bi 5 golên xwe yên biçûk û mezin, gelekî deverên cihê derketina lavê, kovikên lavê, koniyên pekandinê, kaniyên avgermê, fauna û floraya xwe ya orijinal weke devereke ji bihûştê ye.

Kratera Nemrûdê herî dawî di salên 1411an û 1441an de faal bûye. Bi hebûna du tebeqeyên pomza û dîtina sediment di navbera 30 salî de pêkhatina van her du teqînan îspat dike.

Li ser çiyayê Nemrûdê hêla Rojava bi golê hatiye veşartin. Di zinarê Nemrûdê de 2 jê mayînde 3 jî demkî bi giştî 5 gol hene. Di nav golên Nemrûdê de ya herî mezin bi şiklê xwe yê nîveheyv a Nemrûdê ye.



